BERNAMEGEH

KOVAREKE AZAD, SERBIXWE, BÊTEREF Û XELKÎ

www.arsivakurd.org



İKRAM OĞUZ | OCCO MAHABAD | NİHAT GÜLTEKİN

SAL 2 HEJMAR 7 • 2022

Dİ VÊ HEJMARÊ DE

Koordînatorê Giştî:
Occo Mahabad

Edîtor:
Mihemed Keskîn
Cîhan Soylu

Rûpelsazî:
Mîtannî Ajans

bernamegeh@gmail.com

www.bernamegeh.org

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

www.arsivakurd.org

Jİ EDÎTOR

Di vê hejmara me de Îkram Oguz bi Kurmanciya xwe ya zelal behsa zarokatiya xwe û dengbêjên bavê xwe kiriye.

Occo Mahabad mijara damezrandin û pêşketina çapxaneyên kurdan ji do heta îro nirxandiye.

Nihat Gültekin bala xwe daye li derdora Çiyayê Elegezê û rewşenbîrê me yê dilnazîk Maksîmê Xemo.

Lokman Polat bi pirs û vegotinan di edebiyatê de mijara trajedî, romantîz û erotîzmê hildaye dest.

Di vê hejmarê de gellek gotar, çîrok û helbest li benda xwendin û nirxandina we ye.



Naverok

4 İkram Oğuz / Çima Dengbêjên Bavê Min

11 Konê Reş / Newroz

12 Occo Mahabad / Dîroka Çapxaneyên Kurdan

16 Mihemed Hesko / Xwefiroş

17 Nihat Gültekin / Li Gundê Avşênê Dibistana Mexsîmê Xemo

52 Ümit Tunç / Xwe Li Ser Keskesorê re Biavêjin

54 Dilbirîn Dilo / Senfonîka

55 Lokman Polat / Evîna Romantîk û Trajîk

60 Azad Ekkaş / Newaya Roviya Şîn Li Kozikê Darvên

61 Yucel Aslan (Koçer) / Ez û Navê Kurdistanê

64 Ehmedê Goyî / Dê

24 Muqades Agirî / Şahmaran

26 Umîd Demîrhan / Mersûmê Qedîm ê Kurdistanî

37 Dengbêj Evdirehîmê Mûşî / Mêvan

38 Sıraç Oğuz / Hîndîstan û Gandî, Kurdistan û Barzanî

65 Celal Orhan / Hêsirên Kurê Arnos

67 Michael Erard -Cultural of First Words / Raboriya Çandî ya Peyvên Pêşîn - Wergêr: Berat Qewîendam

73 Hasbeg Koksal / Bayê Lingbez

75 Mahîn Şêxanî / Bawer Bike

76 Mehmet Gur / Pêxemberek Rabû ji Colemêrgê: Şêx Adî

43 Çayan Okuducî / Parsek

44 Remezan Bakur / Simayîlê Saydalî

48 Dilazad A.r.t / Sîng û Berê Yara Gerden Zêrîn

49 Mela Mihyedîn / Nameyek Derengmayî 5

51 Şîlan Doskî / Adar

79 Mehmet Dinç - Bedro / Wergera ji Tirkî; Mikaîlê Berbestê

81 Umer Binî Xettab, Yezdîcerd û Nemeyên Wan / Wergera ji Tirkî; Seyfedînê Welekorî

84 Mervan Serhildan / Sûdwer im Ez

88 Keyhan Mihemedînijad / Newroz

www.arsivakurd.org

ÇİMA DENGBÊJÊN BAVÊ MİN?




İKRAM OĞUZ

Bavê min mirovekî bawermend û oldar bû.
Bi karê ajalvanî û cotkarîyê debara mala xwe dikir. Di demsala zivistanê da weke hemû gundîyan karê wî kêm, dema wî ya vala jî zêde dibû. Dema xwe ya vala bi xwendina Quranê û bi guhdarîkirina kilam û stranan va derbas dikir.
Rû bi rû neditiba û di civata wan da cîh negirtiba jî, dengê hemû dengbêjên Serhedê nas dikir û bi kêf û hezkirin li kilam û stranên wan guhdarî dikir.



Di nav dengbêjên wî yên hezkirî da, gelek dengbêjên jin jî hebûn, ku dengê wan ya ji Rewanê ya jî ji Bexdayê bilind dibûn û li gundê me jî olan didan.
Ji wan dengbêjên jin yek Fatma Îsa, yek jî Meyram Xan bû.
Dengê Fatma Îsayê ji Rewanê û bi kilama "Lolo Miho“, dengê Meyrem Xanê jî ji Bexdayê û bi kilama “Mihemedo”, bilind dibû û li seranserê Kurdistanê belav dibû. Ji xwe Eyşe Şan wek zerîya ji malê dihat hesibandin û hinek kilamên wê yên wek “Zerî Heyran” û „Derdê Hêwîyê“ ji devê qîz û jinan nediket û di her malê da dihat bihîstin…



www.arsivakurd.org

Bavê min jî weke mele û sofîyan guhdarîkirina dengê jinan guneh bidîta jî, dengê dengbêjên jin ên Kurd li xwe heram nedikir û li kilam û stranên wan jî guhdarî dikir. Di nav dengbêjên wî yên jin da, ya herî nêzîk û zindî Gewrê bû.
Gewrê jineke ji gundê me û di sale bavê min da bû. Hemû zarokên gund jê ra Meta Gewrê digotin.
Meta Gewrê jinikeke dîwane û di halê xwe da bû. Her roj siba zû radibû, karê xwe yê rojane dikir û li ber derê mala bavê xwe rûdinişt, xwe bixwe ra qise dikir, di ber xwe da dilorand û digirîya. Bi danê esrê ra berê xwe dida nava gund, di derê malekê ra diket hundur û weke kesa ji malê diçû, li kuncikeke odê rûdinişt. Kesên ku derîyê mala xwe ji wê ra vebikira, îskanek çay û çixareyek bidabayê, Gewrê wan ji xwe ra weke xwîşk û bira didît û xwe jî ji wê malê dihesiband.
Di gund da malên ku Gewrê zêde diçû-dihat, ji wan yek jî mala me bû. Ji bavê min ra „birako“, ji dîya min ra jî „xwengê“ digot û nêzikatîya xwe ya ji dil nîşan dida. Dê û bavê min cixare nedikişandin, di mal da cixareya ku bidîyana Gewrê jî tune bû. Lê li ber Gewrê çay kêm nedikirin û wê jî têra xwe çay vedixwar û ji wan ra spasîya xwe dianî ziman.
Loma dema ku dihat mala me û rûdinişt, berê pesnê dê û bavê min dida, dû ra destê xwe diavêt paşila xwe û cixareyek pêçayî derdixist. Cixara xwe bi fesal vêdixist, bi gurmika ewil ra dest bi çîroka xwe dikir û di nava çîrokê da wenda dibû. Tiştên ku hatibûn serê wê, mezinan dizanîbû, bi saya vegotina wê ya ku her roj li malekê dubare dikir, hemû zarokên gund jî ji çîroka wê hayîdar bibûn û wek ezbere dizanîbûn.

Gewrê di xamatîya xwe da ji xortekî ji gund hez dike û pê ra dizewice. Piştî zewacê ducanî dibe, lêbelê zaroka wê di zikê wê da dimire û mirî tê dinyayê. Bi wê bûyerê ra xemgîn dibe û dikewice, şev û roj digirî û ji jîyanê dixeyîde.
Di navbera wê û mêrê wê da pirsgirekên malbatî derdikevin û roj bi roj zêde dibin. Di encamê da ew û mêrê xwe bi hev nakin û ji hev diqetin.
Dem derbas dibe, ji gundeke nêzik xwezgînîyê Gewrê tênê û li derê mala bavê wê peya dibin. Gewrê cara duyem dizewice û tere ser hêwîyê. Mixabin di zewaca xwe ya duyemîn da jî starîyê nabîne û weke dîwane careke din wedigere û di ser mala bavê xwe da tê…
Gewrê bi derbasbûna demê ra naveroka çîroka xwe gor dilê xwe zêde dikir û dixemiland. Dema ku çîrok diqedîya, bi dileke xemgîn û bi hêrs li hinek kesên ku wek sebebê rewşa xwe didît û nîşan dida, nifirên xirab li wan dikir û digot:
„Wan hîva min ser û binê hev kir, bila Xwedê hîva wan jî ser û binê hev bike!“

www.ardakurd.org

Ger ku qonax germ, çixare û çay jî heba, bi qultek va çaya xwe vedixwar, gurmikek xurt li cixarê dixist, dû ra destê xwe yê çepê diavêt ber guhê xwe û kilama Huso û Nazê distira…

Di kilamê da ew dibû Nazê û li ser birînên Husoyê xwe yê bê nav digot û kul û keserên dilê xwe disotand.

Stran diqedîya, xemgîn dibû û careke din dîsa dest bi nifiran dikir. Gor demê tawanbarên wê û nifirên ku li wan dikir, dihatin guhartin. Carcaran ji mala xalanên bavê min ra dida xebera û nifirên xwe li wan dikir.

Bâvê min bi xeber û nifirên wê dikenîya û digot; “Gewrê, tu ji xalanên min çi dixwazî, wan bi te çi kir ku tu li cem min ji wan ra didî xebera û nifiran li wan diki?”

Gewrê serê xwe di ber xwe da xar dikir û bi dengekî şermok digot; “Birako ji min nexeyîde, wele ez ji para te ra nadim xebera û nifiran nakim…”

Pişt ra hêdî hêdî ji cîhê xwe radibû, xatir dixwest û bê dil berê xwe dida mala bavê xwe.

Di dawet û şahîyan da hemû qîz û jinên gund bi mêran ra diketin destê hev û govend digerandin, kilamê govendê digotin û direqisîn. Lêbelê qîz, ya jî jina ku mîna Gewrê kilamên dengbêjan bistira, tunebû.

Loma wê demê em bi aqilê xwe yê piçûk difikirîn û me ew dengbêjên jin ên ku di Radyo ya Rewanê û Bexdayê da distiran, mîna Gewrê weke jinên dîwane dihesiband. Jiber ku wê demê ji bilî Gewrê çavê me ne bi dengbêjeke mêr, ne jî bi dengbêjeke jin ketibû. Loma Meta Gewrê ji bo me hemûyan dengbêja herî nêzîk, zindî û li ber çavan bû.

Di dema zarokatîya xwe da, min dengbêjek ji dengbêjên bavê xwe Zilkoyê Çawirmê jî dît û bi zindî li dengê wî guhdarî kir. Dengbêj Zilko ji gundê Çawirme ya Xelî Axa bû û bi navê gundê xwe va dihat naskirin. Ew jî zavayê gundê me bû, loma di mehên payîz û zivistanê da dihat gundê me û li mala bûrayê xwe dibû mêvan.



www.arsivakurd.org

Di wan şevên payîz û zivistanê da, civata gund a ku ji kesên navsale pêk dihat, li oda mala kalikê min kom dibû. Zilko li gund ba, ew jî bi bûrayê xwe ra dihat û bi qedr û qîmeta dengbêjîyê di wê civatê da cîheke sereke digirt. Li ser mînderê rûdinişt, pişta xwe dida lihêfê, destê xwe diavêt ber guhê xwe û heta dawîya şevê kilam digot û distira. Qasî ku tê bîra min, kilama wî ya ku herî zêde xweş digot û pê dihat nasîn, „Helîmcanê“ bû…

Zilkoyê Çawirmê jî di nav dengbêjên bavê min ê mêr da dengbêjê herî nêzîk û naskirî bû. Mixabin di vê xebatê da ew bi berfirehî cîh nagre. Jiber ku ew di destpêka salên 70yî da mala xwe ji welat bar kir û çû li bajarê Îzmirê bi cîh bû.

Li welatê xerîb û di koçberîyê da dest ji dengbêjîyê berda, bi koça xwe ya dawîyê ra, dengê xwe jî bi xwe ra bir. Ez gelek caran li şopa dengê wî gerîyam, ne rastî dengê wî hatim, ne jî di derbarê jîyana wî da agahîyên berfireh bi dest xist. Berî koçberîya wî dengê wî jî di odeyên gundan da bi teyîban di kasêtan da hatibû qeydkirin. Ji wan kasetan yek jî li mala me û di nav kasetên bavê min da bû. Weke îro tê bîra min, ku berî darbeya 12ê Îlonê, me hemû kasêtên Kurdî û pirtûkên Kurdî di bin axê da çal kiribûn.

Piştî dem û demsalan kasêt jî pirranîya pirtûkan jî di bin axê da rizîyabûn, ku ew kaseta Zilkoyê Çawirmê jî di nav wan kaset û pirtûkan da bû. Di destpêka salên 70yî da em jî bi malbatî ji gund koçberî bajarê Erzirumê bûn.

Bavê min ê 60 salî hemû jîyana xwe li gund, di nav mêrg û zevîyan da, li sere çol û çîyan, di nav deşt û zozanên fireh û bilnd da derbas kiribû.

Loma bajar lê teng dihat. Ji jîyana xwe ya di nav bajêr da hatibû sînordarkirin eciz û xemgîn dibû. Kîngê firsendek bidîta, berê xwe dida gund, diçû bi roj û mehan li gund dima. Ji bo çûyîn û hatina xwe ya gund carcaran şîn û şahîyek, carcaran jî tiştek din nîşan dida, lê d rastîyê da ji jîyana bajêr a sînordarkirî eciz dibû û direvîya.

Jibo ku, eciz û xemgînîya wî bêtir zêde nebe, ji xwe ra dermanê xemrevandinê jî dîtibû. Her roj piştî xwarina şîvê, teyîba li dîwarê odê dardakirî digirt, li ser mînderê rûdinişt û teyîp jî dida ber xwe. Kasetek diavêt teyibê, pişta xwe dida balîfê, çavên xwe digirt û bi dengê dengbêjên xwe ra di nav bîranînên xwe da digerîya. Piştî guhdarîkirina her stranekê, ji me ra qala bîranîneke xwe ya li gund derbas bûye, dikir. Bi vegotina xwe ra rûken dibû, dawî li xemgînîya wî dihat.

Kasêtên dengbêjan, wê demê tenê di civatên gundan da, bi dizî dihatin qeydkirin û bi rêya nas û dostan va, di nav civakê da belav dibûn. Ew kasêtên ji ber hev qeydkirî di bêrika bavê min da kêm nedibûn û di heftê da carekê jî dihatin guhartin. Serê rojê, bi danê nîvroyê ra ji mal derdiket û diçû sûka Serê Taxê, di çayxanekê da nas û dostekî xwe didît, kasêtên xwe bi yê nû ra trampe dikir û bi danê êvarê ra jî bi kêf û kelecan vedigerîya malê.

Piştî xwarina şîvê û nimêja êvarê, dîsa li cîhê xwe rûdinişt, kasêta xwe ya nû diavêt ser teyîbê û kêfxweşîya xwe ya ku ji kilam û stranan digirt, bi me ra parve dikir.

Kêm zêde 25 salên wî yên dawîyê li bajarê Erzirumê derbas bûn. Di wan 25 salan da her havînan diçû gund û bi mehan li gund dima.

www.arsivakurd.org

Hemû rojên wî yên li bajêr jî wek hev derbas dibûn. Danê sibê heta nîvroyê bi saetan Quran dixwend, piştî nîvroyê berê xwe dida sûka sere taxê û bi nas û dostên xwe ra dihat ba hev… Êvaran jî guhê xwe dida teyîbê û li kilam û stranên dengbêjan guhdarî dikir…

Hezkirin û guhdarîkirina dengbêjan ji bavê min ji min ra wek mîrateke çandî ma. Herçiqas di dema xortanîya xwe da zêde nêzikî dengbêjên bavê xwe nebama, îro ez jî mîna wî şev û roj li dengbêjan guhdarî bikim, dîsa jî eciz nabim.

Jiber ku di kilam û stranan da dewlemendî û zelalîya zimanê xwe yê şirîn dibînim û kêfxweş dibim.

Bîranînên min jîndar dibin û yekoyek tên ber çavên min…

Xewn û xeyalên min dixemilin…

Bi dengbêjan ra dikevim rêwîtîyê û di nav kilam û stranên wan da digerim.

Bi deng û awazên Şakiro ra xwe li ser pişta bozî çaçanî kaprêşî rehwan dibînim û di nav Şûşar û Tekmanê ra, bi bayê bezê derbas dibim.

Bi strana Ferzê ra dibim ji teyran teyrê baz û li ser gazan û bêlanên bilind difirim. Bi bayê qulbê ra vedigerim û li ser mile qîz û bûkan datînim…

Bi dengê Reso ra dibim hevalê Emê Atmanî û bi karwanê wî ra di nav welatê Reşkotanîyan da rêwîtîyê dikim.

Bi dengê Huseyno ra dadikevim deşta Mûşê, li ber devê Çemê Muradê dikevim pêgermokê û ji kul û kesera dilê xwe yê birîndar ra dilorînim.

Bi dengê Tahiro ra berê xwe didim etegên Çîyayê Sîpanê Xelatê, di nav êl û eşîran da li kok û esaleta Perîxana Mihê digerim.

Bi kilam û strana Şêx Silê ra, di civatên mîr û hekiman da rûdinêm û pesnê bedewîya Seraya Mamed Axa didim…

www.arsivakurd.org

Di dema xortanîya xwe da min ji dengbêjên bavê xwe, Şakiro, Huseyno û Tahiro rû bi rû dît û ew ji nêzîk va nas kirin. Min xwest qasî deng û awazên wan, hemû dengbêjên bavê xwe ji nêzîk va nas bikim û bidim nasîn.
Loma bi mehan li şopa wan gerîyam.
Min dît, ku çavkanî kêm, agahîyên di wan çavkanîyan da cîh digrin jî, bi pirranî hevdu nagrin.
Herçiqas sedemên kêmanîya çavkanîyan û agahîyên şaş zêde bin jî, di bingeha hemûyan da bindestîya welatê me yê qedîm û sêwîtîya zimanê me yê şirîn cîh digre.
Loma dengbêj jî li ser axa bav û kalên xwe xizan, koçber û bêxwedî ye…
Loma qedera hemû dengbêjan yek, êş û jana wan jî hevpar e.

Di vê xebatê da kurtejîyana 20 dengbêj û Şahê Dengbêjên bavê min, Evdalê Zeynikê cîh digre.
Bi saya vê xebatê qasî ku min ji kilam û stranên wan hez dikir û li dengê wan guhdarî dikir, jîyana wan a ku bi hest û helwesta kurdayetîyê derbasbûye dît û ji kesayetîya wan jî hez kir.
Bi hebûn û bi hunera wan, bi deng û sewta wan careke din kêfxweş û serbilind bûm.
Ez dixwazim hûn jî li dengbêjên bavên xwe xwedî derkevin…
Bi tahma ku hûn ji kilam û stranên wan digrin, xewn û xeyalên xwe yên nîvco mane, bixemilînin…
Kêfxweş û serbilind bin…

www.arsiyakurd.org



KONÊ REŞ

NEWROZ

Adarê! Dêmê Qamişlo..



Adarê!
Di pencereyan re
Xuya dike
Di nav lihevketina pêlan de
Bi ser me de
Dibare
Di çîrokên bahoz û xemgîniya demê de
Şil dibe,
Bêrîkirin jê difûre.. Û
Çepel û megrûdî jî
Hewil didin ku
Canê xwe ji
Netebitîbûnê aram bikin û
Xwe ji şewatê bi parêzin..!
Adarê!
Di sibehên te de
Dêmê Qamişlo
Di kolan û sikakan de
Digirî,
Rondik wek xunava buharî
Tê xwarê û
Dengê nalînê di qirika xelkê de
Li hev vedigere..
Erê adarê
Dêmê Qamişlo
Di sikak û kolanan de
Digirî..

www.arsivakurd.org

Occo Mahabad

Dîroka Çapxaneyên Kurdan


www.avestakurd.org

Çapxaneya pêşî li Ewropayê di sala 1450an de ji aliyê Johannes Gutenberg tê avakirin.[1] Di dîrokê de çapxaneya ewilî ya Kurdan Çapxaneya Cerîdeyî Kurdistan e ku li Qahireyê hatiye damezrandin. Rojnameya Kurdistanê ku bi hewldanên şexsî yên Mîqdat Mîthad Bedirxan ve di sala 1898an de derdiket li vê çapxaneyê dihat çapkirin.[2] Mîqdat Mîthad Bedirxan kurê Bedirxan Beg û birayê Emîn Alî Bedirxan e. Rojnameya Kurdistanê ji sala 1898ê heta 1902yê bi tevahî 31 hejmar derdikeve.

Di sala 1876an de di welatê Osmanî de Pergala Meşrûtî tê îlankirin. Ev pêvajoya Meşrûtiyetê heta sala 1920an dewam kir. Bi destpêkirina Meşrûtiyetê derbirîna azadiya fikr û ramanan de pêngavên girîng tên avêtin. Her millet li gorî fikrên xwe yên siyasî û neteweyî gellek ‘’Cemiyet û Rêxistinên’’ cuda damezrandin û ji bo armancên xwe dest bi avakirin û weşandina rojname û kovarên fikrî, edebî, çandî, civakî, hûnerî kirin.
Di dewleta Osmanî de li Kurdistanê çend heb çapxane hatine vekirin lê ev çapxaneyan ne bi zimanê Kurdî, bi zimanî Osmanî berhem çap dikirin. Di sala 1856an de li Erziromê, di sala 1865an de li Bedlisê, di sala 1868an de li Diyarbekirê, di sala 1889an de li Wanê çapxane tên avakirin.[3]

Di Împaratoriya Osmaniyan de çapxaneya ewilî di sala 1493yan de ji aliyê birayên David û Samuel İbn Nahmias ve tên damezrandin.[4] Çapxaneya Ermeniyan di sala 1567an de ji aliyê Apkar Tibîr[5] ve li Stenbolê, ya Tirkan di sala 1727'an de ji aliyê İbrahim Muteferrika[6] ve tê damezrandin.
Di Împaratoriya Osmanî de çapxaneya ewilî ya Kurdan di sala 1908an de ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramîz û Xelîl Xeyalî[7] ve li Stenbolê tê damezrandin. Ehmed Ramîz ji navçeya Licêya Diyarbekirê ye her weha damezirêner û xebatkarekî Cemîyeta Azmê Qewî ya Kurdistanê (CAQK) bûye. Ev cemiyet di sala 1900î de, bi serokatiya Fikrî Efendîyê Dîyarbekirî hatibû damezirandin. Ehmed Ramîz di vê çapxaneyê de nêzîkî 60 pirtûkan çap dike lê serboriya wî ya çapdêriyê di sala 1905an de li Misrê dest pê dike. Ew ji bo ku pirtûkên Kurdî biweşîne çapxaneyekê bi navê ‘Sadel Ekrad’ dadimezirîne. Di vê çapxaneyê de Mewlûda Nebî ya Mele Ehmedê Bateyî çap dike.







Piştî ku di sala 24ê tîrmeha 1908an de bi îlankirina Meşrûtiyetê vedigere Stenbolê bi navê Amîdî çapxaneyek ava dike. Ew çapxane, çapxaneya ewilî ya Kurdan e ku di Împaratoriya Osmanî de hatiye damezrandin.

Di sala 1910an de Çapxaneya Diyarbekirê (Matbaa-i Amedi) li Stenbolê tê avakirin. Di vê çapxaneyê de pirtûkên Kurdî jî dihatin çapkirin. Piştî çapxaneya Kurdistanê, li Qahireyê di sala 1911an de Metbaa Kûrdistana İlmîyye ji aliyê Ferecullâh Zeki el-Kurdî ve tê damezrandin.[8]
Di heman salan de Dr. Evdila Cevdet û Abdurrahman Bedirxan dixwazin li Swîsrê çapxaneyek ava bikin lê ji ber zext û zordariyên dewleta Osmanî, rêveberên Swîsrê nahêlin çapxane bê damezrandin.[9]
Di Împaratoriya Osmanî de çapxaneya ewilî ya Kurdan di sala 1908an de ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramîz û Xelîl Xeyalî[10] ve li Stenbolê tê avakirin lê di axa Kurdistanê de çapxaneya pêşî ya Kurdan ku bi zimanê Kurdî weşana xwe dikir li Diyarbekirê ji aliyê Ekrem Cemil Paşa ve di sala 1918an de tê damezrandin. Ekrem Cemîl Paşa yek ji damezrînerê Cemiyeta Tealiya Kurd bû. Rojnameya Gazî ku di sala 1919an de li Diyarbekirê tê derxistin di vê çapxaneyê de hatiye çapkirin.[11]
Hisên Hûznî Mûkriyanî ji bo bilindkirin û pêşxistina jiyana neteweyî ya Kurdan di sala 1914an de diçe Elmanyayê bi bihaya 150 lîreya Osmanî makîneyeke çapê dikire û piştî salekê di sala 1915an de li Helebê çapxaneyek vedike.
Desthilatdarên wê çaxê naxwazin Mûkriyanî çapxaneyê bixebitîne, gellek zehmetiyên mezin derdixin pêşî wî, ji ber vê sedemê bi mecbûrî çapxaneyê bar dike Rewandizê. Mûkriyanî di heman salê de pirtûka Mem û Zîn ya Ehmedê Xanî ji bo xwendevanên Kurd çap dike. Ev çapxane heta sala 1925an xebatên xwe didomîne. Di vê çapxanê de kovarên wekî Zarî Kurmancî, Çiyayê Kurmanc, Botan, Diyarbekir, Soran hatine weşandin. Hûznî Mûkriyanî di sala 1947an de li Bexdayê dimire. Piştî mirina Hûznî, çapxaneyê birayê wî Gîw Mûkriyanî dixebitîne.[12] Gîw Mûkriyanî navê çapxaneyê diguherîne dike Çapxaneyî Kurdistan, hemû alav û amûrên çapkirinê ji Rewandizê bar dike Hewlerê, çapxaneyê heta dema mirina xwe ya li sala 1977ê li wir dide xebitandinê.



19

Di navbera salên 1920an û 1926an Kurdistana Başur bi destê Înglizan tê dagirkirin. Îngilîzan di vê navberê de 16 dibistanên Kurdî vedikin û ji bo perwerdekirina zarokên Kurdan 44 mamoste tayîn dikin. Di vê demê de ji aliyê rêveberên Îngilîzan ve çapxaneyek li Silêmaniyê tê damezrandin. Di vê çapxaneyê de 14 hejmarên Rojnameya Bangî Kurdistan, 118 hejmarên rojnameya Pêşkewtin, 16 hejmarên Rojî Kurdistan û 6 pirtûkên curecur tên weşandin.[13]

Komara Kurdistanê ya li Mahabadê di sala 22'yê Çileya 1946an de bi piştgiriya dewleta Yekîtiya Sovyetê tê damezerandin. Jiyana komarê bi qasî salekê didome. Di vê dema kurt de ji bo perwerde û geşkirina xelkê komarê bi destekên Yekîtiya Sovyetê bi navê Çapxaneya Kurdistanê çapxaneyek tê damezrandin. Di vê çapxaneyê de kovar û rojnameyên bi navê Kurdistan, Gelawiz, Helale, Hawar, Hawarî Niştiman, Hawarî Kurd tên çapkirin û weşandin.[14]

Rojnameya Kurdistanê weşana fermî ya Komara Kurdistanê bû û ji aliyê komîteya navendî ve di heftekê de du caran bi 500 an jî 1000 nishe dihat çapkirin û belavkirin. Tê de mijarên siyasî, çandî, civakî û edebî cih digirtin. Edîtorê kovarê Saîd Muhammed Hamîdî bû.[15]
Tişta herî balkêş ew e ku di dîroka gelê Kurd de yekemîn kovara zarokan ya bi navê "Girrûgalî Mindalanî Kurd" li Komara Kurdistanê tê weşandin. Qadirî Muderrisî berpirsiyarê wê kovarê bûye. Di van herdu hejmaran de çend dersên ziman, coxrafya û behsên din tê de belav kirine. Li ser rûpela yekemîn a "Girrûgalî Mindalanî Kurd" wêneyê Selaheddînê Eyyubî hatiye weşandin.[16]

Kovar û rojnameyên ku li komarê dihatin weşandin ji bo Kurdistana Başur jî dihatin şandin. Xelkê Başurê heta têkçûn û hilweşandina Komara Kurdistanê ew weşanên çapbûyî dixwendin. Çapxaneya Kurdistanê heta hilweşîna Komara Kurdistanê xebatên xwe bê navber didomîne.

www.arsivakurd.org

Bi damezrandina devleta Sovyetê ve, Kurdên ku li vî welatî dijîn jî wekî milletên din kêm zêde gihîştine mafên xwe yên rewa. Pergala Sosyalîst ji bo bilindkirin û geşkirina zimanê kêmnetewan çapxaneyan vedike û dixe meriyetê. Li Erîvana Ermenistanê di sala 1921an de çapxaneya dewletê tê avakirin lê divê xwendevanan bizanibin ku ev çapxane ne ya Kurdan bû ya dewletê bû. Di vê çapxaneyê de pirr pirtûkên Kurdî tên çapkirin û belavkirin. Bi saya pergala Sosyalîst, Kurdên Qefqasyayê di dibistanan de bi zimanê xwe perwerde didîtin. Wekî Ermenîstanê, li Gurcistan, Azerbeycan û welatên din yên Yekîtiya Sovyetan de çapxane hatin damezrandin. Her milet ji wan çapxaneyan feyde didît û bi zimanê xwe pirtûk diweşandin.

Divê baş bê fêmkirin ku armancên çapxaneyên pêşî yên Kurdan ne karê bazirganî bû. Armanca sereke pêşxistina bîreweriya neteweyî ya milleta Kurd bû. Damezrînerên pêşî kesên îdealîst bûn, bi tenê dixwestin ku Kurd jî wekî milletên din xwedî rolek be di cîhanê de. Ji ber vê sedemê girîngiyê didan perwerde û xebatên çandî. Bi vê minasebetê bi rêxistinî hereket kirine, berî her tiştî cemiyet û komeleyên xwe damezrandine, ji bo fêmkirin û geşkirina hestên neteweyî rojname û kovarên siyasî, civakî û çandî çap kirine da ku civata Kurd jî azadiya xwe bi dest bixe.

Di roja me de karê çapxaneyê êdî bûye karekî ticarî, lewma li her çar parçeyên Kurdistanê gellek çapxaneyên Kurdan hatine sazkirin. Ji xêncî çapxaneyên Kurdan hûn dikarin bi pereyên xwe li çapxaneyên milletên din, weşanên xwe çap bikin.

ÇAVKANÎ:

[1] Cornelia Schneider, Mainzer Drucker – Drucken in Mainz, r. 208, Mainz Belediyesi Yayınları, Mainz 2000.

[2] M. Şükrü Hanioğlu, Bir Siyasî Düşünür Olarak Dr. Abdullâh Cevdet ve Dönemi, r. 111, Üçdal Neşriyat, İstanbul 1981.

[3] Hassanpour A. (2005). Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil. İstanbul: Avesta Yayınları. r.277.

[4] Naim Güleryüz, Türk Yahudileri Tarihi-1, Gözlem Basın ve Yayın Aş, 1993, r.124-125.

[5] Ermeni Matbaacılık Tarihi, Birzamanlar Yayıncılık, Kévorkian, 1999, r.174.

[6] Niyazi Berkes, "İlk Türk Matbaası Kurucusunun Dini ve Fikri Kimliği", Belleten, Cilt XXVI, Sayı 104 - Ekim 1962.

[7] Malmisanij, M. (1986). Yüzyılımızın Başında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullâh Cevdet. Stockholm: Jîna Nû Yayınları. r.85.

[8] Malmisanij, h.b., r.85.

[9] Hanioğlu, M. Ş. (1981). Bir Siyasi Düşünür Olarak Dr. Abdullâh Cevdet ve Dönemi. İstanbul: Üçdal Neşriyat. r.111.

[10] Malmisanij, M. (1986). Yüzyılımızın Başında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullâh Cevdet. Stockholm: Jîna Nû Yayınları. r.85.

[11]Cemilpaşa, E. (1992). Muhtasar Hayatım: Kemalizm'e Karşı Kürt Aydınının Mücadelesinden Bir Yaprak. Ankara: Beybun Yayınları.

[12] Celile Celil, Kürt Aydınlanması, Avesta Yayınları,Istanbul, 2000, r.93-94.

[13] Amir Hassanpour, Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, r.193,194,195, Weşanên Avesta, 2005.

[14] William Aegleton Jr.,Wehabad Kürt Cumhuriyeti 1946, r.236, Komkar Yayinlari.

[15] Marziye Mammedli, İran Kürtleri (23.12.1946 Tarihli Sovyet Raporuna Göre), r.16.

[16] Dr. K. Mezher Ehmed, Çend Rûpel ji Dîroka Gelê Kurd, Çap û Weşanxana APEC, r.132.



MIHEMED HESKO

XWEFİROŞ

Destên bi qirêj
Kesên guhdirêj
Pîsin nola şêj
Bê ol û doz in

Bar û serbar in
Dûpişk û mar in
Dostên neyar in
Bê sênc û soz in

Hevalin bi dev
Roj jî kirin şev
Qad berdan bi rev
Kerîyê koz in

Kewên regehan
Dizên rûgehan
Segên dergehan
Bi xwe nandoz in

Warê kurdan e
Cenga giran e
Dizker têdan e
Pîsên dilsoz in

www.arsivakurd.org

NİHAT GÜLTEKİN



Li Gundê Avşênê Dibistana Mexsîmê Xemo

Li derdora Çiyayê Elegezê diwanzdeh gundên kurdan hene yek jî wan Avşên e. Nişteclhên wan gundan hemû kurdên me alîyê Qersê, Wanê, Agirîyê hatine li vir jiyana xwe didomînin. Kurdên Sovyeta berê, kurdên koçberîyê, dîasporaye ne. Piranîya wan, kurdên ezîdî bûn. Gelek êlên kurdan yên derdora sînorê welatên Sovêtê, ji sîtemkarî û zora dewleta tirk neçar dimînin û derbasî Azerbaycanê, Gurcîstanê û Ermenistanê dibin. Ew ber zilma roma reş koçber bûne.

Bi qira ermeniyan re dest bi qira wan jî hatibû kirin. Piranîya wan li der dora Çiyayê Elegezê bi cîh dibin û ji xwe re gund ava dikin. Hikûmeta Sovyetê, ji aliyê kurdên Ermenistanê ve bi awayekî erênî û germ hat pêşwazîkirin. Li Ermenistanê serfiraziya desthilatdariya Sovyetê, dostaniya gerdîşî ya gelên kurd û ermenî xurttir kir.

Di salên ewilîn ên Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê de, ji bo qebûlkirina mafên neteweyên piçûk, bilindkirina asta wan a perwerdeyî, çandî û civakî xebatên girîng çêbûn.

Armanca perwerdeya pêşxistinê ew bû, ku nezantî, nexwendî, çand û adetên şûndamayî ji holê rake û ew gelên kêmjimar bigihîne asta gelên pêşketî. Mixabin ev polîtîka pir nedomand, bi desthilatdariya Stalîn rewş berevajî bû. Rewşa civakî, perwerdeyî, çandî, aborî, hunerî ya gelên biçûk bi Stalîn re guherî û îcar ew gel ketin bin zordarîye. Bi mirina Stalîn re rewş dîsa vediguhere erêniyê, gelên biçûk ji cihê mayî dest pê dikin, bi xebatên her cureyî, ji bo bipêşxistina neteweya xwe dixebitin.

Dema derbazî alîyê sinor dibin, gelek zarokên kurdan sêwî dibînin. Ew di sêwîxaneyên Ermenistanê de ku ji aliyê Emerîkayê ve hatibûn vekirin mezin dibin.

www.arsivakurd.org

Kurdên Ermenîstanê bêperwerde bûn, xwendin û nivîsandina wan pir kêm bû. Lê her diçe xwendin û nivîsandin zêde dibe di nava wan salan da. Ji van zarokên ku di van sêwîxanan de mezin dibûn, hin bûn bingehdarên edebiyata kurdî ya Ermenîstanê. Hinek ji bo xebatên folklornasiya kurdî bûn pêşeng, hinek bûn ronakbîr, akademîsyen, mamoste, bijîşk û hwd. Yanê qadroyên ewilîn di nav kurdên Ermenîstanê ji nava van sêwiyan derketin. Gelek rewşenbîr û nivîskar destpê xebatên cur be cur dikin. Rewşenbîr û nivîskarên wan her dem behsa ware kal û bavan kirine. Di çîrokên wan rewşenbîr û nivîskaran de hestên bêrîkirina û girêdana bi axa welat û adetên kevin ve pir diyar e. Nivîskarên Sovyeta berê salên bêdengî, tarîtî û bêhêvîtiya sirgûnê de, bi xebatên xwe va hêvî dane cimaeta xwe û rohanîya xwe berdane hundirê malên xwe. Rola kurdên Sovyetê ya di warê ziman û edebiyata kurdî de diyar û berbiçav e.

Ji salên 1920 heta îro li Ermenîstanê gelek kar û xebatên curê curê tên kirinê. Ev xebatana hemî bona pêşketine çand û edebiyeta kurdî ye. Ew hemî kar ne tenê bona çend hezar kurdên Ermenîstanê, an jî kurdên Sovyeta berê hatîye kirin. Wan hewil dayê ku her deman xwestine ku kar û xebatên wan bigihîje miletê wan, taybetî jî kurdên Kurdistana Bakur. Bajarê Yêrêvanê gelek saziyên xwendina bilind hebû. Van saziyan ji avabûna xwe vir de deriyên xwe ji ciwanên Kurdan re vekirine. Di van saziyan de bi sedan xwendekarên kurd ên mêr û jin xwendine. Gelek jin û mêrên ku van saziyan qedandine paşê di pîşeyên wekî rojnamevan, parêzer, mamoste, endezyar û hwd xebitîne. Gelek zanyarên kurd jî di van saziyan de wekî asîstan û profesor xebitîne. Hin ji wan di beşa zanista kurdî de lêkolînên hêja li ser dîroka kurdî kirine û ji bo lêkolîn û pêşxistina çanda kurdî lêkolînên hêja kirine. Xwendina bilind li gorî saziya zanistî ya kurdî li Yêrêvanê pêşve çûye, edebiyata kurdî di encama lêkolînên çanda kurdî de roj bi roj berhemên xwe dide û zimanê kurdî pêş dikeve. Rola rewşenbîr û nivîskarên kurdan gelek dereca bilind bû. Wan hemûyan berê xwe dabûn zimanê xwe û digel hemû zehmetî û êş bi zimanê xwe nivîsand in.
Dibê em rola dewleta ermenîya dubare bişikîrîn bona piştgirîya mezin dane kurda. Alîyê dewleta Ermenîstanê, Yêrêvanê karekî hêja hatiye kirin. Zanyar û ramanwerên kurd di Beşa Zanistên Rojhilatê de xebitîne.
Berhemên ramanwer û zanyarên Kurd, helbestvan û nivîskarên Kurd di rojnameya Rêya Teze ya bi zimanê Kurdî de hatin weşandin.

Radyoya kurdî weşan dikir, dewletê piştgiriyeke mezin dabû bi vê xebatê. Ew beşdarî rêvebirîya rojnameyê bûn, li wir ji bo danasîn û hişyarkirina çanda kurdî xebitîn. Yek jî wan derketine pêş Maksîmê Xemo ye. Mexsîmê Xemo jî yek ji wan bû ku nivîskarekî zîrek e, di van salên û heta dawîya emrê xwe xizmeteke bêhempa ji bo ziman û edebiyata kurdî kiriye.

Ez dema hatibûm Rewanê, armanca min î yekem ew bû ku, ez wan gundên kurdan bigerim û bi çavên serê xwe bibînim. Di nava çend roja ez li wan gundan gerîyam. Di wê gera min de tiştê herî bala min kişand navên dibistana bû. Li derdora Çiyayê Elegezê hinek gundan navên dibistana dewleta Ermenistanê navên kurdên eyan, navên nivîskar û helbestvana danibû. Mînak li gundê Pampa Kurdan (Sîpan) Dibistana Ferîkê Ûsiv bû, dîsa li gundê Riya Teze Dibistana Emînê Evdal, li gundê Elegezê Şekroyê Xudo bû, li gundê Avşenê jî navê dibistanê, Dibistana Mexsîmê Xemo bû. Dema min ew çar dibistan dît, ji bo wê şabûneke wisa mezin ketibû dilê min, ez ji ber bextewarîyê digirîyam. Mirov li ser zimane kurdî û rewşenbîrên xwe li vir serê xwe timî bilind digire, rastî ew rewşenbirên me hêjayî serbilindiyê ne. Ev tev di dilê me de şêrîn in.

Kurdên Ermenîstanê bi zimane xwe dijî, dixwîne, dixebite. Kurd ji aliyê neteweyên Sovyetê ve wekî netewe tên pejirandin, xwedîyê mafên çandî ne. Lê wan 20 salên dawî êdî îmkanên berê gelek kêm bûne alîye dewletê de. Li Ermenistanê ji ber rewşa aborî ya giran piraniya nifûsa kurdan ji bo kar û debara xwe koçî bajarên cuda dikirin. Dema gelek Kurd koçberî welat û bajarên din dibin, li wan deran karên cuda kirin. Kurdên Ermenistanê bi giştî jiyana xwe li gundan didomandin û di bin barên ekonomîk- civakî yên giran da bûn. Gundê Avşenê 36 mal hene. 40 zarok diçe dibistanê. Hin zarok pola neha şûndatir diçin gundê dinê, an jî bajarê din dixwûnin.

Dema tevî kekê Ezîz em gundê Pampa Kurdan çûn li gundê Avşenê min xwest em herin dibistanê. Kekê Ezîz li gundê Avşenê çend nasê xwe re xeber da û gazî mamosteyên gund, serwerê dibistanê kir. Dema em çûn baxçe dibistanê em demekê sekinîn, me behna xwe girt. Zimanzanê kurdî eyan, Serokê para Kurdzanîyê ya Înstûtûta rojhilatzanîyê li Akadêmîya Ermenistanê ye zanyarîyê Maxsîmê Hemo çend sal berê, hezîrana sala 2011an çûye ser dilovanîya Xwedê
Min gelek dixwast ez jê re nas bim. Gundîyên li vir wî Maksîmê Huseynê Elîyê Xemo bi nav dikin. Cihên em diçin ez nîşeya digirim û dixwazim ve gera xwe binivîsim. Taybetî jî derheqa wan çar dibistan û rewşanbîran. Îro firsenda ku li ber min çêbûye ez di derheqê Maxsîmê Hemo da dinivîsim, ez bi kêfxweşî pêk tînim. Nas û eqraba wî gelek tiştên baş diaxifin. Carek din ez fehm dikim ku kar û xizmeta wî li ser riya pêşxistina edebiyata kurdî, li ser zimanê edebiyate gelek girane. Niha li tirkîyeyê zimanê kurdî qedexeye, nîştecîhên wan dera şaş û metel dimînin. Û serbilindî behsa dewleta ermenîyan dikin. Tişte ku dewleta Ermeniya mirov dikare bişikîrîne hema me hemû gundan bîhîst û guhdarî kir. Navên kurdên navdar dayîna dibistanan gund ne hêsane, divê mirov qedire ve politîkaye bigire. Dema em dîroka kurdan ya ermenîstanê dinêrin me jor jî qal kir, di sala 1921ê Hakob Xazaryan li ser bingeha alfebaye ermenî Alfabeya Şems amade dike. Yekem car di vê tarîxê de li Ermenistanê dibistana kurdî vedibe.
.





Erê gundê Avşenê navê dibistana gund Mexsîmê Xemo bû. Karê zimanzanê eyan alîyê dewletê de bilind hatîye qîmetkirin. Ew hêjayî gelek mêdal û hurmetnemên komara Ermenistanê bûye. Em gazî mamosteyên dibistanê dikin ku em dibistanê bigerin û ji van re xeber bidin. Dema berpirsîyarên dibistanê tê em hal û ehwale hevdû dipirsin. Hatina min gelek şa dibin. Ez jî, ew jî çi meraq dikin pirs dikin. Pirs û bersivên me du hev tên. Bersîvê herî xweş li vê derê dibistanê da perwerdehiya kurdî jî heye. Di hin rojên hefteyê de perwerde ji zarokên Kurd re tê dayîn, birastî gelek gelek em şa dibin bi vê xebera dilê mirov xweş dike. Dema ku ez bi mamosteyê dibistanê Razviki Elî Amoyan re peyivîm, wî ji min re got ku "tu zextek tune alîyê dewletê. Sala 1921a heta roja îroyîn li nav sinorên Ermenistanê de dibistanên kurdî ava bûne, her dem perwerdehiya bi kurdî dest pê bûye". Dema em derbasî hindûrê dibistanê bûn, tiştên ewil bala min kişand, di dibistanê de wêneyên Mexsîmê Xemo û jînegarîya wî dalîqandî bû.

Sala 1947an di gundê Avşênê de dibistan tê vekirine. Sala 2011an piştî mirina Mexsîmê Xemo, navê dibistanê alîyê wezerata perwerde ya Ermenîstanê tê guharindinê. Heta roja îroyîn navê dibistanê wek Mexsîmê Xemo sekinîye. Di dibistanê de çar heb mamosteyên kurd, şeş heb jî mamosteyên ermenî hene. Razviki Elî Amoyan, Cangirê Cemal, Zoroyê Mêko navên mamosteyên kurd in. Dibistane de materyalên perwerdeya hebû, alfabeya kurdî, pirtûkên kurdî yên dibistanê û ya herî girîng mamoste û perwerdekarên pispor ên kurdî gelek bala min kişand. Bi rastî meriv dema wan dibistana dibîne, Ermenistanê zarokên kurdan perwerda kurdî dixwîne, parîkî bêhna meriv tê ber meriv. Erê, zarokên kurd dibistanê de dersên zimanê kurdî jî hîn dibin. Kitêbên Elîxanê Memê amadekirine dibistanê de bi zimanê kurdî, zarokan perwerde dikin. Heta pola şeşan dersê didine zarokan. Heftê carekê, rojê seetekê dersa kurdî, perwerde kurdî didin zarokan. Tiştekê li vir min êşand jî hebû, ew jî dewletê wan salên dawî, di navbera kurda dijîtî derxe ser navê zimane ezdikî dersekê derxistiye di nav dersên din. Zimane ezdikî bi herfê kirilîk didin. Ye kurmancî jî bi tîpên latinî didin. Di vê meselê de hinek ezdîyên xwe kurd nabînin jî rola wan heye.

Maksîmê Xemo sala 1934a, li gunde Çobanmazê (Niha Avşên), nehîya Aparanê ji dayîk bûye. Xwendina ewlin li dibistana gundê xwe û gundê cînar Pampa Kurdan (niha Sîpan), lê ya navîn dibistana gundê ermenîya Saxkahovîtê standîye.

Li wir ezê behsa du xeberan bikim ku her du jî di Rîya Teze de derçûne. A yekê rojnama Rîya Teze 11ê Dêkabrê (Kanûn) sala 1966a neşir bûye. Bi sernivîsa 'Ulmdarê cahil' behsa Maksîmê Xemo yî 32 salî dike. Ev nivîsara xweş ku şabûna Kurdan dide kifşê wisa ye:
''Nehîya Aparanê, orta çîya da gundekî kurdayî bedew heye. Avayêd wîye kawe-kubar binetara tepeê Caga şax vedaye, hema vir gundê Çobanmazêda (neh'îya Aparanê) Husêynê Xemoyî kolxozvan ra sala 1934a kurek bû, navê wî danîn Meksîm.

Meksîmê biçûk mezin bû, çû mekteba gund, paşê mekteba Sagkahovîtê da hînbû û li wir jî xwendina orte dest anî, çû bajarê Êrêvanê, sala 1954a ûnîvêrsîtêta dewletê da fakûltêta fîlologîê da hate qebûlkirinê. Li vir jî rêke teze ber wî vebû, ew ne ku tenê nava ziman û lîtêratûra ermenîya û ûrîsa da kûr bû, lê usa jî nava ya almana da. Li vir ew bi miqale û dakladêd xwe ye ulmîê va berbiçev bû, êd ku paşwextîyê ew ser xebitî û nêtêd xwe pêş da bir.

Sal pey sala derbazbûn. Meksîmê Xemo sala 1959a pey xilazkirina ûnîvêrsîtêtê ra aspîrantûra para înstîtûta cimaetêd Asîaêye Lênîngradêda hate qebûlkirinê. Li vir kurdzanêd eyan Orbêlî, Kurdoêv, Sûkêrman û êd mayîn komeke mezin dane ulmdarê cahil, lê Q. Kurdoêv bi xwe serekvanî xebata wîye ulmîê dikir. Li vir kovarêd başqe başqe da xebatêd wîye ulmîê neşir dibin. Ew nava wedekî kinda dîsêrtasîa xwe bi têma "Zaravê kurdêd Bedînan li Kurdistana Îraqêda" dinivîse 28ê meha yanvarê sala 1966a wê bi serfinyazî Êrêvanê da xwey dike û navê kandîdatê ulmêd fîlologîê distîne.

Meksîmê Xemo dha sêktora akadêmîa RSS Ermenîstanê da ulmaye rohilatzanîê da, koma kurdzanîê da dixebite çawa xebatçîyê ulmîê. Zûtirekê dîsêrtasîya wî ye neşirbe, lê diha ew ser têma ''Frazologîa kurda'' dixebite. Em ulmdarê cahil ra açîxîya dixwezin di xebata ulmîêda û emir da. '' (11ê Dêkabrê s. 1966)

Dema salên xwendinê, du sala (1958-1959) li para axaftinên kurdî ya radîoya Yêrêvanê da wek dîktor dixebite.
Wan salan, usa jî li dibistana hejmara 47a ya bajarê Yêrêvanê, ji bo zarokên kurd dersên zimanê kurdî vedike û bi xwe jî dersê dide. Ji pey dawî anîna xwendina bilind ra diçe bajarê Lênîngradê û aspîrantûra înstîtû rojhilatzanîyê ya Akadêmîya welatê sovêtê da dikeve xwendina zanyaryê (doktorantûra). Li wê navenda kurdzanîyê ye bi nav û deng da, di nav rojhilatzan û kurdzanên eyan, li ser têza xwe dixebite.
1964'a da li Yêrêvanê akadêmîya Ermenistanêye zanîyarî, di koma kurdzanyê (paşê ew kom dibe para kurdzanîyê ya înstîtûta rojhilatzanîyê), da derbazî xebata zanîyarîyê dibe.

Ji wê demê da, eva devedevî nîv sedsale, bê rawestandin li wir kar dikir. Zimanzanê xweyê emekê mezin temamya jîyana xwe dîyarî pirsgirêkên zimanzanya gelê xwe kir.

Sala 1990'î Maksîmê Xemo bi têma "Binaxên frazêologîya zimanê kurdî" dîsêrtasîva doktorîyê li bajarê Moskvayê xweyî dike û dereca doktorê fîlologîyê distîne. Sala 1997'a hêjayî navê profêsorîyê dibe.
Goveka şuxulvanya zimanzan berfire bû. Pirofêsor devedevî 120 pirtûk û gotarên zanestî li ser pirobilêmên zimanzanîya kurdî û cihanê nivîsîye û bi çend zimanan (rûsî, kurdî, ermenî) weşandîye. Emekê wî pire di zimanzanîya kurdî da. Em ji xebatên wî çenda bîr bînin;
" Ferhinga kurdî- rûsîyê firazbendî (firazêolog)",
"Zaravê kurdê behdînan li Kurdistana Îraqê",
"Zimanê kurdî û lîtêratûrî",
"Binaxêd firazêologîya zimanê kurdî",
"Rîya sazbûna zimanê kurdîyî hemmiletîyî lîtêratûrî",
"Probilêma prozêssa sazbûna strûktûra ziman bal merivayê",
"Probilêma daxwezê di zimanzanîyêda" û yên din.

Maxsîmê Xemo derheqa bi deha problêmên kurdzanîyê, başqe gotî-zimanzanîya kurdî da li konfêransên mezin e ortemiletîyê da pêşda hatîye û bi gotarên xweye zanestîye hewaskar fikira xwe ya zanestî gotîye û guhdarîya zimanzanîya cihanêye zanestî kişandîye ser zimanzanîya kurdî. Pirofêsor serokatiya zanesti bi dehan têzên berendem û doktora kirye, bi rêdaktorîya wî gelek pirtûk û xebatên zanîyarî bi zimanê kurdî, rûsî, ermenî hatine weşandin.

Wî karê xweyî zanyarî ra tevayî, ji sala 1968'a heta sala 1975'a li fakûltêta Rojhilatzanyê ya Ûnîvêrsîtêta Yêrevanêye dewletê da dersê zimanê kurdî daye.
Sala 1994'a bi hewildana Meksîmê Xemo û hinek zaniyarên ermenî li bajarê Yêrêvanê ûnîvêrsîtêta gûmanîtar ya ser navê "Davît Anhaxt" vedibe. Wir da fakûltêta kurdzanîê jî tê demezirandin. Zanyar li wê îdara xwendinê da him serokatîyê wê fakûltêtê dike û him jî dersê zimanê kurdî dide.
Fakûltêta rojhilatzanîyê ya ûnîvêrsîtêta ser navê "Hraçiya Açaryan" da jî dersên "Bingeha zaniyarîya zimanên rojhilatê" dide. 1996-2000'a serokatîya komîtêya têrmînologîya zimanê kurdî ya rex rojnema Rîya Teze dike, endemê şêwra zaniyarîyê ya xweyîkirna têzên kandîdatîyê û doktorîyê li înstîtûta rojhilatzanîyê ya akademîya Ermenistanê bû.

Mexsîmê Xemo, Svetlana Balyoz re zewicî bû. Svetlana Balyoz, qîza Balyoz Muradov bû. Zarokên wan, Tîtal, Wêzîr û Yûra hebû. Yûra emrê zû wê dinê koça xwe bar dike. Lê Tîtal û Wêzîr hê dijîn.

17 ê hezîranê sala 2011a li bajarê Yêrêvanê doktorê zaniyariya fîlologiyê, profêsor, zimanzanê kurdî eyan, serokê para Kurdzanîyê ya Înstîtûta rojhilatzaniyê li Akadêmîya Ermenistanê ye zanyarîyê Maksîmê Huseynê Eliyê Xemo (Maksîmê Xemo) diçe ser dilovaniya Xwedê. Kurdên Kafkasyayê hevalekî xwe, zanyarekî esil, zimanzanekî mezin winda dike. Mexsîmê Xemo ku di xebatên xwe yên zanistî yên li ser zimanê kurdî de kedeke mezin dabû. Meksîmê Xemo neketîbû pey nav, pey malê dinê, ne jî maleke pak ji xwe ra ava kirîbû. Ermenistanê jî derneket heta dawîya emrê xwe. Zimanzanekî kurd yê mezin bû lê xebatên wî ye giranbiha hê jî nebûne mal- milkê kurdan.

Piştî 65 salan vê carê bi nivîseke behsa zimanzan Maksîmê Xemo tê kirin lê ne ya şabûnê ya hiznê ye. Rîya Teze vê carê xebera mirina wî dide bi sernivîsa 'Profêsor Maksîmê Xemo çû ser dilovaniya xwe'. Vê carê bi hûrgilî qala jiyan û xebata wî tê kirin û tê gotin: "Zanyar-kurdzanekî mezin ji ji dibistana rewşenbîrya kurdên Ermenistanê koça xwe bar kir. Cêrgên sêrekbûyî hê sêrek bûn…" (Heziran, s. 2011) Rojên xwenî dawî li Ermenîstanê li gundê kurdan Avşenê , demeke dirêj e bi nexweşiya penceşêrê re têdikoşe. Piştî merasîmeke 3 rojan a li gorî kevneşopiya Êzidiyan binax dikin. Mexbere Maksîmê Xemo goristana gundê kal bavê wî Çobanmazê (Avşên) navça Aragasotinê ye. Em bi neferên malbata wî va tev çûn li ser mexbere Maksîme Xemo. Me fatiha û dua xwend, paşê jî me wêne kişand.

Çavkanî:
Zîyareta min gundê Avşenê 2018
Rojnama Rîya Teze, (11ê Dêkabrê 1966)
Rojnama Rîya Teze, (Heziran, 2011)
Eskerê Boyik- Çanda Kurdên Sovêtê
Wezîrê Eşo- Li Ermenîstanê Edebiyata Kurdan



MUQADES AGİRÎ

Şahmaran

Ne hingiv bû
şeraba eşqê bû
dipaliya ser dilê Şahmaranê
dilop bi dilop
mexrebeke dereng
ji xeweke aram şiyar bû
her pelên min evîn e got
yên ku te radipêçe
guh nede şikeftên kûr
gerstêrka dilê min
zehf ronahî ye
nêrînên Cemşîd diteyisîn
li hemberî heyva di bin erdê de
wexta ku çavên zimrûd
ew dikişand nav kûrahiyeke yaqûtî
ew sermest dikir

Şahmaranê got
çermê min derman e
ji dilê te re
bêhna min bihare
ji singê te re

ez toveke guldexwînim
li qiraxa evîna te vedibim
wexta Cemşîd porê wê
yên şevetarî şeh dikir
bi rengê dildariyê ve
neçe got Şahmaranê
tunebûna te
wê bibe jehrekî
û her roj her roj
wê bikoje dilê min
dema Cemşîd xatir xwest
piştî bi salan
û çû
derdekî bê derman
kete bedena qral rojekî

www.arsivakurd.org

wezîr got
goştê Şahmaranê
tenê derman e
ji êşa te re
li hev kom bûn fikirîn
li çareyekê geriyan
remildestan li fehlan nihêrin
bi rojan
paşê dîtin rêya
şûna Şahmaranê
bi sêhran
gotin kê bi çavê vê dinyayê
dîtibe rûyê Şahmaranê
a ew e
dermanê birînê
yek bi yek geriyan
li serşoyan
rojekî Cemşîd dîtin tazî
deq bi deq bû çermê wî
bi şopa eşqa Şahmaranê
û avêtin zîndanê bi rojan
kezeba wî dax daxî bû

dema got sira Şahmaranê
derxistin Şahmarana
wekî taveke rewnaq
avêtin ser axa welatê
di navbera du çemên ronak de
li welatê şah û horiyan
diçilwilî bedewiya Şahmaranê
stêrk bi stêrk dirijiya
li ser rûreşiya Cemşîdê
ku ketibû xwarê
got ji Cemşîd re
bi çavên dilşikestî
sozê me ne ev bû
baweriya min bi te hebû



www.arsivakurd.org

UMÎD DEMÎRHAN



Mersûmê qedîm ê kurdistanî

Awireke ğiştî li çarçoveya dîrokî ya kesayet, civak û mezra kurdan a qedîm

www.arsivakurd

Pêşek

Berî çend salan gava mirovî bigota ku Şahname qala kurdan dike; dibe ku hinekan lêva xwe badaya û bigota ku navê “kurd” tenê digel şivan û gavanan derbas dibe. Lê di rastiyê de Ehmedê Xaniyî berî çendîn sedsalan di Mem û Zînê de qala “mersûmê qedîm ê kurdistanî” dikir ku tê wateya “rê û resmên rêveberiya kevneşopî ya Kurdistanê”. Îcar di van salên dawîn de Şahnameyeke pexşanî ya sedsala 15an derkete ber ronahiyê; nusxeyên wê ne tenê li pirtûkxaneyên dîrokî yên Tirkiyayê, her wiha li arşîvên biyanî jî peyda dibin. Ev gotar hewl dide ku vê Şahnameyê bide naskirin û dûrbînekê biavêje naveroka wê ya ku “mersûmê qedîm ê kurdistanî” baş nîşan dide.

Peyvên sereke: kurd, mersûmê qedîm ê kurdistanî, dîrok, Şahname, Fîrdewsî, Kurdgalnamek...

1. Destpêk

Divê bê zanîn ku ji bilî Şahnameya Fîrdewsiyî, Şahnameyeke bi kurdiya hewramî jî heye ku ji aliyê Elmas Xanê Kenoleyî ve hatiye berhevkirin û ji aliyê Mihemed Reşîdê Emînî ve jî li Herêma Kurdistanê hatiye weşandin; lê belê ev nusxeya ku ji deh beşan pêk tê, tevahiya dîroka şahên Aryayê nahewîne.

Lewre divê wergera pexşanî ya Şahnameya sedsala 15an bi baldariyeke zêde bê xwendin, nirxandin û li kurdî bê wergerandin; her wiha li ser bingeha wê tezên “dîroka kurdan a kevnare” bên vejandin, vegotinên wê bi zanyariyên kevn û teze re bên berawirdkirin. Ev Şahname hem ji bo civaknasî, nijadnasî, erdnîgarî û siyasetmedariya kurdî çavkaniyeke balkêş e hem jî ji bo naskirin û xêzkirina “mersûmê qedîm ê kurdistanî” awêneyeke hilî ye.

Her wiha divê bê gotin ku guhertina çarçoveya Şahnameya farsî bi wergereke osmanî ya heman berhemê gelekî dijwar e; ji ber ku ev çendî çend sal in navê “kurd”an ji metnên wê yên fermî hatine derxistin, berhem li tevahiya cîhanê wekî mîrateyeke çanda parsan û parsîaxêvan hatiye tomarkirin, bi hezaran tezên master û doktorayê li ser hatine amadekirin, di pirtûkên dersan de wekî malê parsan hatiye pêşkêşkirin. Dîsa jî hêvî heye ku ronahîdîtina vê berhemê şoreşeke zanyariyê di çand, ziman û dîroka kurdan de peyda bike; her wiha kurdan li dijî rikberên wan biparêze, tezên wan pûç derxe an jî tundiya tezên wan sist bike û ji mîrateya kurdan a ferhengî re bibe mertal.

Êdî li ser kurdan, zenda milên wan û xîreta wan a neteweyî dimîne ku xwedî li vê mîrateyê derkevin, li zimanê kurdî wergerînin û digel şîroveyên pêwist li cîhanê bidin naskirin.

2. Di Şahnameya sedsala 15an de dîroka kevneşopî ya şahên kurdan

Li gorî agehiyên ku amadekarê tezê Dr. Mustafa Kugu dide, ev Şahname di sedsala 15an de (854 k./1450 z.) ji farsiyê bo tirkiya osmanî bi pexşankî hatiye wergerandin; wergêrê wê ne diyar e, lê ji bo siltanê osmanî Muradê Duyem (1421-1451) ê bavê Fatihî hatiye xelatkirin. Li pirtûkxaneyên Tirkiyayê 3 nusxeyên wê yên wênedar hene û li Pirtûkxaneya Muzeya Seraya Topkapiyê ne (TSMK, H. 1116, H. 1518, B. 248); her wiha nusxeyeke wê jî li Pirtûkxaneya Neteweyî ya Awistiryayê ye (Cod. Mixt. 709 Han).

Hevoka pêşîn (r. 14) û paşîn (r. 853) ên Şahnameyê gelekî balkêş in. Di hevoka pêşîn de nirxê dîroknasî û sexbêriya zanyariyan wiha hatiye vegotin: “Wî hişmendî wiha got: Merivê dîroknenas û nepijî kaşî refa pêşîn neke û tu carî pê ewle nebe, jê bawer neke; her wiha ji dijminê kevn hêvîdar nebî.” Îcar hevoka ku dibêje “ev Şahname ji aliyê Firedewsiyê Tûsî ve sala 400î ya koçî bo Siltan Mehmûdê Xeznewî hatiye nivîsandin û sala 854an a koçî jî bi fermana Siltan Murad li zimanê tirkî hatiye wergerandin”, şoreşeke zanyariyan e; ji ber ku şik û gumanê datîne ser hemû nusxeyên Şahnameyê yên farsî û bi zimanên din ku “gelo guhartin û destwerdanek di metnê Şahnameyê de hatiye kirin ku navê kurdan wekî desthilatdar û damezrîner derbas nabe?”

2.1. Mêjûnasiya erdnîgariya Şahnameyê li gorî zanyariyên dîrokî yên hevçerx

Şahname tenê qala şahaniyên Aryayê, kesayet û tevgerên şahan nake; her wiha gelek mijarên exlaqî, erdnîgarî, siyasî, aborî û dîplomatîk jî tîne rojevê. Lewre divê mirov nexşeya hera fireh a Aryayê bîne ber çavan û panoramayekê nîşan bide ku vegotinên Şahnameyê baş bên fêmkirin.

100,000 BZ: Depoyên şikeftan li çiyayên Zagrosê yên rojavayê Aryayê hatine vedîtin; destkeftiyên van vedîtinan nîşan didin ku ji serdema Paleolîtîka Navîn û pê ve ev dever cih û warên mirovan bûne.

8000 BZ: Li devera Zagros û şûnwarên wekî Serav, Goran û Elî Koş belgeyên derbarê geşedana jiyana çandiniyê de hatine bidestxistin; li gorî belgeyan, gundiyên akincih ajel kedî kirine û rehek hêşîn kirine.

5500 BZ: Şûnwarên kevnare yên Siyelkê li nêzîkî Kaşana Espehanê hatin vedîtin.

4500 BZ: Li Girê Hecî Fîrûz kûpekî şerabê hatiye vedîtin; li gorî angaştan ev kûp amûra hilberandina şerabê ya herî kevnare ye.

4200 BZ: Bajarê Sûsayê li başûrê rojavayê Parsê hate damezirandin.

3500 BZ: Li Sûsayê, kelûmelên boyaxkirî yên Îlamê hatine dîtin; ev destkeftî nîşan didin ku ev dever gihiştiye asteke pêşkeftî ya xêzkirina hêmayên geometrîk û şêwazên mirov û ajelan.

3200-2700 BZ: Serdema pêşîn a şaristaniya Îlamê.

3000 BZ: Li Kermanê çanda “cîroft”ê hatiye vedîtin; ji kevirê kesk ê nerm gul û hin tiştên din hatine xêzkirin ku rolyefên resen û balkêş pêşkêş dikin.

2700 BZ: Padîşahiya Îlamê hate damezirandin û Sûsa wekî paytext hate pejirandin.

2700-1600 BZ: Serdema Îlamê ya paşîn.

2094-2047 BZ: Îlamê ji aliyê Şûlgî ve (ji xanedana sêyemîn a Ûr) hate dagirkirin.

2004 BZ: Îlamê di dawiyê de Împaratoriya Ûr hilweşand.

2000 BZ: Stranên herî kevnare yên sanskrîtî Rîg-Veda hatin bestekirin.

1900 BZ: Nişтecihên deşta Sindohindê li Harapayê (Pakistana îro) cara pêşîn ji pembûyî pirtiyên qumêş hûnandin.

1595 BZ: Hîtiyan Babîl dagir kir, artêşa wê têk bir û zengîniya wê talan kir.

1500 BZ: Şaristaniya Harapayê ji hêla aryayiyên bakurî ve hate dorpêçkirin.

1500-1100 BZ: Serdema navîn a Îlamê dest pê kir.

1400 BZ: Di vê serdemê de devera Aranê di destê hîtiyan de ye; belge nîşan didin ku cara yekem li vê derê hesin hatiye hilberandin.

1350 BZ: Nivîseke vedîtî ya li Bogazkoya Anatolyayê tomar dike ku peymaneke zewacê di navbera qralê hîtiyan û mîrê mîtaniyan de hatiye girêdan; di peymanê de xwedawendên hindoaryayî Mîtra-Varûna, Indra û Nasatyas hatine gazîkirin û ev yeka han bi eşkereyî nîşan dide ku pêla baweriyên hindoaryayî gihiştiye bakur-rojavayê Aryayê.

1350 BZ: Pêlên koçberiya hozên Aryayê ji devera Belx û Merwê ber bi rojavayê ve kişiyaye; li deşta Aryayê û rojavayê wê bi cih bûye.

1244-1208 BZ: Di navbera Îlam û Aşûristanê de nakokî zêde bûne; qralê aşûrî Tukultî-Ninurta I êrişî çiyayên bakurê Îlamê kir û Îlam jî di bin desthilatdariya qral Kidin-Qutran de êriş bir ser Babîlê.

1100-770 BZ: Anşan hîn jî di beşa Îlamê de ye; di navbera Îlam û Babîlê de li dijî aşûriyan tifaq çêdibin.

1100-539 BZ: Serdema Îlama nû dest pê dike.

1000 BZ: Li gorî hin texmînan, pêxemberê aryayiyan Zerdeşt di vê pêvajoyê de ji dayik dibe. (Zanyariyên derbarê dîroka jidayikbûna Zerdeştî de nakokbar in; lê belê texmîna xurt ew e ku di navbera 1200-600 BZ de ye).

835 BZ: Navê Medan cara yekem di nivîsareke qralê aşûrî Şalmaneser III de derbas dibe.

770-646 BZ: Hozên parsiyan îlamiyên Anşanê ber bi Sûsayê dan koçberkirin.

708 BZ: Diyako padîşahiya Medyayê li paytext Hegmetanê damezirand.

705 BZ: Pêşengê Xanedana Hexamenî Hexameniş (li gorî texmînekê jî derdora sala 675an) ji dayik bû.

675 BZ: Li gorî Heredotî, padîşahê Medyayê Ferîburz (Phraortes) derkete ser têxt.

639 BZ: Qralê aşûrî Aşûrbanîpal Îlamê têk dibe û Sûsayê talan dike. Îlam êdî careke din wekî hêzeke serbixwe namîne.

633 BZ: Sakayiyan Medya dagir kir.

625 BZ: Qralê aşûrî yê hêzdar û wêrankarê Îlamê Aşûrbanîpal mir.

624 BZ: Mediyan sakayî têk birin û ji axa Medyayê qewartin.

624 BZ: Padîşahê Medyayê Key Xusro (Kyaxares) derkete ser têxt.

612 BZ: Key Xusroyî bi babîliyan re hevalbendiyek girêda û êrişî paytexta aşûriyan Nînawayê kir; hêzên hevpeyman ên medobabilî li dijî Aşûristanê bi ser ketin û ew dewlet hilweşand.

584 BZ: Key Xusro mir û kurê wî yê bi nasnavê Dehak (Astyages) li şûna wî derkete ser textê Medyayê.

561 BZ: Croesos bû qralê Lîdyayê.

558 BZ: Kûroşê Mezin li Anşanê derkete ser textê desthilatdariyê; paytexta Hexameniyan a ku li Fars û Xuzistanê bû, bar kir Sûsayê.

550 BZ: Kûroşî keyê Medyayê Dehak têk bir, Hegmetan zeft kir, kete şûna keyê medî û yekîtiya medoparsî ava kir.

549-548 BZ: Kûroşî Partava (Pehlew, Parsûa), Gurgan (Hyrcania) û bi ihtimalekê Rewan bi ser merzê Aryayê ve berdan.

546 BZ: Kûroşî êrişî Lîdyayê kir, qralê Lîdyayê Croesos têk bir û paytexta wî Sard bi ser merzê Aryayê ve berda.

539 BZ: Kûroşî piştî ku li peravên Dijleyê artêşa Babîlê têk bir, -bêyî berxwedanek zêde- bajarê herî dewlemend ê rojavayê Asyayê Babîlon bi dest xist.

539 BZ: Kûroşî destûr da cihûyên sirgûnkirî ku vegerin Qudsê (Orşelîmê); her wiha alîkarî da cihûyên rizgarkirî ku Perestgeha Silêman Pêxemberî li Orşelîmê ava bikin. (Diyar e ku ji vê rojê pê de qelşek kete navbera medên li ser ayîna xwe û parsiyên ku bûn hevalbendên cihûyan. Tiştê balkêş ew e ku parsiyên îroyîn dîroka xwe bi hexambûnê ve girêdidin û serdema Hexamenişê <Achamenid> wekî destpêka dîroka xwe dihesibînin. Ji ber ku “hexam+eniş” komepeyveke ibranî ye û tê wateya “kesê ku li hişê hevalê xwe siwar dibe û wî dike bin bandora xwe” û peyva “hexam” bi xwe jî “hevrê, heval” e.)

529 BZ: Kûroşî êrişî hozên sakayî yên li bakur-rojhilatê Aryayê kir û di şerê li dijî Masyakatayê (Masîgirtan) de hate kuştin; piştî ku li Pasargadayê hate veşartin, kurê wî Kambîz li dewsa wî derkete ser têxt.

525 BZ: Artêşa Aryayê di bin serfermandariya Kambîzî de Misir feth kir, an jî fetha xwe temam kir.

521 BZ: Kambîz dema ku ji Misirê vedigeriya di rê de mir; muxê (magiyê) bi navê Gaumatayî navê Smerdisê (Bardia) kurê Kûroşî li xwe kir û bi sextekarî text û tacê Aryayê desteser kir.

521 BZ: Darayê ji binemala Kûroşî ji hin giregirekên Aryayê alîkarî wergirt; di qesra şahaniyê de êrişek li dijî Gaumatî li dar xist, ew kuşt û bi xwe derkete ser têxt.

519 BZ: Hejmareke mezin a satrapiyên Aryayê li dijî Darayî serhildan li dar xistin; Darayî piştî wergirtina text û taca Aryayê ev serhildanên berbelav tepeser kirin.

518 BZ: Darayî ji bo aryayiyan li Textê Cemşîdî (Persepolîs) paytextekî nû ava kir.

514 BZ: Darayî li bakurê Kafkasyayê û li qeraxên Behra Reş êrişî sakayiyan kir.

494 BZ: Yûnaniyan piştgirî da serhildanên Îyonya (Asyaya Biçûk) û Milawatayê (Miletus); di encamê de bajarê Sardê hat talankirin û şewitandin.

494 BZ: Fîloya deryayî ya Aryayê di bin fermandariya serleşker Mardûniya de yûnanî li girava Ladeyê (Miliwata, Milet) têk birin û Yûnanistan dagir kir; bi vî awayî Trakya û Makedonya bi ser merzê Aryayê ve hatin berdan û welatê Aryayê gihişte tixûbê xwe yê herî berfireh ji aliyê rojavayê ve.

2.2. Li ser bingehê Şahnameyê sondajek ber bi Aryaya kevnare

Ev nusxeya Şahnameyê dîroka şahaniyên Aryayê wekî dîroka xanedanên kurd nîşan dide, ne ku dîroka şahên parsiyan; li gorî naveroka wê ya dirêj, ji destpêka Xanedana Pîşdadî heta şahê dawîn ê Xanedana Sasanî hemû malbatên desthilatdar (pîşdadî, keyanî, eşkanî, sasanî) ji heman nifş û nijadê ne û giştjî kurd in, ji zuriyeta Ferîdûnê Kurd in.

Di hevdîtinekê de Ristemê Zal û Isfendiyar li ser reh-rîşe û kar-xebatên xwe diaxivin: “Îsfendiyar ji Ristemî re dibêje <heke şaşiya min hebe, demildest sererast bike bê ka nijada min digihêje kîjan şahî: Ez Îsfendiyar kurê Goşthesp im, Goşthesp kurê Şah Lohresp, Lohresp kurê Şah Erwend, Erwend kurê Beşîn û Beşîn jî kurê Key Qubad e. Bi vê şecereyê reh û rîşeyên me digihêjin Şah Ferîdûnî. Her çi ku diya min e, ew jî keça Qeyser e, Qeyser kurê Selm e û Selm jî kurê Ferîdûnê Kurd e.” (Şahname, 224-225)

Şahname diyar dike ku *“piştî kuştina Darayî ji aliyê Skenderê makedonî ve û dagirkirina Aryayê (r. 318) şahên gewre nemane; li her goşeyekê begek hebûye, li devereke taybet serwerî kiriye û ji wan re <begên peregende/tewayifê milûk> hatiye gotin. Welatê Aryayê tam 200 salî di vê rewşa awarte de maye û şahaniyeke yekgirtî tunebûye; tu dibêjî qey li rûkalê cîhanê şahek tunebûye, text û tac vala mane, ji wan began tu kesî li ber yekî din danexwariye, her yekî serxwebûna xwe ragihandiye û bi vî awayî rûkalê cîhanê ji aloziyan rizgar bûye. Di rastiyê de ev tevdîreke siyasî û îdarî ya Skenderî bûye ku şahekî gewre dernekeve, ji bo tolhildanê berê xwe nede Romayê û vê deverê dagir neke. Di vê serdemê de pehlewanekî navdar ê bi navê Abtacaş hebûye ku ji Amûriyeyê veqetiyabûye; Skenderî deverên Fihistan (Kuhistan/Qehistan), Şîraz û Bexda dabûne bin fermana wî, kesî ji tirsa wî destdirêjiya wê deverê nekiribûye. Darayê ku di şerê ligel Skenderî de hatibû kuştin, kurekî wî yê bi navê Eşk hebûye; dema ku bavê wî tê kuştin, ji romayiyan direve û di nava şert û mercên jiyaneke mişextî de dijî. Piştî ku Skender û Abtacaş dimirin, Eşk doza şahaniyê berz dike û dibe şahê Aryanistanê; piştî Eşkê kurê Darayî di rêzê de Şapûr, Behram, Bilaş, Ermuzd, Resîgerd û Erdewan şahtiyê dikin. Şah Erdewanê ku dibe şahê Aryayê, ji nifşa Key Kawisî ye û jê re Erdewanê Bozorg (Gewre) jî dibêjin; di serdema wî de gur têkilî miyê nebûye û piştî wî, birayê wî yê bi navê Bilaş bûye şah. Ji Bilaşî kurekî bi navê Guzerd û ji Guzerdî kurekî bi navê Nersî çêbûye. Piştî wî (ne diyar e bê ka piştî Bilaşî yan jî piştî Nersiyî) Xusro bûye şah û piştî Xusroyî jî Erdewan li ser textê şahanî rûniştiye; bi vî awayî di serdema Erdewanî de Şahaniya Eşkaniyan a <begên peregende/tewayifê milûk> qediyaye. Serdema şahên eşkanî gelekî kurt bûye; lewre navên wan di <dîwana şahan> de nehatiye tomarkirin.”* (r. 388-389)

Şahname serdema eşkaniyan û sasaniyan, her wiha destguhertina desthilatdariyê û destpêka serweriya sasaniyan wiha vedibêje: *“Gava ku Erdewanê Dawîn bû şahê Aryayê, navên şahan dîsa bilind kirin û şahanî vejand; serwer û giregirekên parêzgahan dihatin ber dergehê wî, ji parêzgehên Bexda, Pars, Espehan û Kuhistanê qasid dihatin û diçûn. Bi fermana wî Babekê kurê Sasan bûbû parêzgarê Istexrê; tevahiya deverê bi rê ve dibir ku ji nifşa Behmenê kurê Îsfendiyar e. Behmenê kurê Îsfendiyar di heyama xwe de şahanî nedabû kurê xwe yê Sasan; lewre Sasan gelekî tengezar bûbû, koçî Nişawerê kiribû û li wê derê jî miribû. Sasanî navê kurê xwe jî danîbû Sasan û vî Sasanî jî heman navê Sasan li kurê xwe kiribû; hetanî heşt zikan (nifşan) vê malbatê navê Sasan li zarokên xwe yên kurînî dikir, binemala Sasanî ji derdorê re şivantî dikir û berî ku bibe parêzgar Babek bi xwe jî serşivan bû.” (r. 388-340) Divê bê gotin ku Qelqeşendî jî dibêje ku “şahê pêşîn ê sasaniyan Erdeşîrê kurê Babekê kurê Sasanê kurê Erdeşîr Behmenî ye û ji nifşa Darayî ye”.*

Em dîsa vegerin bûyerên Şahnameyê: “Rojekê li hafa Şah Erdewanî qala Erdeşîrê kurê Babekî hate kirin; di vê galegalê de ewqasî behsa mêranî û hişmendiya Erdeşîrî hate kirin ku Erdewanî nameyek ji Babekî re şand ku kurê xwe bişîne koçk û seraya şahaniyê, bila di nava kurên wî de hînî kar û barên rêveberiyê bibe. Babek kurê xwe ji bo vê rêwitiyê amade dike û dişîne; lê belê ji ber nakokiyeke di navbera Erdeşîr û kurê Erdewanî de, hêrsa şahî tê û Erdeşîrî dişîne serayeke li kêleka tewleyên hespan. Di heyama ku Erdewan di nava kêf û şahiyan de ye, Erdeşîr bi keça Erdewanî ya bi navê

Gulnar re dibe hevnas; dema ku Erdeşîr li vê xerîbistanê ye, Babekê bavê wî dimire; Erdewan gelekî li ber mirina wî dikeve; lê li şûna ku Erdeşîrî bişîne ser textê bavê wî, kurê xwe yê Behmen dike parêzgarê Istexrê. Li ser vê yekê Erdeşîr gelekî tengezar dibe û dixwaze ku ji serayê bireve; bi alîkariya Gulnara Erdewanî direve, hêzên xwe berhev dike, di dawiyê de desthilatdariyê ji destê eşkaniyan derdixe, dewleta sasaniyan dadimezirîne û dibe şahê yekem ê Şahaniya Sasanî." (r. 390-401)

Ji xwe di nakokiya di navbera Xusroyê Sasanî û serdarê wî yê bi navê Behramê Çopîn de jî ev yek derdikeve holê: "Behramî gote Xusroyî: - Hey dagirkero, kesekî wisan sezayî şahaniyê ye ku têxt û tacê ji destê te derxe! Erdeşîr ji keça Babekî hate dinyayê û bû destgirê (xulamê) eşkaniyan. Piştre dema ku Erdeşîr bendeyê dergehê Erdewanî bû, şah kuşt; pergala şahtiyê û textê serweriyê desteser kir. Ji wê heyamê heta niha 300 sal derbas bûne û serdema sasaniyan êdî kuta bûye. Li vê cîhanê şahanî sezayî eşkaniyan bû; heke ji wê malbatê mîratgirek hebûya, ew dê layiqî têxt û tacê bûya. Madem ku ji wê xanedanê kesek nemaye, êdî text û tac layiqî min in." (r. 734-735)

2.2. Sihvedana dîroka şahên Aryayê di nava çavkaniyên dîrokî yên erebî de

Piştî van zanyariyên Şahnameyê divê em vegerin çavkaniyên erebî; ji ber ku ereban Şahaniya Sasanî têk bir û bûyerên wê serdemê tomar kirin. Gelo -wekî ku Şahname dibêje- xanedanên şahan ji pîşdadiyan heta sasaniyan ji heman binemalê bûn? Ji bo bersivandina vê pirsê, divê em serî li çavkaniyên erebî bidin ku çend tiştên nêzikî rastiyê bibêjin.

Qelqeşendî (1355-1418) dîroka Aryayê li ser du beşan pareve dike: heyama berî îslamê û heyama piştî îslamê; her wiha heyama berî îslamê li ser serdemên pîşdadî, keyanî, eşkanî û sasaniyan leva dike. Her çi ku heyama piştî îslamê ye, ew jî wekî serdema xelîfeyan, serdema ebasiyan û serdema moxoliyan hatiye dabeşkirin: "Ji heyamên herî kevnare ve şahên Aryayê mezintirîn padîşahên cîhanê ne; her wiha ji aliyê pergala mezrê (dewletê) û rêveberiya welêt ve tu kes bi wan re nayê berawirdkirin. Rêza yekem a van şahan pîşdadî ne; peyva <pîşdad> tê wateya <destpêka dadweriyê> û şahê pêşîn ê vê xanedanê Hoşeng e ku tac daye serê xwe, li ser têxt rûniştiye, pergala dewletê saz kiriye û bac daniye ser hemwelatiyan. Padîşahiya wî bi qasî sed salan piştî Tofanê ye; wî bajarên Babîl û Sûsayê ava kirine, wekî siyasetmedarekî baş şêwazê rêveberiyeke qenc meşandiye. Li pey wî Tahmûrs bûye padîşah, lê di navbera Hoşeng û Tahmûrs de çendek bav hene; wî jî mîna kalikê xwe siyaseteke qenc meşandiye û cara yekem bi zimanê aryayî dest bi nivîsê kiriye. Paşê birayê wî yê bi navê Cemşîd li ser têxt rûniştiye û wateya navê wî <tîrêja heyvê> ye. Cemşîd di destpêkê de li ser mersûmê qedîm ê bav û kalên xwe tevgeriaye; wî sînorên welêt berfireh kirine, çînên karmendan li gorî karên sivîl û leşkerî destnîşan kirine. Kesê ku cejna Newrozê li dar xistiye jî ew e; lê belê piştî heyamekê ji pergala dadweriyê bi dûr ketiye û ji aliyê aryayiyan ve hatiye kuştin. Piştî Cemşîdî, Pîresp bûye şah ku nasnavê wî Deh Hak e, ev nav tê wateya <xwediyê deh nexweşiyan> û di çanda gelêrî de jê re Dehak tê gotin. Di serdema Dehakî de tevahiya cîhanê ketiye bin desthilatdariya wî; lê ji dadweriyê gelekî bi dûr ketiye, sitemkarî û hovîtî kirine, hemwelatî kuştine, bacên giran danîne ser pişta gel, çanda dengbêjî û meyxaneyan belav kiriye...

Li gorî salixên salixdaran, Tofan piştî serdema Dehak û şahên Aryayê yên berî wî pêk hatiye û Kawayî dawî li desthilatdariya Dehakî aniye. Piştî wî Ferîdûnî serwerî li Aryayê kiriye ku li gorî salixan kurê nehemîn ê Cemşîdê navbihurî ye û di serdema Ferîdûnî de Brahîm eleyhiselamî re pêxembertî hatiye şandin ku navê wî di Quranê de jî derbas dibe.

Ferîdûnî li tevahiya cîhanê serwerî kiriye, rêveberiya cîhanê di navbera kurên xwe de pareve kiriye û miriye.” Bi rastî Şahname jî qala pirtûka Brahîm eleyhiselamî ya li nava welatê Aryayê dike û dibêje: “Dema ku Erdeşîrî dawî li desthilatdariya Erdewanî anî, gazî giregirekên dewleta wî kir û got: ‘-Gelî hişmend û serweran, her kesî ji destê Erdewanî gelek tengezarî kişandin; Eşkaniyan desthilatdariya xwe bi pergala Skenderî bi dest xist. Hûn dizanin ku Skenderî bav û kalên min kuştin û Erdewanî jî cîhan kir bin destên xwe. Ez bi xwe ji nifşa Îsfendiyar im û çawa çêdibe ku Erdewan bibe şehriyar?’ Wan serwer û pêşengên dewletê piştgirî dane Erdeşîrî û şîret lê kirin ku pêşiyê parêzgaha Parsê bike destê xwe; lê belê deryavanekî bi navê Tebak hebû ku parêzgarê devera Çehdemê bû û Erdeşîr ji tevgera wî ditirsiya. Rojekê Tebak derket, hate hafa Erdeşîrî û diyar kir ku ew dê bibe xizmetkarê wî; lê saw û sehmek di dilê Erdeşîrî de hebû, gelo vî siyasetmedarê pispor ê ku destê wî dirêjî nava karmendên dewletê bûbû, jê re minexetî nekira? Tebakî nihêrî ku Erdeşîr bi xizmetkariya wî gumanbar e, pirtûka Brahîm pêxemberî derxist; jê re sond xwar ku niyêtpaqij e û piştî vê sondê Erdeşîrî ew kir serdarek ji serdarên artêşa xwe.” (r. 398-399)

Zanayê kurd ê gewre Alûsî (m. 1270 k.) di tefsîra xwe ya bi navê “Rûh’ul-Me’anî”yê de dibêje ku “hemû pirtûkên dîrokî hevraman in ku Ferîdûn di serdema Brahîm eleyhiselamî de jiyaye û cîhan di nava sê kurên xwe de pareve kiriye; her wiha Mûsa eleyhiselam jî di heyama Manîçehrê kurê Îrec kurê Ferîdûnî de pêxembertî kiriye.” Ji aliyekî din ve, dibe ku Ferîdûn û Nemird (Nemrûd, Nîmrûz/Nîvroj) heman kes bin; ji ber ku îro jî peyva “perîzan” a kurdî û “perîdan” a farsî (di farsiya gelêrî ya îroyîn de: “perîdûn”) hene ku tên wateya “kesê ku cin û periyan dizane”. Her wiha ji ber ku di zimanê erebî de dengê /p/yê tuneye, dibe ku peyva “perîdan” wekî “ferîdûn” hatibe guhastin û tomarkirin. Dîsa bi ihtimaleke mezin, ew gotina navdar a ku dibêje “kurd neviyên cinan in” ji ber perîzaniya Ferîdûnê Kurd be ku ji cin û periyan zanyarî wergirtine.

Zanayekî din ê kurd Gurganî (Curcanî, m. 471 k.) dema ku ayeteke derbarê cadûbaziyê de şîrove dike dibêje ku Ferîdûnî zanista cadûbaziyê dizanibûye: “Ferîdûn kurên xwe şandine cem şahê Misirê da ku keçên wî li xwe kebîn bikin (bi wan re bizewicin); dema ku lawên wî vegeriyan, Ferîdûn di dilqê marekî de derdikeve ser riya wan û wêrekiya wan ezmûn dike. Ferîdûnî nihêriye ku Selm jê reviyaye, Tûşî êrişî wî kiriye û Îrecî jî gef lê xwariye û daye tirsandin. Gava Şah vê bûyerê dibîne, li gorî rêjeya wêrekiya her yekî rûkalê cîhanê li wan pareve dike.” Zanayekî din ê kurd Dînewerî (m. 282 k.) jî dibêje ku Brahîm eleyhiselam di heyama Ferîdûnî de jiyaye; lê di zimanê aryayiyan de nasnavê Nemrûdî (Nemird) Ferîdûn e, navên kurên wî Selm, Tûs û Îrec bûne: “Di salên dawîn ên padîşahiya xwe de Nemrûd dest bi sitemkariyê kir. Padîşah Nemrûdê ku aryayî jê re dibêjin Ferîdûn, gelekî bi stêrnasiyê re mijûl bûbû; ji çar nikarên cîhanê stêrnas gazî koçka xwe kirin û bi diravan ew stêrnas kirin merivên xwe. Piştre wî ji malbata xwe heft nûner hilbijartin; navê Desteya Kubaran li vê koma bijartî kir, kar û barên wan destnîşan kir û her endamekî vê desteyê li devera xwe bi awayekî serbixwe kar kir. Bavê Brahîm ê bi navê Azer jî yek ji wan nûneran bû.”

Îcar Qelqeşendî di berdewamiyê de rêza şahên Aryayê wiha destnîşan dike: *“Piştî wî, kurê wî yê bi navê Îrec bi peymana bavê xwe bûye şah; piştî Îrecî, her du birayên wî yên bi navên Şerm û Tûc hevserokatî li welêt kirine. Piştî wan jî Menûçehrê kurê Îrec derketiye ser textê şahaniyê û li gorî salixan, di heyama wî de ji Mûsa eleyhiselamî re pêxembertî hatiye şandin û firewnê Misirê yê wê serdemê jî parêzgarê Aryayê yê li Misirê bûye.*

Piştre Ferasiyabê kurê Tûc (Perasiyab=Afrasiyab) bi zordestî derkete ser têxt, welat wêran kir û xerabiyên nedîtî pêk anîn; lê ji neviyên Menûçehrî, kesekî bi navê Zûyê kurê Tahmasp artêşa Ferasiyabî şikand, dîsa welat gihande asteke baş, Çemê Zêyê kir du beşan û li kêleka çêm bajarvanî da destpêkirin. Piştî Zûyê Tahmaspî, şahê dawîn ê pişdadiyan Girşesp bû desthilatdar ku ji nifşa Tûcê kurê Ferîdûnî ye."

Gava mijar tê ser keyaniyan, Qelqeşendî bi kurtî wiha qala serdemê dike: "Xanedana duyem Keyanî ne. Ji ber ku li pêş navên wan peyva <key> heye, wisan hatine binavkirin. Mîrê wan ê yekem ê piştî Girşespê pîşdadî, Key Qubadê kurê Zû ye. Wekî bavê xwe bi dadwerî serwerî kiriye û piştî wî neviyê wî yê bi navê Key Kawisê kurê Key Ney kurê Key Qubad bûye mîr. Piştre neviyê wî yê bi navê Key Xusroyê kurê Siyawişê kurê Key Kawis bi fermana kalikê xwe bûye mîr; lê piştî demekê dev ji keyîtiyê berdaye. Piştî wî Key Luhrespê birayê Key Kawis bûye mîr, li ser textekî zêrîn ê bi gewheran xemilandî rûniştiye, bajarê Belxê yê li Xoresanê daye avakirin û ji bo şerê tirkan lê rûniştiye, Buxtinesr kiriye cîgirê xwe û miriye. Piştî wî Key Pişthesp bûye mîr, bajarê Nesa ava kiriye, di heyama wî de Zerdeştê xwediyê Avestayê derketiye; Key Pişthespî ayîna zerdeştî pejirandiye, li çiyayê Tamîzer mijûlî xwendina Avestayê bûye û paşê winda bûye. Piştî wî, Erdeşîr Behmenê kurê Îsfendiyarê kurê Key Pişthesp bûye mîr; wateya navê wî 'niyetpaqij' e, navê wî yê bi ibranî <Kûriş> e, wî serweriya heft iqlîman (parzemînan) kiriye û Beytilmeqdis ji nû ve jeniye ku Buxtinesr ew hilweşandibû. Piştî wî, Darayê kurê Erdeşîr bûye mîr û bi Skenderê kurê Fîlîps re şer kiriye, di wî şerî de têk çûye û di encamê de Dewleta Keyanî rûxiyaye. Skender bi bîst rêvebiran ve welatê wî bi rê ve biriye ku ji wan re <mîrên pêkhateyan> tê gotin. Piştî ku keyaniyan bi qasî 500 salî serwerî kiriye, dewleta wan jî rûxiyaye û Eşxanî hatine ser desthilatdariyê." Li vê derê divê bê gotin ku Dînewerî derbarê şerê di navbera Darayê aryayî û Skenderê makedonî de zanyariyeke hêjayî lêkolînê tomar dike; li gorî zanyariyên wî Skender kurê Darayî ye û bi xwe jî dibêje ku romayî vê yekê nepejirînin jî, lê belê rastî wisan e. Dînewerî çîrok an jî dîroka vê birakujiyê wiha vediguhêze: "Gava ku Darayê kurê Behmenî bû şah, ji bo dagirkirina welatê romiyan êrişek amade kir; artêşa xwe meşande nava xaka romiyan û qeyserê Romayê Fîlîpos jî bi artêşa xwe derkete pêşberî wî. Her du alî gihiştin hev û bi hev re şer kirin; Dara di vî şerî de bi ser ket û bac li ser romayiyan sepand. Li gorî peymanê divê qeyserê Romayê salane bi qasî sed hezar hêkên zêrîn bac bida Aryayê ku her hekek bi qasî 40 misqalî giran bûya. Her wiha keça Fîlîpos jî li xwe kebîn kir û digel jina xwe ya nû vegeriya Aryayê. Gelê Arî îdia dike ku Skender ne kurê Fîlîpos, lê kurê keça wî ye; bavê wî Darayê kurê Behmenî ye û bûyerê wiha vedibêjin: Darayê kurê Behmenî êrişî welatê Romayê kir, romayî têk birin û bi mercê bacdayînê peyman bi Fîlîpos re girêda; her wiha keça wî li xwe mar kir, digel jina xwe vegeriya Aryayê, lê bêhneke pir kirêt ji keça Fîlîposî dihat ku Darayî hez nekir pê re binive. Lewre ferman da dadika jinên xwe ku vê bêhna kirêt çareser bike. Dadika jinên wî bi rehekeke ku navê wê <sender> e bûka nû derman kir, piştî ku bêhna wê bi wî giyayî hinekî xweş bû ew şande paşila Darayî. Dara di wê şeva hevşabûnê de bi bêhna senderê ya giran hesiya û got <ales sender> ku di zimanê aryayî de tê wateya <bêhna senderê çiqasî tûj e>; her çiqas bi jina xwe re nivistibe û wê şevê ew ducanî kiribe jî, ji ber wê bêhnê careke din neketiye paşila jinê û ew li bavê wî Fîlîposî vegerandiye. Îcar jina wî ya ducanî li cem bavê xwe Fîlîposî welidiye zarokekî kurîn; diya kurikî ew peyva yekane ya ku wê şevê ji devê mêrê xwe bihîstibû, li kurê xwe kir û navê wî bû Alesender ku ji wî giyadermanî wergirtibû.

Skender kurekî hişmend û mirovekî jîr bû; di bin parastina Fîlîposî de mezin bû û bi cidiyet û kargêriya xwe bala kalikê xwe Fîlîposî kişande ser xwe. Lewre Fîlîposî ew peywirdar kir û wekî cihnişînê xwe destnîşan kir; her wiha di ber sekerata mirinê de jî wasêt kir ku piştî mirina wî guh bidin fermanên Skenderî. Gava ku Skender bû qeyserê Romayê, tekane xema wî milk û şahaniya bavê wî bû; ji ber wê yekê bac neda birayê xwe Darayê kurê Darayî, lê birayê wî yê qure êrişî wî kir û Skender jî mecbûr ma ku pê re şer bike. Her çiqas dîroknasên romayî bibêjin ku Skender kurê bavê xwe Fîlîposî ye, ji nijada bavê xwe ye û cîgirê rastîn ê bavê xwe ye jî, zanyariyeke wisan jî heye." Bi rastî ev mijar jî hêjayî lêkolîneke kûr e; ji ber ku Dînewerî (820-896) dîroka kurdan û şahên Aryayê baş dizane, pirtûkeke wî ya bi navê "Ensab'ul-Ekrad/Nesebên Kurdan" heye ku niha winda ye, her wisan lêkolînerekî gelekî jîr û zanayekî ansîklopedîk e. Bi rastî jî hinek zanyariyên ku wî di sedsala nehan de dane, di sedsala 14an de hatine vedîtin û sedsala 19an de li ingilîzî hatine wergerandin. Wekî mînak "Karnamagê Erdeşîrê Pabegan" dibêje ku "Sasan şubanê Pabag bûd ûd hemwar abag gospandan bûd ûd ez tohmegê Darayê Darayan bûd ûd ender duşxwadayîhê Aleksander o wirêg ûd nîhan-rawişnîh êstad ûd abag kurdan şubanan reft./Sasan şivanê Pabegî bû, û hertim ligel pêz bû, û ji tovê (tuxim, nifş, nijada) Darayê Darayan bû, û ji ber dijxwedayiya (zordestî, sitemkariya) Aleksanderî reviyabû, xwe veşartibû, û xwe sipartibû şivanên kurd."; lê belê Ebû Henîfe hê di sedsala 9an de dibêje ku: "Gava şahên pêkhateyan (eşkanî) bi qasî 266 salî serwerî kir, Erdeşîrê kurê Babekê kurê Sasanê Biçûk ê kurê Fafekê (Papeg) kurê Mihrîsê kurê Sasanê Mezin ê kurê Behmenê kurê Şah Îsfendiyarê kurê Pişthesp li bajarê xwe Îstexrê xuya bû... Erdeşîrî ji Ferxanê kurê Erdewan ê şahê dawîn ê El-Cibalê re (di dîroka ereban de peyva El-Cibal hertim Kurdistanê nîşan dide) nameyek şand û jê xwest ku bikeve bin fermana wî; dema ku nameya wî gihişte ber destê Ferxanî, hêrsa wî rabû û ji qasidên Erdeşîrî re got: Peh peh, kurê Sasanê şivan derketiye çi meqameke bilind ku nameyan jî dişîne!" Ji aliyekî din ve, du mijar hene ku angaşta aryayiyan xurt dike: 1. Skender heta mirina xwe venegeriyaye Romayê, rêveberiya Aryayê kiriye û li ser erdê Şahaniya Keyanî miriye. 2. Piştî ku hîn dibe Dara bi minexetî ji aliyê merivên xwe ve hatiye kuştin, bikujên wî digire û wan dikuje.

Wekî ku ji zanyariyên bihurî diyar e, çavkaniyên erebî rasterast nabêjin ku Xanedana Pîşdadî kurd e; lê wergera Şahnameyê ya bi tirkiya osmanî bi eşkeretî dibêje ku "Ferîdûnê Kurd" û kurdbûna wî gelek caran dubare dike. Li vê derê, divê em derbasî çavkaniyeke kurdên belûç bibin û qala kurdbûna Xanedana Keyanî bikin. Axwend Mihemed Salih di berhema xwe ya bi navê "Kurdgalnamek"ê de diyar dike ku paşayê Tûranê Efrasyab ji nifşa Tûrê kurê Cemşîd e û ji ber vê nêzikatî û eqrebatiya bi Pîşdadiyan re xwe fermanrewa û mîratgirê eslî yê selteneta Mad û Parsê dizanibûye. Lewre paşatiya Key Qubadî qebûl nekiriye, li ser textê serweriyê şer di navbera Tûran û Mad-Parsê de derketiye û di dawiyê de hêzên Efrasyabî li hemberî hêzên Mad-Parsê şikiyane. Di şikandina hêzên tûraniyan de rola kurdên biraxoyî, adirganî, mamilî û kirmanî gelekî girîng e. Mihemed Salihê Belûç damezrandina Dewleta Madê wiha tomar kiriye: "Di sedsala 9an a BZ de dema ku paşayê dawîn ê Xanedana Pîşdadî Girşespê kurê Ûştabê kurê Tahmaspê kurê Menûçehrê kurê Îrecê kurê Ferîdûnê kurê Epteyanê kurê Cemşîd miriye paşayên Asûriyan êriş anîne ser xaka Mad û Parsê. Lewre kurdên Mad neçar mane ku dewleteke serbixwe damezirînin û xwe ji êrişên asûriyan biparêzin. Ji bo vê mebestê serek û serdarên Mada Mezin û Mada Biçûk, kurdên Pars, Gîl, Deylem û Hezareyê li hev civiyane û şêwirîne; di dawiyê de serekekî kurdên Mad ê bi navê Key Qubadê Kurd ku di warê erdnîgarî, zanist, dadperwerî û karzaniyê de bêhevta bûye wekî fermanrewa hatiye hilbijartin."(r. 43) Kurdgalnamek derbarê navê Madiyan de agehiyeke gelekî girîng dide: "Dîroknivîsan devera Madistanê bi navê <Keyan> û xanedana Madiyan jî bi <Keyanî> dane nasîn." (r. 115)

Li vir xuya ye ku gotinên Qelqeşendî, Kurdgalnamek û Şahnameyê hev digirin û hev piştrast dikin ku Key Qubad ji nifşa Ferîdûnî ye; ji xwe Qelqeşendiyî digot ku “Piştre Ferasiyabê kurê Tûc (Perasiyab=Afrasiyabê kurê Tûr) bi zordestî derkete ser têxt, welat wêran kir û xerabiyên nedîtî pêk anîn; lê ji neviyên Menûçehrî, kesekî bi navê Zûyê kurê Tahmasp artêşa Ferasiyabî şikand, dîsa welat gihande asteke baş, çemê Zêyê kir du beşan û li kêleka çêm bajarvanî da destpêkirin.”; her wiha digot ku “Mîrê keyaniyan ê yekem ê piştî Girşespê pîşdadî, Key Qubadê kurê Zû ye û wekî bavê xwe bi dadwerî serwerî kiriye.”

Divê bê gotin ku Meqdisî (m. 355 k.) derbarê nifşa eşkanî û sasaniyan de bê şik û guman dibêje ku “Piştî Skenderî, welatê Aryayê bi qasî 266 salan û li gorî salixekê jî bi qasî 400 salî li gorî pergala yûnanî hate rêvebirin; piştre aryayiyan rêz û giramî li Eşkê kurê Darayî nîşan da û şahtiya wî nas kir. Ji Mûsilê bigire heta Rey û Espehanê di bin serweriya wî de bûn.”“Şahê pêşîn ê sasaniyan Erdeşîrê kurê Babekê kurê Sasanê kurê Erdeşîr Behmenî ye”... Wekî ku ji zanyariyên xuya dike, Meqdisî derbarê heyama serdestiya eşkaniyan de du salixan dide û mêjûya serweriya wan diyar dike; lê derbarê bav û kalên wan de şik û gumanê nabîne û ji bo her duyan jî rasterast dibêje ku “ew neviyê Darayî ye” yan jî “ew neviyê Behmenî ye”. Îcar mirov dikare ji zanyariyên erebî piştrast bibe ku her çar serdemên şahaniyên Aryayê (pîşdadî, keyanî, eşkanî û sasanî) ji heman binemalê ne, ango ji binemala Ferîdûnî ne.

Encam: Li ber ronahiya Kurdgalnamekê nirxandina zanyariyên çîrokî û dîrokî yên Şahnameyê

Li gorî zanyariyên hevçerx navê Medan sala 835an a BZ cara yekem di nivîsareke qralê aşûrî Şalmaneser III de derbas dibe. Îcar Kurdgalnamek derbarê navê Madiyan de agehiyeke gelekî girîng û nêzikî vê mêjûyê dide; her wiha pêvajoya damezrandina Şahaniya Keyanî bi berfirehî vedibêje: “Dîroknivîsan devera Madistanê bi navê ‘Keyan’ û xanedana Madiyan jî bi ‘Keyanî’ dane nasîn.” (r. 115) “Dema ku paşayê dawîn ê Xanedana Pîşdadî Girşesp mir, welatê Mad û Parsê duçarî rewşeke tevlihev û bêhêziyê bû; ev rewş bû sedema sergêjî û tirsa serekên hozên Mad û Parsê. Di encamê de hemû serek, serdar û rihspî li hev civiyan; piştî rawêjkariyeke komekî, biryarek ji civînê derket ku Key Qubadê kurê Mad derkeve ser textê Girşespî. Bi vî awayî Key Qubad sala 853an a BZ derkete ser textê Mad û Parsê. Wê heyamê kurdên biraxoyî tîreyeke hêzdar û azad a kurdan dihatin hesibandin. Mîr Kîkan serekê mezin ê kurdên biraxoyî û hevpeymanê Key Qubad paşayê Madê bû; her wiha serokatî li van heft tîreyên kurd dikir ku navên serokên wan wiha ne: Mîr Goran Goranî, Mîr Zaxo Sarûnî (an jî Soranî), Mîr Mihran Xuzdarî, Mîr Mişkan Mişkanî, Mîr Ermîl Ermîlî, Mîr Bolan Bolanî û Mîr Lerzîn Girîşkanî.” (r. 53)

Bi berawirdkirina vegotinên Şahnameyê, zanyariyên dîrokî yên erebî û belgeyên hevçerx derdikeve holê ku şahaniyên Aryaya qedîm ji aliyê binemalekê ve hatine damezirandin û rêvebirin; çarçoveya qanûnî ya kesayeta şahan mersûmeke qedîm a aryayî ye û divê wekî rê û resmeke siyasetmedariya aryayî ya qedîm bê xwendin. Her wiha gava mirov dest bi xwendina wergera osmanî ya Şahnameya Firdewsiyî dike, îcar çarçoveya qanûnî ya kesayeta şahên kurdnijad derdikeve pêşberî mirovî; lewre teksta Şahnameyê vedigere mersûmeke qedîm a kurdistanî û divê wekî rê û resmeke siyasetmedariya kurdistanî ya qedîm bê xwendin. Wekî mînak, Key Xusroyê ku nifş û nijada xwe dispêre Pîşdadiyên kurd: “gote zanayên ayînî yên navdar: <Dil û giyanê we bi ayîn û dadweriyê ve ava bibe! Min dergehê koçk û seraya vî tirkê bêbext bexişande we. Hewl bidin ku bila di vê cîhana gewre de tîrêjên tavê jî li seraya Efrasyabî nedin. Her wiha ez naxwazim bila deng û awaza jinên wan ên sergirtî derkeve derve.> Bi vê fermanê nobedar li ber seraya Efrasyabî hatin bicihkirin ku ji siwar-peya û hatî-çûyiyên bajêr bê parastin; her wiha got ku <ji xizm û eqrebayên wî re bibêjin ku li gorî ayîna şehriyaran tu kes dê neyê tengezarkirin.>” (Şahname, r. 15)

Çavkanî:

Axwend Mihemed Salih Zengene Belûç (2019), Kurdgalnamek, Weşanên Azad: Mersîn.

Ebû Henîfe Ed-Dînewerî (1960), El-Exbar’ut-Tiwal, Daru Ihya’il-Kutub’il-’Erebî: Qahire.

Ebûbekr Ebdulqadir b. Ebdurrehman El-Curcanî (2009), Derc’ud-Durer fî Tefsîr’il-Ayi we’s-Suwer, Dar’ul-Fikr: Eman-Urdin.

Ehmed b. Elî El-Qelqeşendî (2012), Subh’ul-E’şa fî Sina’et’il-Inşa, Dar’ul-Kutub’il-’Ilmiyyeh: Beyrût, ISBN13: 978-2-7451-1021-3.

El-Mutahhar b. Tahir El-Meqdisî (2013), El-Bedu we’t-Tarîx, Mektebet’us-Seqafet’ud-Dîniyyeh: Port Seîd, ISBN: 9773412105

Malpera Îranîkayê (https://iranicaonline.org)

Malpera Îslamportê (http://islamport.com)

Malpera Wîkîpediyayê (https://en.wikipedia.org)

Mustafa Kugu (2017), 15 Yuzyila Ait Şehname Çevirisi (giriş-metin-sozluk), şêwirmendê tezê: Dr. M. Levent Yener, Zanîngeha Çanakkaleyê, Enstîtuya Zanistên Civakî, Beşa Ziman û Wêjeya Tirkî, hejmara tezê: 10149637

Şihabuddîn Muhammed b. Abdillah El-Huseynî El-Alûsî (1415 k.), Ruh’ul-Me’anî fî Tefsîr’il-Quran’il-’Ezîm, we’s-Seb’il-Mesanî, Dar’ul-Kutub’il-’Ilmiyyeh: Beyrût

TDV Islam Ansiklopedisi.

DENGBÊJ EVDİREHÎMÊ MÛŞÎ

MÊVAN

Ax werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo, lo
Lo werî mêvan...
Lo lo kuro delalîko dîno
Tu werî mala bavê min rebenê bi mêvanî
Ezê di nav xas baxçe da
Ramûsanan bidim te
Ji cotê sorgul lêvan...
Wezê ji kedera dilê xwe ra
Ji êvarê hetanî mîla ber şefeqê
Te di nav taxima sîng û berê xwe da bihewînim,
Lo bikim mêvan...
Ezê destê delalîkê dilê xwe bidim
Ser cotê zer bostanên mîna sêvan...
Lo lo kuro malxirabo çima tu nizanî!
Ji nav taxima sîng berê min zerîyê tê
Bêhna pîltan û sorgul û rîhan...
Ax werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo, lo
Lo werî mêvan...
Lo lo berxo çima tu nizanî!
Ramûsana min zerîyê
Ji te ra şêrîntir e
Ji gezo, hingiv û sêvan.!

Ax werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo, lo
Lo werî mêvan...
Delal heyran nava dilê min zerîyê
Tije bûye berxo ji kul û kovan...
Xwedê qebûl neke
Çawa ez histûxwar mame!
Di nav vî qewmê stemkarê mîna hovan
Were bi destê min zerîyê bigre birevîne
Bavêje pişt çiyakî asê
An jî bavêje ber bextê 'egît û mêrxas û mêran
Malxirabo êdî bes e!
Were min rizgar ke
Ji vê evîna dilşewat ,
Ji van derd û kulê giran!..
Ax werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo
Werî lo lo, lo
Lo werî mêvan...
Lo lo berxo çima tu nizanî?
Ramûsana min zerîyê
Ji te ra şêrîntir e
Ji gezo, hingiv û sêvan.!

www.arsivakurd.org

Siraç Oğuz

HÎNDİSTAN Û GANDÎ, KURDİSTAN Û BARZANÎ



Di dîrokê da hinek nav an ji malbat hene ku dema qala wan were kirin, milet û dewleta wan, an jî qala milet û dewleta wan were kirin, ew tên bîra mirovan. Gelek mîsal hene, lê ez dixwazim tenê qala du malbat û du milet, an jî du dewletan bikim.

Hîndistan û Gandi…

Kurdistan û Barzanî…

Li kîjan goşeyê dinê dibe bila bibe, Hîndîstan were gotin Gandî, Gandî were gotin jî Hîndistan tê bîra mirovan. Hîndistan û Gandî, herdu peyv an jî herdu nav bi hevra girêdayîne û tu car ji hev nayên qetandin.

Kurdistan û Barzanî jî bi hev ra girêdayîne, ew jî ji hev nayên qetandin. Kurdistan were gotin Barzanî, Barzanî were gotin jî Kurd û Kurdistan tê bîra mirovan.

Hinduyek Gandî kuşt, lê heta ku Hind û Hîndistan hebe, hemû dinya bibe yek jî nikarin navê Gandi ji pêş an jî ji paş navê Hîdistanê rakin.

Barzanî weke Gandi dewletek ji Kurdan ra ava nekir û ji alî Kurdekî da jî nehat kuştin. Lê Barzanî jî ruh û fikrîyata dewletbûnê da hemû Kurdan, ha li Başûr û Bakûr, ha li Rojava û Rojhilat…

Sedem vê yekê ye ku hinek dixwazin bi destê Kurdeki, an jî hinek Kurdan navê Barzanî bikujin, bikujin ku Kurd û Kurdistan jî were kuştin.

Min nêzîka salek berê bi navê „Malbata Barzanî û rexneyên pûç û vala“ nivîsek nivîsandibû.

https://navkurd.net/2016/07/malbata-barzani-u-rexneyen-puc-u-vala/

Kesên ku Barzanî 50 sal, deh sal, salek berê bi çi rengî rexne dikirin, îro dîsa jî bi wî rengî rexne dikin, dixwazin pêşî li referandûm û serxwebûna Kurdistanê bigrin.

Ez wê nivîsê çareke din dîsa parve dikim û dibêjim, bi rexneyên pûç û vala navê Barzanî erzan nabe…

www.arsivakurd.org

Çend dem e, hinek di medyaya sosyal da gengeşiyê pir qirêj didomînin. Kesên dipeyivin, kesên dinivîsin, bi zanayî, an jî bi nezanî li ser rûmetî û bê rûmetîyê rexneyên xwe dikin. Piraniya rexneyên wan, li ser referandûma ji bo serxwebûna Kurdistana Başûr e.



ema ku mirov li van rexneyan dinêre, di wan da bêaqilîyeke sivik dibîne. Tu dibêjî qey bêaqilî para Kurda ye. Bê guman na! Lê Kurd xwe bixwe bê aqil tevdigerin. Sedemê vê bêaqilîyê jî, ji nêrînên îdeolojîk û ji alîgiriya hîzban pêk tên.

Wek hemû gelên dinê, hemû Kurd jî wek hev nafikirin, ev yek jî tiştekî normale û tiştek asayî ye.
Berî her tiştî, kî çi difikire bila wekî bîr û bawerîya xwe bifikire. Lê bila tu kes li tu kesî, zext û heqaretê meke. Di navbera, partî û rêxistinê Kurdên bakûr da hergav pirsgirêkên nebaş derdikevin holê. Xwedê giravî bi salane li Bakûr doza Kurda dikin. Mixabin ji doza Kurdan zêdetir, ji bo daw û doza miletên biyanî û dagirkerên xwe kar û xebatê dikin. Ji miletê xwe zidetir, dewletên dagirker û miletên wan ra, dostî û hevaltîyê dikin.

www.arsivakurd.org

Sedemê perîşantiya Kurdên Bakûr, îro jî ji bêaqiltiya wan tê. Revêbirên partîyan û kesên serbixwe, hemû kar û barên xwe berdane û li pê pirsgirêkê Kurdistana Başûr ketine. Helbet heqê wan jî heye ku, ew jî dikarin li ser rewşa Başûr gengeşiyan bikin. Lê gerek hemû Kurd bi biratî û bi hestên welatperwerîyê li ser van bûyeran bisekinin. Mixabin mirov dibîne ku, hin kes bi çavên sîyasî dinêrin, hin kes ji bo reklam û ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî, hin kes jî bi çavên neyartîyê li Başûr û partiyên Başûr, bi taybetî li PDK'ê û li Barzanîyan dinêrin. Kesên ku bi çavên biratîyê û bi hestên Kurdayetîyê dinêrin, mixabin hêjmara wan jî gelek kêmin.



Partîyên Kurdên Bakûr, gere berî her tiştî giraniyên xwe bidin ser pirsgirekên sîyasî û pirsgirekên nav xwe û zidetir ji bo xilasbûna Kurdên Bakûr bixebitin. Ji bo çareseriya pirsgirêkên Kurdên Bakûr, bi tekoşerî xwe bidin pêş. Ji Başûr zidetir, gengeşîkirina li ser pirsgirêkên Bakûr û hewldanên partîyên Bakûr ji bo wan bêtir pêwîst e.

Lê hemûyan kar û barê xwe dane alîkî, ji sibê heta êvarê mijara wan Başûrê Kurdistanê, PDK û Barzanî ye.

www.arsivakurd.org

Ji nêrîn û rexneyên bi biratî û Kurdewarî re tu kes tiştekî nabêje. Ev mafê hemû kurdane û her kurdek dikare di vê çarçoveyê da li ser Başûr jî, li ser perçeyên din jî, nêrîn û pêşnîyarên xwe bêje.
Lê hinek kesên ku xwe ronakbîr dibînin û hinek partîyên Bakûr ê bê rûmet, ji dagirkerên kurdan zêdetir, dijbertîya PDK'ê û Malbata Barzanîyan dikin.
Li Kurdistanê gelek malbatên mezin û welatperwer hene. Ji wan yek jî malbata Barzanî ye. Ji sed salî zidetire ku Malbata Barzanî, bi welatperwerî û bi tekoşerîya xwe va, daw û doza Kurdistanê didomîne û di vî warî da malbatekî yekemîn e. Malbata Barzanî di qada şer da hergav pêşengî li gelê Kurd kiriye û hejî bi canfidayî vê yekê dikin. Di vî rîya pîroz da bi deh hezaran şehîd û qazî dane. Ji bo doza miletê Kurd qasî ku Malbata Barzanî bedel dane, tu malbatekekî din nedaye.

Malbata Barzanî, malbatekî welatperwer û eşîretek mezin û bi rûmet e, rola wî ya di nav civatê da jî, gor vê yekê mezin û giran e..
Ew partî û kesên bê rûmet dibêjin, „çima malbata Barzani, weke malbateke sereke di nav rêveberîya Kurdistanê da cîh digre.“

Taybetîya malbata Barzanîyan ewe ku, di her demê da ew ji cîh û warên xwe û ji erdê Kurdistanê dûr neketin. Di demên komkujî û qetlîmanda jî li ser erdê xwe man.

Di dîroka mirovatîyê da jî tê xuyakirin ku, kî pêşengiya milletê xwe bike û bi ser keve, bê nebê, rêvebirîya miletê xwe jî ewê bike.

Kurdên Bakûr an jî kesên ji perçeyên din, bixwazin, nexwazin, îro di rêveberiya Kurdistana Başûr da, Malbata Barzanî xwedî rolekî mezinê û hergav jî wê wusa be.

Ji ber ku, di dîroka Kurdan da Barzanîyan bedelê mezin û giran dane. Di warê civakî, sîyasî, leşkerî û olî da hergav pêşengîya milletê xwe kirine, hejî dikin. Duh ji bo xilasbûna Gelê Kurd dixebitîn, îro jî ji bo serxwebûna Kurdistanê dixebitin. Giranî û rûmetîya wan jî, ji vê yekê tê.
Ji Şêx Ahmed, Melle Mustafa Barzani û Îdrîs Barzani, ji zaroktiya xwe heta roja îro, pêşmregekî wek Serokê Herema Kurdistanê Mesud Barzani, pêşeng û serokên bi rûmet, kêm derketine.

www.arsivakurd.org

Ew kesên ku îro neyartiya malbata Barzanîyan dikin, ji gelek tiştên dirokî û ji civat û netewa Kurdan dûr in. Ne daxwazên wan daxwazên Kurdistanîne, ne jî kirin û kiryarên wan. Ew di her warî da di xizmeta dewletên dagirker danê. Pirranîya wan kesan, di dewletin dagirker da fermanberîyê (memur) dikin. Îro jî yan wî karê xwe didomînin, an jî ji dewletên dagirker bertîl (maaş) digrin.

Bêgûman her Kurdek dikare, hemû partî û rexistinên Kurd rexne bike. Bê şik mafê herkesî heye ku kêmasîyên partîyên Kurd rexne bike. Ji wan partiyan yekjî, KDP ye. Ji rexneyên di warê pirsgirêkên sîyasi û çareseriya astengên rojane ra, erê. Lê rexneyên erzan û bê bingeh, ji alî tu kesî va nayê qebûlkirin....



www.arsivakurd.org

ÇAYAN OKUDUCİ

Parsek

behna çemek dûr û dirêj jê dihat
gol û çêl di her kenên wê de,
dihewiyan di hinarikên wê de rûyên jê mayî
ji kirasek rengîn rengek lixwe bada
û bi qelema şîngewr
dengê etarek xirxote xêz dikir
ji qemçîka teyrek hêviyek kişand
bi ber xwe vê
xwedê zane pişt lê vekirî

pisîkek dirane xwe bi goşt tûj dike
bi bîr dixe sancoyek asoyî
ka ezê seriyê sê qiloç ji kîjan diwar û destanê bidizim

dinyeyek temen kin hêma dibû bi siya wê
berdela hezkirinê bû hawar
xwedê zane birîn lê vekirî

êdî kes hinda nabe li dinê ji parsekek pê va
li pey tasek ava gemar
ewe dinya bibe parsekek an parsekek

kê dikare dilê bilbilan bikelîne ji te pê va
kî zane dengê bilbilan rake ser lingan

ji bilî te
kê dî dizê evînan di paşila xwe de
eşqê veşartiye

ji me kîjan bû li dû xwe geremola hesretê hişt
kî bû bajaran da ber gul û gulleyan
li ser singa te ya şermok çend mirar
difrin bi ber axa zua û şewitî

xwedê zana pişt lê vekirî

www.arsivakurd.org

REMEZAN BAKUR

SİMAYÎLÊ SAYDALÎ



Çû kesê bi malê dinê, nav nemaye li dinê, ji xeynî qarûnê cihû, lê kesên bi kiryarên xwe yên qenc û li dijî neqenca sekinî nav mane li dinê, dengbêja stran pê gotine û serpêhatîyên wan nifş bi nifş hatîne gotin.

Di welatê me de, yên nav mane li dinê, ew kes in yên bi zanyarî û zanistîya xwe yan jî bi hewlên xwe yên li dijî neyar, neqencan û dagirker sekinî ne. Simayîlê Seydalî yek ji wan kesan bû yê neqencî û bindestî qebûl nekirî, heyfa xwe ji kesî re ne hêlayî û bûyî bela û milteqayê serê neqenc û neyaran. Jîyê xwe di ber şere û kiryarên xiret û xasyeta xwe da borandî, warê xwe bi destê neyar û neqencan daye korkirî.

Qesra wi li gundê Lotsnisê li kêleka navçeya Elki bû, Serpêhatîyên wan di navbera salên 1935 û 1950 da bûye, halxweş û kedxûda bûn, merd û nandeh bûn, xêrxwaz û mala mêhvanan bûn.

www.arsivakurd.org

Demekê tehsîldarên dewletê tên nav kerîyê wan yê pez û bacê jê dixwazin, di navbera tehsildar û Simayîlê seydalî da cedel derdikeve, Simayîl dibêje ez çû bacê nadim, tehsîldar dibêje ez li ser navê dewletê hatîme û tû yê bi nêçarî bacê bidî, Simayîl dibêje ne dewleta te û ne jî bacdanê qebûl nakim, piştî doma cedelê Simayîl şimaqekê li tehsildar dixe û wî ji nav kerîyê pez derdixe.
Piştî qaymiqam û fermandarê navçeyê vê buyerê dibihîzin, kombûnekê dikin û biryarê didin, nerazîbûna Simayîl wekî li dijî dewletê derketin û qebûlnemirina dewletê dinirxînin, dibêjin em ê serê Simayîl li ber dewletê biçemînin, vêca bi lêşkeran li pey Simayîl digerin .
Qaymiqam û fermandarê navçeyê bi hejmareke zêde ya lêşkeran bi ser qesrê de digirin û Simayîl desteser dikin û dibene navçeyê, azar û îşkenceyên giran lê dikin , heta li ser stirîyên gînî û qîvara gêra stiryan pê dikin, Simayîl şevekê ji nav destên wan xwe xilas dike, piştî xwe xilaskirî, sê mehan, lûqmanên li nav xelkê pîyên wî derman dikin, ji ber stirîyên gînî û qîvara pîyên wi werimî bûn û edabê girtibûn, piştî pîyên wî sax bûn vêca kete nav hewl û bizavên heyfa xwe û hilînanê, şerê wî û rayedarên dewletê dest pê dike.
Simayîlê Seydalî pê hesîya qaymikamê navçeyê dê di rêya zozanan re here Colemêrgê, çû alîyê zozana di navbera navçeya Elkî û Colemêrgê da, rê li qaymiqamê navçeyê girt, qaymeqam pê hisya û bi paş de revî, jina qaymiqam jineke ji êşîretên Ertoşîya bû, qaymiqam jina xwe ji ser rê nevegêra, tor û adetên kurda dizanîn, dizanî kurd destdirêjîyê bi jinan re nakin, jina naşelînin û dil nagirin, ji ber wê jina qaymikam ne vegerya û ber bi Colemêrgê vê çû, hevalên Simayîl gotin jina qaymikam diçe û tiştên bi qîmet û biha bi xwere birin, Simayîl got em ne hatine jina bişelînin û kiryaran bi jinan re bikin, ev tiş cihê şermizarî û serşorîyê ye.
Piştî vê kiryarê werzê payîzê Simayîl û birayên xwe kerîyê pezê xwe birine deşta herêma dasinîya jêr.

Werzê biharê ji deştê vegerîyane ser gundê xwe û qesra xwe, xelk li dora wan kombûn, gotine Simayîl nemîne li ser qesrê, lêşker rehetîyê nade we û xelkê gund. jiber ewlehîya gûndîyên xwe rabûn berê xwe dane zozana Fereşînê cihekî bi navê Şîvkûrê. Hindek kesan şikayeta wan kir, leşkerekî bi hejmareke zêde çûne ser Şîvkûré Simayilê Seydalî û her dû birayên wi ne li malê bûn, demê berbangê şikefta malbat lê ji bo heyamekê nîştecih bûyî, bi çekên makîneyên giran gulebaran kirin, bavê Simayîl li ber kûçikê agir bû, birîndar bû kete ser agir, bi şewatê hate kûştin, birayê wî yê biçûk û kurê wî yê hêj zarok ketine ber barana gulleyan, ew qasî gule bi jina wî ya bi hemle ketibûn pêçîya zarokê di kêleka dayîka wi re derketibû û ranê jina wî bi guleya, jê bûbû, ketibû ser singa wê, ji jin, zarok û kalan kesek ne hêlane sax.

Piştî bûyerê Simayîlê Seydalî ji kes û nasên derdora xwe re digot, kesê heyfa xwe ji xelkê re bihêle, bêxiret û bêxeysîyet e, namûs û ar di serê wan da nîne, piştî wê karesata qaymiqam û fermandarê navçeyê anîye serê malbata wi, êdî hedara wî nedihat, dawîyê li Gelîyê Xabûrê kemîn li ber lêşkeran danî, bi dehan lêşker kûştin û çekê wan rakirin birin li Çîyayê Kelhereş heşar dan.

Tîşteke nebûyî û nehatîye bihîstin bû, kesek di bin wan şert û mercên giran yên wê serdemê serî li ber dewletê rake û bi dehan leşkeran bikûje, deng li nav herêmê belav bû, ji ber wê demê sehme dewletê li ser xelkê herêmê gelek giran bû, bi wê mêranîyê sehim kete serê rayedarên dewletê û bû henaseyeke dilveker ji xelkê heremê ra, dema rayedarên dewletê zanî neşên tiştekê bi Simayîl û birayên wî biken, vê carê rayedarên dewletê ketine nav lêhb û fêlebazîyan.
Piştî wê kiryara Simayîl qaymiqamê navçeyê bi qasidan daxwaza hevdîtinê ji Simayîl kir, Simayîl gote dost û nasên xwe bawerî ji romê re nîne lê dîsa ez ê hevdîtinê pê re bikim ka daxwaza wî çiye û dê çi ji min bixwaze.

Hevdîtin li ser pira Gundê Lotsnisê pêk hat, qaymiqam û fermandar hatine Gundê Lotanisê, herdû birayên Simayîl li koxê pişta pirê kozik û çeperên xwe çêkirin û ketine di çeperên xwe da, Simayîl hate Koçê pira ava Lotanisê, dema qaymiqam û wefdeya pê re xûyan xwe da ber koçê pirê û koçê pirê ji xwere kire çeper.
qaymiqam gazî kirê, got em ne hatine şerê te, em hatine lihevhatinê, Simayîl rê dayê, hatin li Koçê pirê silav kirine hevdû û destê hevdû girtinû hejandin, dema li dûv qaymiqam lêşker hatin Simayîl gote qaymiqam bila leşker xwe nêzî min nekin, xwe nêzî min bikin birayên min yên di kozik û çepera de, dê wan bikûjin, qaymiqam got em li ser navê dewletê hatîne, ji ber wê hewce ye em bi rê û resmên fermî tevbigerin, min pêşnîyara te qebûl e lê lêşker li ba me nebin, nabe, ji ber wê divê lêşker bên li dûrî me, li piştme bisekinin, Simayîl pêşnîyara wi qebûl kir leşker hatin li pişt wan sekinîn.

Qaymiqam sê kûrsî û qehwe bi xwe re anîbûn qaymiqam fermandar û Simayîl li ser kûrsîyan rûniştin, qehwe çêkirin û her yekî qehweyek vexwar, dûvra wêneyê Simayîl qaymikam û fermandarê navçeyê li ser kursîka rûniştî û leşker li pişt wan sekinî girtin.
Piştî qehwevexwarinê qaymiqam hate ser mijarê, got Simayîl fermana hevdîtina me ji alîyê walîyê Colemêrgê ve hatîye dayîn, dewlet dixwaze guhdarîya te bike, ka daxwaz û pêşnîyarên te çi ne, wê pêşnîyarên te binirxînin û lihevhatinekê bi te ra bikin, da devlet bizane tû ji bo xwe û xelkê xwe çi dixwazî, pêşnîyarên te çi ne , em ê hindek leşkeran bidin, bi te re bimeşin, tê herî bi walîyê Colemerig re civî û pêşnîyarên xwe jêra bêjî, ew jî wê pêşnîyar û daxwazên te bigehîne ber destê rayedaran, ez bêjim ev lihevhatina te û dewletê dê di xêra te û xelkê herêmê be.

Simayîl bi wê xafletîyê bawer kir û qaneh bû, mezinan gotîye, dewlet kêvrûşkan bi erbanê digire , qaymiqam û fermandar vegeriyane navçeyê, Simayîl seglawîya xwe girt lê siwar bû û bi çek û rextên xwe ve çû navçeyê bi rê û resma hate pêşwazîkirin, roja paştir komek leşker dane rex, ew siwar û lêşker peya berê xwe dane bajarê Colemêrgê.
Dema ew di rê de lêşker ketibûne pey herdû birayên wî, sîxûr li her derê li cihê wan digeriyan, bi cihê wan hisyan, şikayêt li birayên wî hatibû kirin cihê wan hatibû nişandan, leşkera li alîyê zozana feraşînê li kanîtêcirê kemîn li ber wan danîn, ketine kemîna leşkeran, her dû bira kûştin termê wan birin, avêtine ber derîyê mala xwîşka wan.

Dema simayîl bi çek û rextên xwe ve giha Colemêrgê walîyê bajêr ew pêşwazî kir, qedrê wî girt û ew birine navendeke lêşkerî, dema xebera kûştina her dû birayên wî hat, Walî gote Simayîl mizgînîya min li te her dû birayên te hatine kûştin, Simayîl zanî bi direw û lêhbûlîta bêbextî lê hate kirin, ji qehr û kerban kire qêrîn û dest hilîna lê êdî fayde nebû, ketibû tepik û plangêrîya derewker û bêbêxtan, ji her çar alîya gulebaran lê hate kirin, çirayê binemaleke bi xasyet û xîter hate tefandin, warê wan hate korkirin.
Rom e kom e dom e kurd xişîm e.
Keresata li binê mala Simayîlê Seydalî hatîye kirin, bû nifrek di devê xelkê herêmê de

Inşellah mala te bibe mala Simayîlê Seydalî

Bendek ji strana dengbêj rehmetî Tîtan ê Xazî li ser Simayîlê saydalî gotî li jêre.

Were lêêê
Şereka qewimî li çemê kanî têcara şewitî wa bi dar e
Eskerê Emer Paşa giran e axawo girtine her çar sere
Simayîlê Seydalî axawo maqûlê simbêlzer e
Xwedê mala fesadên gewdan xirabike,
çawa tohvê qaçaxên mala Seydalî saydalî qelanin li vê dinyayê
Were lêê were lêê.



www.tarsivokurd.org

SÎNG Û BERÊ YARA GERDEN ZÊRÎN

Êy yara naz û narîn
Tu yî xwedan gerden zêrîn
Şev û rojên min her pîroz in
Li ser wan sîng û berên şîrîn

Ber sed milkê tirk û ereb û ecem
Qurbana yek ramusana te bin
Ax û av û zêr û zîvê wan
Qurbana sîng û berê te bin

Sed kral û şah û siltan
Her yek qurbana şopa piyê te bin
Hezar text û tac û qesr
Qurbana awirek te bin

Parîs û london û new york
Qurbana axa li ber piyê te bin
Hemeros û shakespeare û dante
Qurbana wî zimanê te bin

Li ser sînga te heft roja
Her roj heft cara biçêrim
Bi heft ava çemê bunisra xwe bişom
Lê dîsa wek te spî nabim

Dijlê û ferat in sîng û berê te
Ji wan diherikê tê
Ava jîn û jiyanê
Jê têr divexûm lê dîsa tî me

Şeva ku sîng û berê delala min
Dibe bexçê gul û rihana ji bo min
Namênê kul û derdek li min
Dibê temenek ew şew ji bo min

Sîng û berê wê esmerê
Serxweşkir im, awirên wê qeşmerê
Bi zimanê şêrin dil da ber talanê
Wê esmerê wê qeşmerê talan kirim li ser bênderê

Thama lêvê te wek sêvê gihaye
Thama sîngê te wek şaraba sala ya
Şêwqa rûyê te heyva çardeha ye
Çavête reşin wek şeva ye

Jiyan be ti re xweş e
Bê te ev dil nexweş e
Bi te re zivistan bihar e
Bê te havîn jî li min sar e

Ev çil sale ez dikim qîr û hawar
Geriyam diyar bi diyar, war bi war
Min nedît li gor dilê xwe dost û yar
Bi hêvî û xwezîya nehat bihar

Neçin ji enqere û tehran û bexda nepirsin
Herin ji amedê bipirsin
Ji mehabadê bipirsin min
Ewê ji we re bibêjin armancên min

Her cara ez te dibînim
Kul û birînê çil salî bibîrtênim
Sal bi sal xwezî bi par
Nema ew war û ew bihar

Îro ji deftera jiyanê pelekî nû divekim
Li ser bingeha têkçûyî, serfîrazîyan ava dikim
Perdeyên li pêşiya ronîye radikim
Roj diçirûsê nava dilê min, hişekî nû ava dikim

www.arsivakurd.org

Mela Mihyedîn

NAMEYEK DERENGMAYÎ 5



Ev armanc carna başî û carna jî xirabî ye. Her tişt bi tevgera lingan ve girêdayî ye. Hûn in yê me ber bi xweşîyê ve dibin û dîsa jî hûn in yê me ber bi nexweşîyê ve tînin. Dema rêya me ber yarê dikeve hûn bi kelecan dibin. Hûn li hev dihebilin û ji kelecanîyê dilerizin. Lê dîsa jî li gel hemû kelecanê bi selametî hûn me dighînin ber kezîyên yarê. Bi saya we em xwe dirêjî lêvên hinguvîn dikin û ew lêvên eqîqî ji ava jînê pêşkeşî me dikin. Li gel yarê hûn dibin çar heval û hûn her çar heval dîsa di navbera xwe senkronîzasyonê çê dikin û li gel hev hêdî hêdî ber bi bextewarîyê ve gav diavêjin.

Belê lingên delal, em yekî ji we diavêjin pêş û yê din jî wî dişopîne û dide pêşîya yê din. Bi senkronîzasyon hûn gav diavêjin.

Belê Lingno...

Hûn in yê me ji cihekî ber bi cihekî nû ve dibin.
Hûn in yê me ji bajarekî ber bi bajerekî nû ve dibin.
Hûn in yê me yê ber bi yarê û ber bi dayê ve dibin.
Hûn in yê me ber bi jîyan û ber bi mirinê ve dibin.
Hûn in yê me ber bi xweşî û ber bi nexweşîyê vê dibin.

Belê lingên delal, em yekî ji we diavêjin pêş û yê din jî wî dişopîne û dide pêşîya yê din. Bi senkronîzasyon hûn gav diavêjin. Bi vê senkronîzasyonê meş û gavavêtin derdikeve. Hemû dîrok ji alîyê we ve hatîye nivîsandin. Çi serok bin, çi dîroknas û çi jî leşker...Hemû jî ji bo armanca xwe radibin ser du lingan û ji bo armanca xwe gav diavêjin.

Belê lingên delal... We gelek rê xilas kirine. We gelek kuçe, kolan, tax û qadên bajaran serobino kirine. Ji gundekî we em derbasî gunedekî din kirine. ji bajarekî we em derbasî bajarekî din kirine. Gelek seyran, gelek dawet, gelek govend û gelek dans bi saya serê we derketine holê...

Dema me carekî li tama we nerî êdî me hewkarî em dev ji we berdin. Hûn xweşîya dinayayê ne. Me gava ewil bi tirsonekî avêt û em bi carekî li erdê ketin lê dîsa jî bi saya we em ji erdê rabûn û ber bi dayîk û bavê xwe ve me gavên xwe bi kêfxweşî û bi kelecanî avêt.

www.arsivakurd.org

Dema em nêzî dayîk û bavê xwe bûn me bi carekî xwe diavêt hembêza wan. Wan jî bi kêfxweşî em hembêz dikirin û ser û çavên me radimûsandin.

Dema sal dan pey hev êdî bi rehetî we barê xwe hildigirt. We laşê me wekî dara sipîndarê radikir şipya. Bi saya we lingan em diçûn mektebê û li wir fêrî xwendin û nivîsandinê bûn. Bi saya we em fêrî gelek tiştên din jî bûn.

Dema mekteb qedîya êdî kar û barê jîyanê dest pê kir. We her sibeh em dibirin ber destê serkarên xwînmij. Wan bê wijdanan ne rehetî didan wan û ne jî me. Timî em di xizmeta hinekan de geh bi vî alî û geh bi wî alî de em diçûn dihatin. Heta dema mesaîya kar bigede ev seramonî wisa berdewam dikir.

Dema kar diqedîya jî ji halketî û bi gavên giran em dihatin mala xwe. Me serê xwe dixist nava stargeha xwe û me xwe wekî mirîyekî li ber televîzyonê diêj dikir.

Belê lingên delal... We gelekî zehmetî dîtin. We gelekî ba û bahoz dîtin. We gelekî berf û seqem dîtin. Lê we tu carî em di rê de nehiştin. Hûn herdaîm bi me re û ji bo armanca me tim di xizmetê de bûn.

Hûn nebin nebin em rizî ne. Hûn nebin em mirî ne..



www.arsivakurd.org



ŞÎLAN DOSKÎ

Adar

Meha êkê ji biharê
serê salê li adarê
qeftek nêrgiz ji Behdînan
xemla destê wê nazdarê

Bîst û êkê her adarê
ez mêvanê wê dildarê
şox û şenga Amedî ye
perya canê ji Xezarê

Cejn û aheng rake Alê
torîna gul rû Alalê
ey nesrîna dilê Şêxo
jana rivîn li her alê

Vêxe xetîra Çarçira
ji evîna têkoşera
bûka rojê Kurdistanê
şana dilê bendewara

Pîroz bike vê newrozê
sozdara armanc û dozê
welatê roj û jiyanê
bi sûnd û peyman û sozê


www.arsivakurd.org

ÜMİT TUNÇ

Xwe Li Ser Keskesorê re Biavêjin

Wexta em piçûk bûn, di nav me de hinek kevneşop hebûn ku me nizanibû li ku derê hatine ketine zimanê me. Ez bawerim me zarokan van baweriyan ji mezinên xwe hildidan. Di nav wan de yek jî derheqê “mirov xwe li ser keskesorê re biavêje wê çi bibe” dê bû.

Li bakurê biharan, piştî barandina şilîyê li esman keskesor derdiket. Em zarok bi vê bûyinê mat diman û ji bo keskesorê baş bibînin li malên xwe derdiketin, li pey keskesorê ve diçûn. Jixwe keskesora piştî baranê, qîrçîna ewran û brûska li esman derdiket bi mezinbûn û rengên xwe gelek xweşik bû. Lê xênî vê yekê me bawer dikir ku ger yek xwe li ser keskesorê re biavêje zayendî ya wê biguhere. Ger ku nêr be wê bibe mê, mê be jî wê bibe nêr. Her wiha me li gor vê baweriyê keskesor li zayendîyê re girêdida.
Li gor vê baweriyê jinek xwe li ser keskesorê re biavêje wê bibe mêr. Mêrek xwe li ser keskesorê re biavêje wê bibe jin. Lê me hê wê demê de jî dizanibû ku mirov ne tenê ji jin û mêran pêk tên. Mirovên ne jin û ne jî mêr jî hene. Ji ber ku taybetiyên herdu zayendîyan wan de hene me ji van mirovan re “nêromê” (nêr û mê) digot. Li gor baweriya meya zaroktî yek xwe li ser keskesorê re cara duduyan biavêje ê bibe nêromê.



www.arsivakurdi.org



Dibe ku anha hûn dibêjin ev tişta mîna bi Tirkî zarokên piçûk serî de hew dizanin leyleka ewna anîne tiştekî çîrokî ye. Dibe waha be lê anha em dizanin di nav ên LGBT de sembola zayendî yê keskesor e. Ji ber ku di nav de ji her rengê heye keskesor bûye sembola- li gor tabîra me ya ew çax-nêromêyan. Ew rewş dike mirov vê pirsê bipirse: çima li van herdu mînakan de mirovan li hev cudatir keskesor li zayendîyê re girêdayê?

Ez anha nizanim ew çax ev baweriya keskesorê ku derê re hat kete nav me zarokan. Lê dibe ku me bixwe jî baweriyeke wisa derxistibe. Ji ber ku keskesor glover bû me ev taybetiya wê ji zivirandin ê re girêdida. Li gor vê xwe li ser keskesorê re avîtin li zayendîya xwe zivirandin dihat bawer kirin. Li gor vê baweriyê zayendî û keskesor waha dihatin girêdayîn,

Keskesor:

Mezin e: keskesor hewqas mezine ku dibe ku tiştekî weke zayendîya mirov biguhere.

Efsûnî ye: Em nizanin wexta mirov xwe li ser keskesorê re biavêje çawa û çima zayendîya mirova wê biguhere. Dibê ku efsûnî be lewma.

Glover e: Ji ber ku guhertina zayendîyê di nav gel de wek zivirandinê wate dibîne û zivirandin jî glovertîyê re têkilîye dibe dibe ku wexta mirov xwe li ser keskesorê avêt zayendîya xwe bizivire.

Zayendî:

Efsûnî ye: Mirov nizane (xebera wan ji zanista zayendîyê tinne) zayendîya mirov çawa pêk tê. Anjî bê îrada mirov çê dibe zayendî ji ber vê tiştekî efsûnî ye.

Glovertî: Guherîna wê tê wateya zivirandinê ew jî gloverbûyînê pêk tîne.

Mezin e: Ango mirov nikare biguhere. Ji dest mirovan de nîne.

Her wiha nav van herdu baweriyan de li gor metoda girêdayîna wan cudayî hebe jî girêdayîna keskesor û zayendîyê herduyan de jî hevpişk e.

Ev herdu bawerî an jî fikir cihên cuda û ji hev bê xeber derketine. Ango mirov nikare bêje yekî tesîr daye ya din anjî yek ji yekî derketiye. Li vir de deqa herî girîng ew e ku çawa dibe du cihên li hev cudatir de di grûpên mirovan wek ji hevdu bê xeber keskesorê ji zayendîyê re têkilî dibînin, baweriyekê li ser vê têkiliyê derdixin.

www.arsivakurd.org

DİLBİRÎN DİLO

SENFONÎKA

Rengekî keskesorî xwe li asîmanê xeyalan digire
Heyverojek spî ji bilindahîya gorê xuya dike
Çivîkek zerikîn ji dê dibe
Deşta mirinê li ber min ramedandî
Strana dijminahîyê tê gotin bi zimanê kesên ku dost dibînim
Maleke wêran kirî
Şerekî têkçûyî
Olan didin di kûrahîya zemên de
Dengbêjên qudûmşikestî bi dengê kewên ribat kilamên mêranî dibêjin li ser sînga ewrên reştarî
Evîn tê ji bîr kirin di vê senfonîya zalimane de
Perperok û kulîlk sêwî dimînin
Gul û bilbil dixeyîdin ji baxên helbestan
Romantîzmeke xeyalî û sûnî difûre ji bêhna xeyalperestên onanîst
Êş dimire xwîn dimiçiqe di tamarên kalên yextîyar de
Pîrejin li dawetên xecxecokan stranên dawetan distrên ji şahîyê bêpar
Keştîyên tenêtîyê xwe bera behra dilîstanê dikin
Ayetên jihevqetînê ji nû ve dadikevin ji ba rebbê evînê
Eros di şîna nemiran de ye
Afrodît li meyxana xwînrijan e
Û zeûs
Ax Zeûs
Zeûs jî di xewa mirinê de ye
Xwedawendek ji demên neolîtîk tê xwe bera nava civata min dide û min dike êsîrê horîperîyên bêper û bêbask.



www.aysivakurd.org



LOKMAN POLAT

EVÎNA ROMANTÎK Û TRAJÎK

Di nav edebiyata cîhanê de gelek berhemên edebî hene ku naveroka wan li ser evîna romantîk hatine hunandin. Hem di nav edebiyata klasîk de û hem jî di ya modern de, ji mijara evîna romantîk berhemên nemir hatine nivîsîn.

Evînên romantîk, evînên dilêşîyê ne. Bi derd, kul û keder in. Xemgînî û dilşewatî xwe li ruhê mirov radipêçe. Di evînên romantîk de dram heye, kuştin û xwîn rêtin heye, îronî heye. Kuştinên - cînayetên- evînî heye. Evîndar nagihîjin miradê xwe. Keç yan kur, yan tê kuştin, yan kor û seqet dibe, yan wek Mecnûn dîn dibe.
Evîna romantîk û trajîk ji bûyera Habîl û Kabîl dest pê dike û heta dema me bi şikl û rengên cuda tê. Kurên Adem, Habîl û Kabîl li ser zewaca bi keçika cêwî bi hevûdu dikevin û Kabîl, Habîl dikuje. Kuştina Habîl trajîk e, kuştineke cînayeta evînîyê ye.

Evîna Romeo û Julîet, Mem û Zîn, Ferhad û Şêrîn, Leyla û Mecnûn, Siyabend [Xecê, Kerem Û Eslî û herweha gelekên din, evînên romantîk û trajîk in. Berhemên ku li ser mijara evîna wan hatine nivîsîn hêj jî tên xwendin, bi nirx tên ecibandin. Tiyatro/şano û fîlmên ku li ser wan hatine pêkanîn bi dilxweşî tên temaşekirin.
Evîn çi ye? Belkî hetanî niha tu kesekî tarîfa wê ya rasteqîn nekiriye. Her kes li gor xwe evînê şîrove dike. Lê, li gorî min, evîn; haz/xweşî û xweşhaliya bextîyarîyê ye. Şadbûyîna giyanên, hestên ruhî ye. Di têkilîyên zayendî/cinsî de, heger evîn tunebe, ferqa wê têkilîyê û têkilîya cinsî ya heywanî tune ye. Ji xwe têkilîyên cinsî tişteke xwezayî ye, biyolojîk e, hêlekê mirov ê heywanî ye. Evîn ferqeke girîng û manedar dixe nav têkiliya cinsî a însanan û heywanan.

EDEBIYAT / WÊJE Û EROTÎZM

Civakên ku ji alî şarezayî ve pêşve neketine, paşve mane, ji alî seksê ve jî paşve mane. Têkiliyên seksî di nav civakê de wek şermezarî tê pejirandin. Stranên seksî, çîrok û romanên seksê wek eyip û şerm tête ditin û ji alî mehkemeyên fermî yên dewletên paştemayî ve tê qedexekirin. Gelek romanên ku di nav wan de beşên seksê hene, hatine qedexekirin. Di rojhilata navîn de her tiştê ku têkiliyên wê bi pirsa seksê ve heye, qedexeye. Di dewletên Ereban de û di Îranê de berhemên edebî yên ku behsa seksê têde derbas dibe hemû jî têne qedexekirin.

Li Tirkiyê jî ev qedexebûn heye. Herçiqas Tirkiye xwe wek perçeyek Ewrupî dibîne jî, dîsa berhemên ku têde beşên seksê hebin ji alî mehkemeyên tirkan ve têne qedexekirin. Romana ku nivîskarê navdar Harold Pînter nivîsî bû, dema ku bi Tirkî hate wergerandin û hate weşandinê, cîda ji alî mehkemeyê ve hate qedexekirin û polîs pirtûkê civand, hinek romanên Henry Miller jî hatin qedexekirin.

Di nav civakên paştemayî de têkiliyên vekirî tune ne. Têkiliyên veşartî hene. Di civakên weha de seks jî veşartî ye. Fîlmên seksî qedexene, bi dizî têne temaşekirin. Ji bo ku azadiya seksî tune ye, her tiştên seksê bi dizî dibe. Ew kesên ku bi cesaret û eşkere pirs û pirsgirêkên seksê bînin holê ji alî civakê ve têne aforozkirin. Di dibîstanên Ewropiyan de li ser pirs û pirsgirêkên seksê di dibîstanan de dersên perwerdekirinê hene. Lê li rojhilata navîn ev tişt tabû ne. Mirov ji keçikek Tirk, Kurd, Fars, Ereb re bibêje “Tu rindî, spehîyî, xweşikî” dê hezar tişt bê serê mirov. Dê qirecir derkeve, pevçûn çêbibe, dê mirov lihev bixe. Lê heger mirov ji keçikek Ewrupî re bibêje “Tu rindî, spehîyî, xweşikî” ew dê bibêje “Spas ji bo ku te ez rind, spehî dîtim.”

Çend kesên Kurd, Tirk, Ereb, Fars pirtûkên Freud û yên Desmond Moris xwendine, ez nizanim. Lê di berhemên wan de tê diyarkirin ku “Pirs û problemên seksê pirsên civakî ne, problemên însanî ne.” Ji bo însanan pêwîstiyên seksî pêwîstiyên însanî ne, yên xwezayî ne.



www.arsivakurd.org



Li rojavayê azadiya seksê heye, lê qîmet û rûmeta hunera seksê tune ye. Li rojhilatê seks bi serê xwe hunerek e. Li rojavayê seks haceta xwe valakirinê ye, xwe tetmînkirinê ye. Gelek seksologên rojhilatnas di berhemên xwe de behsa hunera seksê ya gelên rojhilat dikin. Li rojavayê jin wek haceta pornoyê tê dîtin û pirsên seksê bi kar tê anin.

Li rojhilata navîn ava û metodên seksê, teknîka seksê di nav gel de baş nayê zanîn. Bişadbûyîn - sevîşme- pevşabûn û şadimanî bi usula kevnare û bi adetî tê kirin. Di dema şadbûyînê de pirê caran jin orgazm nabe. Ji ber ku di dema şadbûnê de jin aktîf nîn e, li binî pasîf disekine, loma jî tehmeke ji şadbûnê nastîne.

Hinek mêr, jinan wek aletaka, anku haceta leyistikê dibînin. Ji xwe re bi wan re bilîzin û paşê wek çarşevê, wan bavêjin ciheke din. Mêr -helbet ne hemû kes- bi piranî dixwazin bi jineke spehî, rind û xweşik re razin. Mêr wexta ku jineke pir rind dibînin çavên wan bel dibe, li wê jinikê dinêrin. Di seksa bê evînî de şadbûnî tune, tehm tune. Ji bo seksa bişadbûniyê pêwîstiya hestên ruhî heye.

DI EDEBIYATA KURDÎ DE EROTÎZM

Gelo di edebiyata kurdî de rewşa erotîzmê çawan e? Di berhemên kurdî yên edebî de nivîskarên kurd cîh didin sehneyên erotîk û erotîzmê yan na?
Di edebiyata kurdî de kêmaniyeke berbiçav jî ev e ku; di piraniya berhemên edebî de sehneyên erotîk û erotîzm tune ye. Seks tune ye. Hinek nivîskar roman û çîrokên li ser gundan dinivîsin, lê di wan de jî seks û erotîzm tune ye.
Halbukî, jiyana gundiyan, anku gundîtî bê seksê, bê erotîzmê nabe.

www.arsivakurd.org

Seksa herî mezin di şevên şevtariyên gundan de dibe. Di şevbirikên gundiyan de wexta ku çîrokên gelêrî tê qalkirin, di wan çîrokan de seks û erotîzm heye. Hinek kes bi zanîn naxwazin ku seks û erotîzmê têxin nav berhemên edebî. Însan, jiyan bê seksê, bê sahneyên erotîk nabe. Di berhema nemir Mem û Zînê de jî seks û erotîzm heye. Sahneyên erotîk û peyvên seksî hestên mirov geş dike. Di her romanê de dinyayek heye, jiyanek heye. Dinya û jiyana mirovan bê seks derbas dibe? Ji bo zêdebûna nesla însan seks tiştê herî bingehîn yê afirandina însan e. Nivîskarên ronakbîr nikarin li gorî qedexebuna tabuyên seksê xwe bi sînor bikin. Ji bo şikandina tabuyan di serî de divê ew têbikoşin.

Mûrad Ciwan di nivîsa xwe ya bi navê “Di Mem û Zînê de peywendiyên jin û mêran, evîn û erotîzm” ê de dibêje : “Li gora dîtina Xanî, çawa ku merkeza gerdûnê û amaca afirandinê mirov e, cewherê jiyanê jî evîn e; evîn e ku bakutê dide jiyanê; bê evîn jiyan rijî û bêmane ye... Xanî gava ku behsa erotîzmê dike mustehceniya ku em di serê xwe de çêdikin, ew eyba ku li ba me xwe ava dikin, li cem wî nîn e. Ew bi hemî eşkeretiya xwe, teswîra hezkirin û munasebetên navbera her du cinsan dike.” Armanc - Hejmar : 13/14 - Tebax - Îlon - 1996

Ahmedê Xanî sêsed sal berê xwestiye tabûyan bişkîne, eybên di serê xwe de bavêje, lê hêj jî hinek kurd di serê xwe de eyban dihewînin. Loma jî gava di berhemeke edebî de sahneyên seksî yên erotîk dibînin, bi eyb û şerm lê dinêrin. Ji bo wê jî rexneyan li romana min “Kewa Marî - Mêkew” ê digrin. Ji ber ku di romana “Kewa Marî - Mêkew” de seks û erotîzm heye.

Belê, di romana “Kewa Marî - Mêkew” de seks û erotîzm heye. Hebûna vê tiştî ji hinekan re ecêb tê. Rexne digrin -bi devkî, ne bi nivîskî- paşgotinî dikin. Dibêjin çima di romanê de ewqas seks û erotîzm heye?



www.arsivakurd.org



Di berhemên edebî de hebûna sahneyên erotîk û seksî tişteke normal e. Heger ji bo herikandina çîroka romanê seks pêwîst be, divê hebe. Di beşeke romana “Kewa Marî - Mêkew” de behsa tecawizê tê kirin. Tecawiz - bi zorê be jî- bê ewkkirin nayê qalkirin. Di romanan de teferuat girîng e. Dema tu behsa tecawizê bikî divê tu bi teferuat behs bikî ku çawan bi zorê bi keçikê re seks tê kirin, çawan bi çi tewir û bi çi şiklî tecawizê wê dikin.
Di romana “Kewa Marî - Mêkew” de, di mixarê de çar tîmên taybetî bi zorê tecawizê keçikê dikin, ecêb û sosret tînin serê wê. Divê tu bi teferuat wê ecêba nedîtî bidî qalkirin, wisan behsa wê bikî ku, di ruh û canê xwendevanan de hîs bê kirin, divê tûkê mûyê serê xwendevan rabibe, tîk bibe.

Herweha, xort û keçikek dema ku bi hevre şarab vedixwin, ji hevre çarînên Heyyam yên li ser evînê dibêjin û bi hevre eşq dikin, zewq dikin û ev kirinên wan dema bi şêweyeke şehweta edebî bê qalkirin, ev bi xwe edebiyat e.

Ji bo wê jî rexneyên çima di romana “Kewa Marî - Mêkew” de seks û erotîzm heye, rexneyek ne di çî de ye. Rexneyek pûç û vala ye. Rexneyeke ji bîr û zanîna edebî dûr e. Kesên needebîyatnas, yanê ew kesên ku ji edebîyatê fêm nakin rexneyên weha dikin. Lê kesên ku ji edebîyatê baş fêm dikin rexneyên weha -yanê rexneyên ku çima di romanê de sehneyên seks û erotîzmê heye- nakin.

Mirovekî zana ku ji edebîyatê baş fêm dike, got “Kewa Marî romaneke gelek baş e. Ez dikarim bibêjim di nav romanên kurdî de romaneke di radeya bilind de ye.” Ev gotinên vî edebîyatnasî ji bo romana “Kewa Marî - Mêkew” bes e. Wekî din kî çi dibêje, kê çi bibêje bila bibêje, xem nîn e.

Têbinî – Romana min a bi nave “Kewa Marî - Mêkew” Li Stockholm Swêdê bi kurdî hatibû weşandin û paşê jî li tirkî jî hatiye wergerandin û bi navê ”Mari Kekligim” li Stenbolê hatiye weşandinê.

www.arsivakurd.org

Azad Ekkaş

Newaya roviya şîn li kozikê darvên



Darvan:
Venedimalî ji ser rûdêman
mîla* kehniya amasê.
Tînoşkî me, mirdarî me,
Şînrovîkê! Zengar-dasê!

Şînrovîk:
Min das berda, hilda tifing
nav dirîreşkên ber şerî.
Darvan bimire, maye tifing
li çerxa seferberî.

- Qebeqaz e, halana birînan,
kef hêrsa ḥêrên** jinebî.
Zû narize, çavê dronan,
Şînrovîkê, tu çavînî nebî!

- Efrîn mij e, sehma kurba,
kuvarkê birûskan kunêr e.
Penaya ji xezeba zirmilêban
êla gêlberûyê ***, a sivoran.

- Misînê min li çeper e
Sîmirê qeydên kêmûkasî.
De şerpeze, xûyê qelenderan,
Şînrovîkê! Giyanxwas î!

- Genimê hejaran keskî veda,
aso tankên Tirka ye!
Yek peqiya, man bi sedan,
de ji fîşek û ezmên tu mayî.

* mîl, mûle: axa sor a pir hûr a ku ji biniya çeman tê deranîn an jî lehî bi şûn xwe de dihêlin.
** ḥêr,حێر : bûstanê zeytûnan an hejîran.
*** gêlberû: cûreyek berûyên girs.

www.arsivakurd.org

Yucel Aslan (Koçer)



EZ Û NAVÊ KURDİSTANÊ

Cara ewil min navê Kurdistanê saya serê bûkeke gundê me bihîst, ez êdî zarokekî berefehm bûm heyam jî çilê zivistanê bû, xwûşka min a mezin ez şandim maleke cînarê me, mala wan li taxa jêrê bû. Got tu here wê malikê bûka wan teze siyar kirine, nexş, nemûş, ornag (mînak) ên baş ba wan hene, xwûşka min jî bi kelenaciyeke mezin cihêzê xwe hazir dikir şev û roj serê wê li ser tentene û qenevça ranedibû.

Ez çûme malikê min navê xwûşka xwe got wan tûrikek tije qilif û tentene kirin dane min.
Ez hatim malê di nav wan de qilifekî Quranê hebû li ser KURDİSTAN CAMİSİ nivisîbû min ew dît ez mat mam, min xwûşka xwe pirsî wê jî nizanibû, min birê xwe pirsî wî jî nizanibû, ez çûm cem bavê xwe, em bavê xwe re dibêjin apo, min got apo Kurdistan çiye “ got kerr be kulgewriyo here karê xwe. Ez şandim derva got, te qirciyê binê dangî paqij kir îjar ma Kurdistan û got zû here wê qesela binê kurina temîz bike wextê danê pêz hatiye” ez toledezgîn vegeriyam lê peyva Kurdistanê dilê min de maye gelo ez ê çawa hîn bibim?

Ez dibêjim gelo ez herim wê bûkê pirs bikim bûk niha dizane KURDİSTAN CAMISI çiye li ser qilifê cihêzê wê hatiye çêkirinê ew teqez dizane, paşê jî ez şerm dikim û dibêjim bûka xerîb teze hatiye gundê me, lê ez herim merivê mala wan yê min ra çi bibêjin dîsa disekinim. Ez diçim malê wî qilifê Quranê didime hemberî xwe lê dinhêrim mîna merivekî nîgarkêş î nîgareke teze bibîne lê temaşe bike, serobinî dibim lê tiştekî jê fehm nakim.
Axir kêm zêde li ser ra sê çar salek derbas bûn, min hew dît ew malika rojekî hatine ger, geştê (piknik) ez jî ber pez im, min pezê xwe ediland ez çûme ba wan lê peyva Kurdistanê dİ dilê min da şaxvedaye. Piştî nan û avê ez çûme ba bûkê, bûk jî ji Milazgira Mûşê hatibû gundê me, min got xûçê hal û mesela min ev, ev çend sal e ez vê gotinê mereq dikim, ka bêje Kurdistan çi ye?

www.arsivakurd.org

Ew cihê ku ew hatibûn lê geşt û gerê cihekî bilind e em dibêjin Çiyayê Gozilbaba, bûkê destê xwe berve Çiyayê Sîpanê kir, berve Qertewînê û Bilêcanê kir, Çemê Heftreng û Çemê Mûradê nişan kirin û got lê binhêre Kurdistan ev der e, ev deşt û çiyayên han tev Kurdistan in, ev çem û kaniyên han jî tev yên Kurdistanê ne, ez û tu jî em kurd in, û bi dengekî tesir xeberda gundê mala bavê wê jî dûrîva dihate xuyan, bûk ji bo mala bavê xwe, ez jî ji bo peyva Kurdistanê em xemgîn bûn min xatir ji wan xwest, ez dîsa çûme ber pezê xwe, lê ricafekî bedena min girt min ew dem û dîdema wisa hundurê xwe da xwedî kir.

Ma heya zivistanê ez rojekî danê esrê cem bavê xwe Radyoya Rewanê guhdar dikim, min dît tev mûzîkê keçikek distrê dibêje Welatê me Kurdistan e/ cîh, meskene me Kurdan e/ welat ji me ra rih û can e/ Kurd hemû bira ne. Ewî dengê zelal jî li ser min bandoreke giran hîşt, ez piştê gelek salan hîn bûm wekî ew dengê hunermenda mezin Aslîka Qadir bû. Min wê derê jî navê Kurdistanê bihîst kelecanî ket nava dilê min lê min turuş nekir ez careke din bavê xwe pirs bikim Kurdistan çiye?

Dê û bavê me , pêşiyên me ji me ra qala Kurdistanê, qala netewa me, axa me, nexş û nîgarên me nedikirin ev kêmasiyeke pir mezin bû, piraniya zarê gund diçûn mizgeftê ba mele dersa quranê, lê kesekî navê Kurdistanê nizanibû.

Wê carê jî peyva Kurdistanê wisa dilê min da zîlda û ma lê ez nasekinim xwe digerim, nasnameya xwe diğerim, welatê xwe diğerim, axa xwe digerim, hine caran nûçeyên êvarê de radyo qala Gurcistanê dike ez dikevim nava mitalan dibêjim gelo ev Kurdistan e, tirk dibêjin Gurcistan, paşê dîsa şa dibim dibêjim de yê qala Kurdistanê jî bike rojekî wê hêviyê dimînim.
Ez jî êdî mezin bûm sal bû 1990 ez hatim Sitenbolê piştî kar, xebat û hinek tercûbeyên din ez sala 1994 de çûme eskeriyê, ekseriya min li Karkamişa Dîlokê bû.



www.avakurd.org

Rojekî dora nobedariyê dora min e ez çûm ser xetê qaşo nobetê bigrim, min dît du peya aliyê gundê Zormixarê va tên kurmancî xeberdidin ez zendegirtî bûm, evder axa Suriyeyê ye divê ev erebî bipeyîvin çima kurdî dipeyîvin? Bala min kişand dengê kurmancî ser min ket ez mîna mîha ku berxa xwe bigere min kire kalekal gazî wan herdû peyaya kir. Bira hûn kurmanc in, gotin erê, wî dengî ra hema nişkava wî erdê mayûn de min tiving avêt ez çûme ba wan, me hev hembêz kir qasî saetekî me sohbet kir wan wî çaxî ji min ra qala herçar aliyê Kurdistanê kir. Ji wan wêdatir gundek dîsa hebû Gundê Elpelûrê min ra qala wî gundî jî kirin, derheqa dîrok û nexşeya Kurdistanê de gelek agahî dane min. Wê rojê dîsa ew qilifê Quranê hate bîra min, wê bûka gundê me çawa Sîpan, Qertewîn û Bilêcan nîşanî min dan, got binhêre ev der tev Kurdistan e, ez û tu jî em Kurd in, wan hevalan jî berê xwe berva deşta Pirsûsê kirin erd û berdê Kobaniyê nîşanî min dan gotin ev der Kurdistan e heval û yekî got tu a niha here vî Çemê Ferat da masiyekî bigre bîne ew ê te re kurmancî biaxife gilî û gotinên wan gelekî ser min tesîr kirin.

Wê rojê ez hîn bûm ew xeta tirenê li ser dilê Kurdistanê re derbas dibû, wê rojê ez hîn bûm ew gundê hemberî min gundekî rojavayê welatê min e, ez wê rojê hîn bûm şêniyê wî gundî xwuşk û birayê min in , ez wê rojê hîn bûm ew zeviyên mayûnan li ser dilê Kurdan hatine reşandinê. Piştî wê min û gundiyê Zormixarê me carek duduyan dîsa hev dît eskera muxbûriya min kirin ez birim santralê heta roja teskera min ez neşandim nobetê lê têlsizê da yekcaran xeta me hev digirt em hevra dipeyîvîn ew jî tirsetirs.

Min wan rojê han ew gundê Zormixarê televîzyonên Tirkan da dît, gund kirine devê topa xwe, hawirdorê gund girtine, axînî ji dil û hinavê min çû, ew herdû hevalên binxetê ketin bîra min, gelo ew a niha li ku ne? Halê wan û malbata wan çiye? li ber xişma van xwînxwara ew ê çawa berxwebidin û min got gelo ev xeta tirênê yê kengê li ser dilê Kurdistanê rabe? Ev dîwarê zilmê yê kengê tep bibe? Ev mayûnên kengê berhev bibin?
Ev têlên kelemî yê çiwext rabin û ew masiyê Çemê Ferat da yê çiwext Kurmancî biaxifin?
Û bibêjin gelî miletê Kurd navê Kurdistanê zarokên xwe ra bibêjin, bibin yek tifaqa xwe şên bikin, welatê xwe nas bikin, alaya xwe bilind bikin, hişyar bin, nekevin tora dijminên xwe.
Heke tifaqa me hebe ne Sadabad, ne Qesrî Şirîn, ne Sewr, ne Lozan ne jî Astana navê Kurdistanê nikarin ji dîrokê rakin.

www.arsivakurd.org

EHMEDÊ GOYÎ
Dê



Min xwe dabû ber çirûska,
Ronahiya rûyê weş
Jiyan da min wê birûska,
Ji herdu çavên keleş

Şaneşîn e bedena gewr,
Ji pistanan mijiyam
Gelek borîn zeman û dewr,
Li ser sîngê çê jiyam

Zanim niha birîndar e,
Ji çar derbên li pişтê
Tên me gezan kurmên darê,
J'birînan xwîna reş tê

Xwe avêtin agirê gur, bi hezaran
Mem j'bo Zîn
Li sîneya Amed û Sur,
Heyfê radikin Tajdîn

Ji xweliya perperîkan,
Rûh hate min vejiyam
Li geliya wek dirîkan,
Bûme zirî hejiyam

Ji xwînê heml ket zigê Dê,
Dest bidin l'ber pişta wê
Hindik ma emê bêjîn hêê,
Du hêlên Xabur û Zê.

www.arsivakurd.org

CELAL ORHAN

HÊSİRÊN KURÊ ARNOS

www.arsivkurd.org

Di serdemê de ku mirov nebûna amûrên pîvandinê, çandinî, sewalkarî û jiyana nişтecihbûyî, ji ber tevgerên tektonîkî li gundê dêmkar yê navçeya miksê Wanê rabû Çiyayê Arnosê di nav gelên ku jê re dibêjin de cihekî girîng e.

Arnos ji ber cihê xwe yê erdnîgarî û bandora bilindahiya nebatên li derdora xwe di nava gel de xwedî taybetmendiyek hinekî cuda ye.

Bilindahiya wê hema bi qasî çiyayê cîran, Şahîb e û kesî ew bi rêkûpêk bilind nedikir. ji bo pezên xelkê li çolê sitargehek peyda dikir, ji ber vê yekê jî ji aliyê gel ve dihat hezkirin text ava kiriye. Hema hema her şev li wir diman, nemaze havînê gava pez bi şev derdiketin derve. Aliyek neyînî ya kêmbûna avê jî hebû.

Di serdemê de ku mirov nebûna amûrên pîvandinê, çandinî, sewalkarî û jiyana nişтecihbûyî, ji bertevgerên tektonîkî li gundê dêmkar yê navçeya miksê Wanê rabû Çiyayê Arnosê di nav gelên ku jê re dibêjin de cihekî girîng e.

Arnos ji ber cihê xwe yê erdnîgarî û bandora bilindahiya nebatên li derdora xwe di nava gel de xwedî taybetmendiyek hinekî cuda ye.



Bilindahiya wê hema bi qasî çiyayê cîran, Şahîb e û kesî ew bi rêkûpêk bilind nedikir. ji bo pezên xelkê li çolê sitargehek peyda dikir, ji ber vê yekê jî ji aliyê gel ve dihat hezkirin text ava kiriye. Hema hema her şev li wir diman, nemaze havînê gava pez bi şev derdiketin derve. Aliyek neyînî ya kêmbûna avê jî hebû.

Ji aliyekê din ve jina kor a herî temen mezin, firika ku ji serê xwe derxistibû, kir qurbana pez û got: "Ev xelata dilovaniya te ye, zêde jî ya min e." paşê baran rawestiya û tav dişewite Germahiya wî wek kevir li ser wan rawestiya.

Xwedê ferman kiriye ku hûn wan li cihê ku lê ne biçûk bikin da ku ji wan û yên din re bibe ders. Wê demê şivan Berrîvan û pez hemû wek bajarê Pompeo bûne kevir û kes nikare jê bireve.

Çiyayê Arnosê bi îzna Xwedê ji çiyayê şahîpê bilindtir dibe û tu zarokek mirov nikare rabe ser van mirovan çi tê. Dema ku kesên der û dorê û xizmên petrovan vê yekê dibihîzin, bi matmayî nizanin çi bikin. ew digirîn û digirîn. wesselam

Ez difikirim ku em dikarin ji vir bigihîjin encama jêrîn. "Zarokê însan çiqas nankor e, soza xwe nagire û her tim li dû daxwaza zêde digere, lewma derdên wiha tên serê wî." ramanên min ên xweş ji te re ez dixwazim wekî girtina xwe diyar bikim. Tu li ku derê dinyayê bî, xwe mezin neke, tu ne wek xwêya galaksiya bêdawî ya gerdûnê yî, tu qîmeta te tune. Li gor wê .





MİCHAEL ERARD

CULTURAL OF FİRST WORDS

WERGÊR:BERAT QEWÎENDAM

RABORİYA ÇANDÎ YA PEYVÊN PÊŞÎN

www.arsivakurd.org

Gelo peyvên pêşîn ên her zarokekî taybetî wî bi xwe ne?

Pêşek

Ji bîrweriyên herî xweş ên dêûbavan peyvên pêşîn in ku zarok bi lêv dikin. Gelekên dêûbavan van peyvan qeyd dikin, roj û şêwaza wan ji aliyê zarokê xwe va dinivîsin an jî deng û dîmena wê qeyd dikin. Berovajiya peyvên paşîn û herî dawî yên her mirovekî ku ji serdemên kevn va gelekî girîng dihatine hesibandin, mereqa li peyvên pêşîn di serdema modern da zêdetir derketiye holê. Ji binemala paşatiya Fransayê bigir heta Charles Darwinî, hêdî hêdî tomarkirina peyvên pêşîn ên zarokan girîngtir bû. Lê bi rastî ev peyv çi ne? pirtûkeke nû raboriya van peyvan vekolandiye.

Wer xuya dike ku yekemîn peyvên ku zarokek tîne zimên, li her derê cîhanê ecêb bin. Yekem peyva ku tê zimên, lêvalêvê mizgîniya jiyaneke nû ye û wek yekemîn raderbirrîna xwe ya mirovekî nû tê zanîn, heta eger ev peyv ji bo binavkirina se, daxwaza xwarinê an jî gotina silavê be.

Zêdetir ji vêya ku yekem peyv tenê xweşik bin, ji hêla bûnayetiyê va wateyeke kûr dihewînin. Ev peyv bereberê lûtkeyekê temsîl dikin ku tê da deng dibe nîşane; kêliya ku cîhana hundirîn sînorên xwe derbas dike da ku rastî cîhana derveyî were.

Tevî vê yekê, wisa diyar e ku di pirraniya dirêjahiya dîrokê da, zimanê pitikan hêjayî berçavgirtinê nehatiye zanîn û di gelek çandên hevçerx da jî hîn balê nakişîne. Gişt zarok, li her cih û demekê, hema bêje di derdora duwazdeh mehiyê da ji gotinên nediyar û gixe-bixeyan vediguhêzin zimanê axaftinê her wiha zimanê eşaretê, lê gişt dêûbav û miqatederên wan bala xwe nadin ser vê veguhezînê. Tiştê ku di rû da nebergirîbar e û em wek "Yekemîn peyva zarok" bi nav dikin, qonaxeke werçerxanê ye ku bi hestên romantîk ra têkel e, bi şert û mercên civakî û aborî pêk hatiye û bi awayekî matkerane nû ye. Rewşa xwezayî ya peyvên pêşîn dihêle ku pûte bi wan neyê dayîn, bi şaşî bên bihîstin an jî bi tevahî bên paşguhkirin. Behicîna gelekî zêde li ser van peyvan zêdegavî nîne, tenê şikodariyeke nûjen e ku têra xwe qedra wê nehatiye girtin.

Karl Guthke'yê almanî ku di destpêka dehika 1990î da pirtûkeke diyarker li ser peyvên herî dawî nivîsî, ez han dam ku raboriyeke çandî derheqê "peyvên pêşîn" bi dest bînim. Gutkeyî ev peyv wek berhemên hunerî didîtin ku mirov di her serdemekê da ji têgeha mirinê diafirîne. Wî digot: "Cûreyên mirinê hene. Vêca gelo dibe ku em bibêjin têkiliyek navbera cûreyên mirinê û şêwaza peyvên herî dawî ku mirov tîne zimên, hebe?" Ji aliyê din va wî bala xwe nedida ser peyvên pêşîn û baweriya wî ev bû ku ev peyv nikarin tiştekî zêde derbarê jiyanên kesane ji me ra bibêjin. Wî nivîsî: "Peyvên pêşîn ayîdî çîrokên zaroktiyê ne ku nirxa wan a danasîna jiyanê têkiliyeke berovajî bi balkêşbûna wan ra heye." Ew li ser berendamê serokkomartiya 1988an ê Amerîkayê yanî Michael Dukakis diramî, ku wek teknokratekî dilkevir binavûdeng bû. Kesê ku dihat xuyakirin çarenûsa wî bi peyvên pêşîn ku anîbûn ziman û dihat îdiakirin bi zimanê yûnanî bûne, hatibû pêşbînîkirin: monus ou, an jî "Ez xwe bi tenê."

Lê belê peyvên pêşîn, ji gotinên nediyar û nîvcû heta yên ku bi duristî tên bilêvkirin, tiştine zehf derbarê civakê ji me ra dibêjin. Peyvên pêşîn jî eynî weke peyvên paşîn xwedan "cûre û şêwaz" in û nîşan didin ku çi tên bihîstin, qeydkirin an dev bi dev digerin. Ya girîngtir ev e, meyl û eleqeya mirovan li peyvên pêşîn, têkiliyeke nêzik bi vê mijarê ra heye ku çawa civakên takekesşop ên rojavayî veguherîne tiştekî ku mirovnasekî bi navê David Lancy wek “neontocracies,” bi nav kiriye: Civakên ku li dor erkên miqatebûna zarokên gelekî biçûk organîze bûne. Eger tu dixwazî pê bizanî ku çawa zarokên berşîr bûne projeyên kognîtîv anku îdrakî yên dêûbavên xwe, rêbazeke baş ev e ku têgihîştina van dêûbavan ji peyvên pêşîn ên zarokên xwe bişopînî.

Di raboriya çandî ya peyvên pêşîn ku em wek mirov tînin zimên da, em dikarin bi dilniyayî bibêjin ku ev peyv hertim hebûne. Lê derbirînên herî pêşî gelekî kêm di nivîsên dîrokî da hatine destnîşankirin. Ev peyv pirranî li medyayên îroyî wekî pirtûkên zarokan, rojnivîsk û nivîsarên zanistî hatine tomarkirin. Ev di halekî da ye ku, dîroka peyvên herî dawî wer xuya dike ku vedigere serdemên kevn. Cara yekem ku peyva herî pêşîn a zarokekî hat tomarkirin, weke nîşaneyeke diyarbûna modernîteyê hat zanîn.

Di dehika 80î da, Linda Pollock'yê ku aniha mamosteya zanîngeha Tulane'yê ye, bi dehan rojnivîskên bi zimanê inglîzî ji sedsala şanzdeh heta nozdehan vekolandin û li dû şehedî û delîlina geriya ku bizane ka mezin çawa li ser zarên xwe difikirîne. Wî dît ku ji 91 rojnivîskan, tenê 19 rojnivîskan bi tevahî bala xwe daye ser axaftina zarok û pitikan û tenê 9ên wan amaje bi peyvên pêşîn kiriye.

Amajeya herî pêşîn ji aliyê dadwerekî Puritan li Massachusetts'a Amerîkayê yê bi navê Samuel Sewall di destpêka sala 1686an da bû. Wî di rojnivîska xwe da nivîsîbû ku kurê wî yê hejdeh mehî yê bi navê Hull, "Aşkira dibêje Apple (Sêv)." Eleqeya vî bavî dibe ku ji ber vê yekê bûbe ku bi giştî eva ku kurekî nexweş biaxive, balkêş e. Zarok sê hefteyan piştî duyemîn salvegera jidayîkbûna xwe mir. Peyva wî ya yekem, peyveka wî ya herî dawî bû.

Qeyda Sewall a peyva "Sêv" ku Hull'ê kurê wî anîbû ziman, ya herî kevn ku min bi dest xistiye nîne. Qeyda herî kevn a peyvên pêşîn têkildarî sala 1602an e, dema ku bijîşkekî fransî bi navê Jean Héroard hat erkdarkirin ku rewşa mezinbûn û pêşketina yekemîn mîrasgirê rewa yê desthilatdariya Fransayê piştî 80 salan bi awayekî berdewam binivîse. Ev 'dauphin' piştra bû Lûyiyê Şanzdehem (Louis XIII). Eger em yekem peyva ku Héroardî nivîsî, bi inglîziya îroyî wergerînin, hevwateyî hé (lo) ye. Piştî Héroardî heta 84 salan, êdî em rastî tu qeydeke peyvên pêşîn nayên.

Zêdeyî nîvê amajeyên bi axaftina zarokan ku di rojnivîskên Pollockî da hebûn, ayîdî sedsala nozdehem bûn. Piştî "hé"ya dauphin û "apple"a Sewallî, peyva din di sala 1839an da hat qeydkirin, dema ku Charles Darwin yekem pêşketina kurê xwe, di nav da yekem peyva wî yanî “mum” qeyd kir. Darwinî nivîsî ku ev peyv tê wateya "xwarin" an jî "xwarinê bide min".

Ev tiştê sade ji ber karê ku Darwinî pê kir, girîngtir bû. Wî sala 1877an rojnivîskên xwe weşandin û belavbûna wan li Alman, Rûsiye û Fransayê hevdem kelecaneke gelemperî ya nivîsîna rojnivîskan li nav dîroknasên din ên xwezayî rakir û wekî ku derûnnasê ziman ê almanî, Willem Levelt dibêje, nişkê va lêkolîna li ser pêşkeftina zarokan kir "Şaxeke rêzbar a biyolojiya mirovan". Eger em nebêjin gişt, lê pirraniya nûserên bîrewerî û rojnivîskan mêr bûn.

James Sully derûnnasê brîtanyayî di sala 1881ê da nivîsî: "Vê kelecana ji bo zanista derûnnasiyê hejmareke nasên min jî girtine ber xwe. Ev kes pirranî mêrên cewan ên zewicî ne ku diyardeya serdema zaroktiyê ji bo wan nû xuya dike û bi coşa xwe ya xortaniyê, çalakiyên xwe yên zanistî dişopînin". Lêkolînên wan ên li dor mijara bîreweriyan, ev angaşt xurttir kir ku pêşkettina kesane heman rêyî dişopîne ku cûreyên ciyawaz tê da werirîne. Loma, peyvên pêşîn pencereyekê li ser hiş û şiyanên bav û kalên mirov di dirêjahiya heyama werarê da vedikin. Bi vê nêrînê, "Mum" bi wateyekê cûreyeke fosîla zindî bû.

Rapora Darwinî bersivek li ser raporekê bû ku salek beriya wê, dîroknivîsê fransî, Hippolyte Taine derbarê keçeke xwe nivîsîbû û gelek hûrgilî derbarê yekemîn dengê wê tê da hebûn. Taine nivîsîbû ku yekemîn peyvên keça wî "papa" û "tem" bûne, wî wisa fikirîbû ku keça wî hewil dide lêkera tiens bi wateya ragirtinê bi lêv bike. Wî ev peyv bi hezkirin vekolnad û bi nêrîna wî peyveke "balkêş" bû. Gelek wateyên vê peyvê hebûn: "bide, bigir, bibîn". Taine nivîsî: "Di rastiyê da keça min wê peyvê gelekî vebirrane çend caran li pey hev û bi îsrar bi lêv dike, carinan dibe ku tiştekî nû ku dibîne daxwaz bike, carinan dixwaze em wê bigirin û carinan ji bo ku bala me bikişîne ser xwe. Peyva tem tevahiya van wateyan temsîl dike." Dema ku keça wî êdî vê peyvê bi lêv nake, Taine hema bi qasî kêfxweşiya xwe, xemgîn dibe. Ew dibêje: "Tu gumanek tune, ji ber ku me nebijartiye ku em wê fêr bibin, vê peyvê bi tu yek ji ramanên me ra li hev nekir... me ev peyv pê ra bi lêv nekir û vêca wê jî dev ji bikaranîna wê berda." Lê dîsa jî, heta demekê vê peyvê destpêka "Hilpirjîneke vînê" nîşan dida ku kêfa bavo pê dihat.

Darwin û Taine, her duyan pejirandibû ku peyvên pêşîn, ev bendikên fonetîk ên taybet bûn ku (bi nêrîna wan) zarok dewsa ku wan teqlîd bike, ji xwe çêdike. Darwin piştrast bû ku Doddy (wiha bang li kurê xwe dikir) "mum"a xwe "afirandiye". Baweriya wan ev bû ku peyvên pêşîn nîşana diyarbûna ziman li bav û kalên me yên dûr e. Taineyî nivîsî: "Bi gelemperî, zarok di rewşeke derbasder da hin taybetmendiyên zihnî nîşan dide ku di rewşa neguhêr da li şaristaniyetên seretayî xuya dibûn. Gelekî weke nitfeya (embryo) mirovî ku di rewşeke derbasder da hin taybetmendiyên fîzîkî nîşan dide ku di rewşa neguhêr da li çînên heywanên payenizimtir tên dîtin."

Derdora hemanê demê ku Darwin, Taine û ewropiyên din mijûlî zarokan û raboriya werara ziman bûn, yekemîn pirtûkên bazirganî yên zarokan ji bo tomarkirina kêliêyn girîng, ji wan peyvên pêşîn li Amerîkayê xuya bûn. Di vê serdemê da, raçavkirina peyvên pêşîn bi rastî deng vedabû. Ji bo Darwin û Taineyî peyvên pêşîn nîşaneya derbasbûna zarok bo mirovahiyê bû, lê di serdema pirtûkên zarokan da, peyvên pêşîn nîşan dida ku mirovekî nû digihêje, ne tenê bûnewerekî ciyawaz li nav heywanan, lê belê kesayetiyek ku ciyawaz di gel mirovên din e.

Wê demê, ji her çar an pênc zarokan, yekî wan beriya diwanzdeh mehiyê dimir. Tomarkirina yekemînên cûr bi cûr ji wan peyvên pêşîn, dêûbav teşwîq dikirin ku demeke zêdetir ji bo zarokên xwe ku êdî ji hêla ihsasî va hêjatiyeke zêdetir hebûn, terxan bikin. Di destpêkê da, pirtûkên zarokan, jinên çînên jortir ên civakê kirin armanc, kesên ku kevneşopiya tomarkirina xelatên zarok ji aliyê xizm û hevalan li nav wan hebû. Pêşwaziya ji van pirtûkan li nav malbatên çîna navgîn û karkeran bû sebeb ku fikirîna li ser vê yekê ku her pitik û zarokekî girîng e, hêsantir bibe. Bi destpêbûna sedsala nû, rêveberiyên tenduristiyê yên xwecihî dest bi raberkirina pirtûkên zarokan ên li gorî modela xwe kir. peyvên pêşîn bûn kêliyeke girîng di pêşketina zarok da, lê ev yek tenê di demekê da dikarî biqewime ku pitikan şanseke zêde hebûna da ku derbasî serdema zaroktiyê bibûna.

Raporên pirtûkxaneyî yên serxet ên derdora bîst pirtûkên zarokan ji sedsala bîstem li koleksiyoneke taybetî zanîngeha UCLAyê nîşan da ku li derdora sê duyê van pirtûkan cihek ji bo "peyva pêşîn" an jî "peyvên pêşîn" hebû. Pirtûka herî balkêş, a sala 1910an bû ku dipirsî: "Yekemîn peyvên ecêb çi bûn?" Pirtûka din pirsa "Gotinên zarok" û ya din pirsa "axaftin" û "hejmara peyvan di 18 mehiyê da" dikir. Derdora sê yekê pirtûkan tu yek ji van pirsan tê da tunebûn û dewsa wan pirsa yekemîn wêne, yekemîn cejna jidayîkbûnê, yekemîn krîsmes, yekemîn diran û yekemîn gerrê kiribû. Wek mînak, pirtûka *Jiyannameyek ji bo zarokekî başt*ir *(The Biography of a Better Baby*) ku sala 1910an hat weşandin, dibêje "zarokên başt*ir*" dixwin, mezin dibin, kincan li xwe dikin, hewayê taze bêhn dikişînin û dimeşin. (Bala xwe bide ser ku "axaftin" di vê lîsteyê da tuneye). Pirtûkeke fransî ya çapbûyî di sala 1906an da bi navê *Pirtûka Zarok (Le Livret de L'enfa),* tenê dipirsî ku zarok kengî dest bi axaftinê kiriye û *Pirtûka zarokê Edwardian* a sala 1908an, qonaxên girîng ên zimanî diyar dike ("Divê bêyî wateyeke taybet kîteyan weke ma, pa, na, ta bi kar bîne"), lê qala peyvên pêşîn nake.

Ev serdem, her wiha xala destpêkê ya baweriyeke din bû: Peyvên pêşîn ên zarokekî dikarin jiyana wî pêşbînî bikin. di pirtûka Zarokan jiyana me modern kir (Babies Made Us Modern) da ku raboriyeke zarokan li Amerîkayê ji dehsaliya 1890î heta dawiya serdema zêdebûna zarokanînê ye, Janet Goldenê dîroknas nîşaneyên cûr bi cûr bi hev ra têkildar dike, nîşaneyên ku hem zanistî û hem têkildarî çanda gelemperî ne û dêûbavan ji wan sûd werdigirt da ku pêşeroja zarokê xwe pêşbînî bikin. Pirtûkeke zarokan a sala 1912an, "nîşaneyên pêşîn ên tekûz ên hestkirinê li tiştên nexuya", "Hewila pêşîn ji bo bidestxistina tiştekî" û "nîşaneyên pêşîn ên aqilmendiyê" dişopandin. Hinek ji pirtûkên din balê dikişandin ser vê baweriya nasyar ku eger tevgerên pêşîn ên zarokekî di fezayê da ber bi jor va bin, ev berzbûna cîgeha wî ya civakî misoger dike. Ev yek bû sebeb ku dêûbav zarokên xwe yên berşîr ji pilekanê jorda bibin. Eger malekê tenê qateke xwe hebûya, wan ê zarok ji derenceyê jorda bibirana.

Di dawiya dehsaliya 60î da, dayîka min pê hesiya ku peyvên min ên pêşîn “money” (dirav) û "dubbaday" (ji ser navê weşana kevn a Doubleday) ye û wê bi şaşitî pêşbînî kir ku min ê karekî bi sûd û derhata zehf di warê weşanê da hebe. Wê bêyî ku van peyvan binivîsîne, ji bîr nekirin, ji ber ku pirtûka min a zarokatiyê Katolîk bû û dewsa peyvên pêşîn, "diaya pêşîn" û "Krîsmesa pêşîn" û "îşaya xwedayî ya pêşîn" (first Mass) ên min bûn. Bi nêrîna min avêtina dia û dirozan bo nav devê zarokan çêtir ji vê bû ku bihêlin ew jixweber qala ramanên xwe yên necivakî û dijî baweriyên dînî bikin. Tevî ku renge peyvên min ên pêşîn di dirûva pêşbînîkirinê da nebûn, peyva pêşîn a Picassoyî "piz" (beranberî peyva spanyayî ya “pencil” an jî qelem) û peyva pêşîn a Julie Andrews'ê "mal" (home) bû.

Di hin çandan da, peyvên pêşîn tên diyarkirin; ne girîng e ku zarok dibe ku tiştekî din bîne ziman, heta dema ku qala tiştine diyarkirî neke, peyvên wî yên jixweber wek axaftin nayên hesab. Di çanda Samoa'yê ya amerîkî û rojavayî da, peyva herî pêşîn ku tê bilêvkirin, tae bi wateya "gû" ye. Du mirovnasên amerîkî, Elinor Ochs û Bambi Schieffelin dibêjin ku li çanda samoa'yî, zarok wek "rûçirî, şerût û birik" (cheeky, mischevious, and willfull) tên zanîn û peyveke wiha guncan xuya dike. Li cihên din, peyvên pêşîn, rewşa cîhaneke din a zarok nîşan didin. Nigel Barley, mirovnasê brîtanyayî dibêje, gelê Chambaya Kamêrûn û Nîceryayê li ser vê bawerê ne ku peyvên nediyar ên zarokên berşîr û extiyaran zimanê cîhana rihê ye. Ew dinivîse: "Zarokên berşîr hîn ew ji bîr nekiriye û extiyar jî ji nû va wê dest pê dikin, vêca wekhev in". gelê Baule'yê li welatê Ivory Coast'ê jî vê baweriyê dişopînin ku zarokên ku zimanê bav û kalan bi awayê nediyar diaxivin, divê dûr bên ragirtin da ku wî ji bo pîlandarêştina dijî zindiyan bi kar neyînin.

Di pirtûkeke hezkirî ya bi navê Knuffle Bunny da ku ji aliyê Mo Willems va hatiye nivîsîn, keçikeke bi navê Trixie kêrgiya xwe ya ji qumaşê wina dike û piştra dîsan wê dibîne. Dema ku dîsan bûkika xwe bi dest dixe, tiştekî tîne zimên ku beriya wê tu wextî bi lêv nekiriye. Bavê wê, wê peyvê wek peyva pêşîn a Trixie'yê dibîne. Metirsiya aşkirabûna çîrokê: Ev peyv "knuffle bunny" bûn.


Ev pirtûk bi bîr dixe ku "peyva pêşîn" berhema dijheviya navbera meyla zarokê ya gihandina wateyê û xwesteka mezin ji bo têgihîştinê ye. "Knuffle bunny" di rastiyê da yekem tişt nîne ku Trixie di pirtûkê da qala wê dike. Ew beriya wê hewil dide ji bavê xwe ra bibêje ku kêrgiya wê bi cî maye. Ew diqîre: “Aggle flaggle klabble!” û bavê wê dibersivîne: "Rast e. va ye em vedigerin malê."
Tiştê ku derbarê "knuffle bunny" rast e, ji bo "mum"a Darwînî, "tem"a Taineyî, "Sêv"a (apple) Swallî û heta renge ji bo "hé"ya Héroardî jî derbasder be. Rewşa peyva yekem wek "pêşîn", hertim bi awayekî jixweçêkirî û girêdayî bi meyl û daxwaza yekî mezin e ku ji bo bilêvkirinekê wateyekê terxan bike. Hema wisa ku zimannasa amerîkî, Catherine Snow'yê di sala 1980î da got, "Peyva yekem wek neynikekê ye ku biryarên civakê li ser gelek mijaran nîşan dide: Rewşa zarok li beranberî dêûbav, wesifandina biryardarî, bawerî û rahênanên civakbariya ziman û baweriyên li ser kapasîteyên civakî û têkildanînê yên zarokên ku hîn zimanê wan venebûye û her wiha nêrînên ziman û watedariyê."

Snow û zimannasên din ev pirsgirêk bi rêyên ciyawaz çareser kiriye: Hinekên wan dev ji peyva pêşîn berdane û dewsa wê çar, deh an jî pêncî peyvên pêşîn hesibandine (ku zarokekî navgîn heta hejdeh mehiyê digihêje wê astê), di vî halî da, yên din qonaxeke peyva pêşîn destnîşan kiriye. Tiştê ku pêwîst bû, hin lîsteyên peyvan bû ku raberî dêûbavan dihatin kirin da ku dagirin. Hûrgiliyên kesane yên ku di vê rêbazê da dibûn gorî (wek mînak hûn nikarin tomar bikin ku peyva pêşîn a zarokê we “hé” an jî “tem” bû), bi sûdweriya zanistî dihat cebirandin, ji ber ku mînakine balkêş ji tiştên gelekî xwerû û sade derdiketin.

Wek mînak pirraniya peyvên pêşîn navdêr in û keç pêka kuran peyvine zêdetir bi lêv dikin ku helbet tu têkiliyeke vê yekê bi zimanê ku pê diaxivin an çanda wan ra tuneye. Em dikarin hinekî wêratir bin û bijêjin ku peyvên pêşîn di dirêjahaiya dîrokê da, çi hatibin bihîstin û çi nehatibin bihîstin, dibe ku gelekî ciyawaz di gel peyvên ku zarokên roja îro bi lêv dikin, nebûbin: dengê ajelan, navên çivîkên navmalî û endamên malbatê, xwarin, silavdan û halpirsîn. Peyvên pêşîn ên te peyvên pêşîn ên her kesekî din bûne û zarokên nifşên cûr bi cûr di dirêjahiya dîrokê da, dema ku derbasî qonaxa nû ya jiyana xwe dibûn, ew peyv bi caran û bi caran bi lêv kirine.



HASBEG KOKSAL



BAYÊ LINGBEZ

Di nav bûyerên xwezayî da, bûyera herî ling lez û bez, lîstîkvan, henekbaz û hêrsdar a biserê xwe û azad, ba ye. Li hember cansivikîya bayê, bêguman, hemû bûyerên xwezayî yên din matmayî dimînin!
Car caran, di cihê xwe da disekine û dihêje. Car caran jî, bi hêdika gulî û pelên daran, serîyên gil û gîyan, rûyên derya û golan mist dike û bi dengekê nizm lorîna xwe di guhên wan da dibêje. Tu dibêjî qey di hêlenekê da zarokê berşîr dihêjîne.

Carna jî livîna xwe xurt dike û berê xwe dide gaz û kuran û tûm û çîyan. Bilez û bez hildikişe sertaran, li lûtkeyan xwe badide û digere. Li gorî dilê xwe, xwe berdide kendal û newalan, mêrg û deştan û çi bi ber dikeve pê mil digire û dihejîne. Dibe ba û bahoz, dibe gilêle û babelîsk li dor xwe dizivire. Bi toz û xubar, bi qirş û qal, bi berf û baran, kurt û kurtasî di cih û çarmedorên xwe da çi heye dike nav gergerîneka xwe, mîna histûnê hildide jor û rahewa dixine. Nayê famkirin, bê ka hêrs bûye yan jî di hezîyê da ye..! Pê şa dibe yan jî lê dide..!
Hin caran di dev û lêvan da fîtikek; li ber derî û paceyan, li ser xanî û sivîngan, li dor baxir û şikeftan tê û dere. Tu dibêjî qey li benda tiştekîye. Wekî derdoran seh dike, li tiştekî digere û tiştekî disêwirîne. Dîsa li dû kîjan lîstik û henekbazîyê ye!?

Ew kîjan firindeye ku bi ber bayê lîstika bayê neketîye û pê ra kar nekiriye? Di hêşinîya asîman da baskên xwe nedaye ber bayê û hêza xwe bi bayê re nepîvaye? Mîna siyarekî li pişta bayê siyar nebîye û pê ra nelîstîye !?
Ba,hespê balindeyan e. Ba, wek dest û lingên mij û moran, ewr û tovan e. Ba dilevîn e. Di evînîya xwe da hênikî û germî, sarî û seqemîyê dihewîne. Ew ciwankalê aqilmend, dizane ku bê wî demsal nabe û jîyan şên nabe. Ax, riwek, ajal û sewal li bendewarê wî ne. Hesûdî çi ye, çavreşî çi ye nizane.

www.arsivakurd.org

Di kelekela nîvroyên havînê da, bersivê dide banga " heyder heyder, ba ba û kilo kiloo" û xwe digîhîne hewara daskêş, palevan û xebatkaran. Bi vî hawî rehma xwe, hênik û hênik nîşanê wan dide.

Ba, di heman demê da bi qasî aramî û dayîna xwe del û dîne jî. Ti çarî nayê diltengîyê. Ew rih azad e. Ji zend û bend kirinê qet heznake. Loma jî, li kûçe û kolanên bajaran bêdil û bêzar digere. Li ku derê darek, pelek an jî kaxiz û poşêtek dibîne, bîstekî pê dilîyze û pê hedûra xwe tîne. Xwe li dîwarên avahîyên rêz bi rêzdixîne, di quncikên bînayan da nîv fetisî difilite qadan. Bi awayekî şaşwaz û bisebr, li rêyên xilasbûnê yên ji vê tengasîyê digere. Lê çi bike jî dilê xwe têr nake. ji bo vê jî, hin caran bi hêrs dînîtiya xwe nîşan dide. Her tişt li hevdiqelibîne, ser û bin dike û berê xwe dide çol û çolteran.

Dem, kîjan dem dibe bila bibe, bend, kîjan bend dibe bila bibe; ba, tim wek şoreşgerekî ji bo serbestîya xwe çalakvan e. Di her werzê da afirênêr e...


Bêguman, bi bayê lîstikvan, henekbaz û lingbez, bi bayê aramker û hêrsdar; dinya biwerz û bitehm e...







www.dijvakurd.org



MAHÎN ŞÊXANÎ

BAWER BİKE

Bawer bike yar
Îro çelê min e
Ku ez bê te mirî me. .
Rojê çel cara
Giyanê min
Berê xwe dide
Singa te. .?.
Bê te jiyan xave
Bê te ez tî me.
Birçî me.
Kani yê Evîn ê Zuhabûn
Meçiqîn.
Xwunavê hêvi ya ji pelê
Dara min
Berê xwe guherîn.
Singa te himbêz di kir
Bûye kavil
Nizanim çawa ji te re
Şîrove bikim Axîn ê
Vî Dil
Ez bê te.... mirî me..?.

www.cegavakurd.org

Mehmet Gur

PÊXEMBEREK RABÛ Jİ COLEMÊRGÊ: ŞÊX ADÎ

Şêx Adî di sala 1075'an de li hawirê Colemêrgê ji dayîk bûye. Navê wî yê hêmanî Şerefedîn e. Navê bavê wî Misafir e. Ji aliyê kes , herêm û girseyan ve jê re weki Şêx Şerefedîn hatiye binavkirin.
Navê wî Adî an jî Edê ye. Jê re digotin Şêx Adî. Şêx esl û bingeha xwe ji Colemêrgê ye û ji eşîra Tîrahîyê ye. Şêx Adî li herêma Colemêrgê dest bi xwendin û perwerdeya xwe kiriye. Şêx Adî li gelek medreseyan geriyaye, li ber destê gelek mamosteyan ders standiye. Ji bo perwerdeya xwe çûye Şam,Heleb, Bexda, Musil û Amedê. Ev gera wî ya medresan bûye sedema gengeşa, nîqaşên li ser ji ku bûn û bingeha wî. Li gelek medreseyên têvel maye û ev mayîna wî bûye sedema nîqaşa li ser malbat û eslê wî. Hinek dibêjin ji Şamê ye , hinek dibêjin ji Musilê ye. Ev gengeşe, nîqaşên bêşul dixwazin şopên bingeh û eslê wî pê bidin berze kirin. Wî ji hemî demî de şerbeta bextreşiya zana,leheng,rewşenbîr û alimên kurdan vexwariye.

Feqî Huseyn Sagniç derbarê Şêx Adî de wiha dibêje; "Şamî ye, Musilî ye, Bexdayî ye gotin. Bi xwezayî yên ku Colemêrgî jî digotin hebûn. Heman gotin der barê malbata wî jî dihat gotin. Giraniya gotaran di nav malbatên Ereban de li malbata wî digeriyan.
Ev bûyer ne bi tenê ji bo Şêx Adî tê gotin. Çiqas leheng, zana, navdar û hişmendên kurd hene, bi heman bextreşiyê li dûrkirina ji binyata wan dixebitin."



Gelek dîrokzan, lêkolîner dibêjin Şêx Adî ji êla Emewî û ji netewa ereban e. Yên di vî fikrî de pir şaşin. Di nav şaşitiyek mezindane lewra Şêx esl û feslê xwe kurd e. Di Ansiklopediya İslamiyetê de dibêje Şêx li bajarê Suriyê li gundê Beytifarê ji dayik bûye. Li geliyê Bekayê li Libnanê hatiye cihanê. Binyat û malbata wî ereb dipejirinin. Lê mixabin ev şaşitî ji bêxwedî û bêsemyanan kurdan tê. Pir xêrnexwazên kurdan yên heyî. Kurdan dîroka xwe nenivîsiye, xwedî li nirxên xwe derneketine. Herdem dîroka wan biyaniya nivîsiye û nirx , çanda wan ji bo xwe kiriye mîrat. Ew jê bêpar hiştine. Ji ber vê yekê ji dîrokvanên ereban Şêx Adî weki kesatiyekî ereb nivîsiye û arşivek şaş tomar kiriye. Tomarkirina vê arşiva şaş bûye sedema dîrokeke şaş. Di vê mijarê de, emê dor bidine kesinan ka der barê Şêxê me de çi dibêjin:

www.pirsakurd.org

Îbnê Xelkanê Hewlêrî jî di pirtûka “Wefiyatîl E’eyan”de dibêje:”Şêx Adî kurê Misafir li gundê Beyt Qarî ya Elbakê hatiye perwerdekirin. Ew zilamekî xwedanas û parêzgar bûye û nav û dengê xwedanasiya wî li her cihî deng daye û belav bûye. Ji ber vê yekê gelek kes bûne alîgir û peyrewên wî.”

Şêx zeynedin di beşa duyem a “Tarîxa Îbnê El Werdî de”dibêje:”Ev xwedanasê mezin li Elbakê ji dayik bûye û di temenê ciwaniyê de çûye Mûsilê û gelê wê herêmê bawerî bi wî aniye û bûne alîgirê wî. Mamoste Yaqûp Serkîş di pîrtûka xwe Mebahîs El Eraqiye de dibêje:”Şêx Adî kurê Misafir kurê Ehmed ji kurdên Tîrahî ye. Lewra êla Tîrahî yek ji êlên bakurê Kurdistanê ye û rejeya wan nêzîkî hezar û pênc sed malbatî ye û niha li bakurê Amedê dijîn. Di pirtûka keşeyê nestûrî Ramîşu(1452 yê zayînî) û birêz dibêjin, Şêx Adî di warê qewmî de kurd û di hêla baweriyê de ji Serahî(Zerdeştî) bû (Tarîxa Mûsilê). Ev dîrokzan palpişt dikin ku Şêx kurd e û di kurdbûna wî de tu şik û gumanek tune ye. Yên ku wî kurd nabînin, napejirinin xêrnexwazên kurd in. Hinek kesên xêrnexwaz hişê kurdan ya dîrokî tarûmar kiriye. Gelek bê bîr û bêhiş nikare li xwedî nirxên xwe derbikevin. Şêx Adî di hişê kurdan de wekî şeytan perest hatiye neqişkirin. Kurd li vî pêxemberê mezin semyan derneketine. Yê li şopa wî çûyî ji wek alîgirên şeytan hatine pejirandin. Bêhevkariyek xistiye di nav kurdan de. Ji ber van sedeman kurdan Şêx Adî û Êzîdî çi çaran wekî kurd nepejirandine. Ev bêhevkariye ji hatiye şulê serweran.

Gelo çima kurd Şêx Adî wekî pêxember napejirinîn? Mercên pêxemberiyê çi ne? Ji bo Şêx Adî ji pîrtûkek pîroz hatiye. Jê re dibêjin Mishefa Reş. An ku pîrtûka reş. Wekî hemû pîrtûkên ji bo pêxemberên cihû û ereb ji hatî xwarê ev pîrtûk ya ji bo Şêx Adî nazir bûyî. Qala afirandina gerdûn, xweza û mirovan dike. Qala rêz û rêzikên ol û jiyana cîvakê dike. Ne kêmî her çar pîrtûkên din ên asîmanîne. Ev ji bi riya milyaketa hatiye xwarê û mizginî daye Şêx. Şêx qazîdê navbira cîvakê Êzda ye. Peywira mizgîniya Êzda û Mishefa Reş ragihandiye kurdan. Bi vê mizginiyê dixwast yekîtiya kurdan damezirine. Kurdan dibin banê ola Êzîditiyê de bike yek. Ramanên ola Şêx Adî ji rayên çand, nirxên kurdewariyê dihatin. Serkaniya ola Şêx Adî Zerdeştî bû. Ramanên Zerdeştiyê êl û hozên kurd dibin ala Medan de kiribûn yek û yekitiya kurdan li hember Asuriyan avakiribû. Vêca Şêx Adî dixwast bi ramanên Êzîditiyê kurdan bike yek netew. Rola pêxemberiya Şêxê mezin ev bû. Ev mizginî dida gelê xwe. Lê gelê wî hate leyîsk û gelemorên serweran ew wekî şeytan perest dipejirand. Li pêxemberê xwe derneketin. Gava Şêx bû pêşeng , serokê gel. Gel li derdorên wî kom bûn. Tirs kete dilê serwer,dijminên kurdan. Dest bi bangaşa reşkirina Şêx kir. Gotin Şêx ji êla emewiya ye û digihe mawiye. Neyarê ol , îman û pêxember e. Baweriyê bi şeytan diîne, ji bo xweda şirîka çêdike. Li ser van reş kirin , qirêjiyan kurdên misliman li hember Şêx kirin dîjmin. Kurdan bîr û bawerî bi gotin , bangeşeya serweran anî. Pêxemberê ku li Colemêrgê rabûyî ma bêpişt û bêhevkarî. Fars, Ereb û Tirkan li ser bangeşeya ola islamê ked û xebatên Şêx Adî vala derxistin. Kurd bi ola islamê xapandin û li hevdu kirin neyar. Bi hevdu dan kuştin. Nehiştin ola Êzdan bigihe armança xwe.

www.ezidivakurd.org

Yên bûyî Êzîdî bi darê zorê kirin islam. Ola Êzdan demildest fetisandin. Şêx Adî wiha dibêje ji bo kurdan.
Heqo tu padişah î
Xwedanê mêhr û mah î
Rezaqê cin û îns î
Xwedayê alema quds î
Mizgîniyê bibin Kurdistanê
Bilav ken deftera îmanê
Di vê helbesta xweda bang li yekîtiya kurdan dike. Deftera îmana Êzdan belav bikin an ku li dor ramanên êzdî kom bibin û bi rêxistin bikevin. Kurdan ev mizgînî fêhm nekir û li hember serihildan , li gel neyarên bav û dapîran tevgeriyan. Nezanin li pêxemberê xwe xwedî derbikevin. Kurdan wekî herdem bûn alîgirên goştfiroş û aliyê serwerên xwe girtin. Kurd bo xwe kosî girin û bo xelkê masî girin.
Şêx Adî sala 1162 li Colemêrgê çû ser dilovaniya xwe.

Çavkanî: Dîroka Wêjeya Kurdî, Feqî Huseyn Sagniç.
Dîroka Kurd û Kurdistan, Mihemed Emîn Zekî Beg.




www.ezidiyakurd.org

MEHMET DİNÇ

Bedro

Wergera ji Tirkî Mikaîlê Berbestê



Sedan sal e ev deşt, devera ku şervan li ser pişta hespên kihêl bi bayê bezê ji vî serî derbazî serê dî dibûn bû. Heman demê cihê kelekên Gilgamêş, Dariûs, Îskender û Derwêşê Evdî yên di nav tozê de mayî bû ev der. Çi qas navên nazdar ên wekî “Behr ‘ûn Nehreyn”, “Heyîvoka Adanî” lê bihata kirin jî, di kele germa havînê de wekî çol jî dihat binavkirin ev dever… Her çi qas navê zuhabûnê li xwe bikira jî bi hatina biharê re deşt vediguherî mêrgeke berfireh a giya têde zîqil didin.

Bi ahengiya rengê dewra xwe, Dem ew demê li ber şûtikê xençer, li ser milan tifeka kurmancî, debancên bi barûd û konên ji rîsên bizinan çêkirî yên mîna xêliyan dixuya bû. Demê talanê bû, her wiha demê nêçîrêkê bû ku mêrxwazên eşîrê bi ser de giritna di fecarekê de heywanên destxistine dane pêş xwe. Mirin û kuştin li ser qolincê bû; Ew çend rewa jî bû; ew çend wêrekî yan jî tol divêya bû.

Êl û eşîr hebûn...Heyf hilanîn li ser xizmê nêziktirîn ferz bû; qonax bi qonax bû dora heyf hilanînê; pêşî ji birayan dest pê dikir. Hekî bira nebe, ji pismaman, heke ew jî nebe ji pisê pismaman, ew jî nebe ji yekî din , ev yek bi vî awayî dom dikir, ev wezîfe taliya paşî digiha hinekan. Hekî yê kuştin kirî nejovan be, perê xwînê ne pejirandî be, Heçku bazek li ser deştê bifire lê digeriyan û wekî marmarokê xwe di qelşekê de veşartî dihat girtin.

Xwîn bi xwînê dihat paqij kirin.Wê hingê serbilind û çav zîq dibûn, cixare dihatin pêçandin. Bi vê yeke hêlma şênayiyekê di nav konên zomê de belav dibû.

Ji roja ku birayê wî hatî kuştin ve xew ne ketibû çavê Reşo. Ne diçû cem konên eşîran jî bi keriyê xwe re bost bi bost li wê deştê digeriya; Destek li ser demançê, destê dî jî li ser kalana xençerê bû. Ji teyrên difire, ji bayê , ji dînên li ser riyan, ji derwêşan, ji kerr û lalan, ji berdoşan, ji mirovên li ser bîrên ku avdaniya keriyan dikirin, ji her tiştî û ji her kesî pirsa Bedroyê ji eşîra Tayyê dikir; pirsa Bedroyê rêbir.

www.arsivakurd.org

Çaxa dibû şev, li ser kepeneyê di nêva keriyî de pehn kirî xwe dirêj dikir, çavên xwe zîq li asîmana mişt stêrk diçikiland. Paşê ji perdeyê çavên xwe yê ku li ser rûyê heyivê ketiye xewnan de dirûvê birayê xwe didît. Mirovekî gerdengaz bû birayê wî; dema diçû talanê xwe diavêt ser pişta hespên bilind ê kihêl, bi tifeka li ser sîngê xwe bewrarkî girêdayî ve , gurzeke bi her du destan nedihat rakirin bi destekî radikir û ew gurz li stûnên konan dixist û kon mîna zelzele çêbirî dibûn kavil. Kî rastî wî bihata efû nedikir, heta carnan kuştin jî dikir. Dawiya şevê çi tiştê xenîmet hemî radikir, ewrên toz girtî li pişt xwe dihêlan û li asoyê xuya dibûn ciwanmêrên eşîrê.

Reşo, ji cihê paldayî da xwe û rabû. Rexê pelê tutinê bi zimanê xwe şil kir; Piştre serê tiliyên xwe li simbelê xwe yê nû bereşe dayî ve bir û anî . Dûyê cixarê ji kerb û kûr, heçku şewta di dilê xwe vemirîne kêşa kezeba xwe. Êdî dilê wî dipispisand ku dîtîna Bedro nêzik e. Dizanî ku cih lê teng kiriye û bi pirsan gelik nêzîkî wî bûye. Debanca xwe dîsa li ber çavan re derbaz dike, bi pateyê rûndayî yê ji ber sîngê xwe derxistî rexên wê, lûleya wê paqij dikir.
Şev, şirîkê ser de girtinan bû. Wê kerî li vê derê bihişta û mîna leopareke sîpe li ser qelşên sînga çolê, li ber sihên ku şewqa heyivê nadiyê ve pêş de biçûya, li şkefteke dû ji rojneya wê dihat de wê Bedro asê bikira. Wê kumikê debancê bianiya xwar û bi tiqîna hêsinê re Bedro wê li debanca pişt serê xwe bihesiya. Piştre Reşo wê bigotayê: “Yê ku birayê min kuştî û pereyê xwînê nedayî tu yî ha!”...Paşê ji bo nîşana heyf hilanînê wê guhê Bedro bavêta nêva meydana zomê.

Bi çovê destê xwe pelên êgir têkve da. Dûyê fehmê ji xeteke reng gewr re ber bi jor hildikêşiya. Di dilê xwe de got : “ Vêca demê rabûnê ye.” Heyna ku çovê xwe bavêje nav xweliyê û rabe dengê tiqînê hat. Li ser partika xwe li cemdeyîya lûleyekê hesiya.
Berê xwe da Bedro. Ev cara ewil e ku kujerê birayê xwe ew qas nêzîk dibîne. Wekî gurekî pîr bû Bedro; rihê reş bi qewdê simbelî re bibû yek û porê wî yê bêhna çermê pezî jê dihat dibiriqî.
Tariya şevê pêşberî ronahiyê hêj bin neketî bû. Ew kêlî bû ku kuştin ji efûkirinê şêrîntir dihat mirovî. Bedro got “Ez ê niha te jî wekî birayê te bikujim Reşo, pê re jî ez ê keriya pezê te ji xwe re bibim.” û paşê hiş bû. Li çavê Reşo nêrî. Çavdiçûk bû yan ji tirsa welê hatibû nezanî.

“Lê heke te bivê em dikarin peymanekê bikin. Ji dêvla canê birayê te ezê te efû bikim; ji dêvla pereyê xwînê jî ezê keriyê te bihêlim ji te re.”

Reşo wê heynê re hizira tavê, stêrkan, gîskan, caniyan û evîniyê kir. Diya xwe ya şîna birayê xwe bi xweliyê li rûyê xwe re dayî...Paşê li sîpetiya xwe hesiya û lawazbûna zendên xwe dît. Li perpitîna sivik a dilê xwe hesiya. Bawer e zanî ku wextê wî gelik nîne, lew serê xwe ji bo erê kirinê jê re hejand.
Dema Bedro bi silehên desteser kirî ve dûr diket ronahî jî hêdî hêdî tarîtî diqewirand, berbang jî xwe kifş dikir.
Heke tu ji Reşo bipirsî , ew mîna sûlavekê di nav bê demî û bê mekaniyê de diherikî.Wê çi bike û ku ve biçe nizane êdî.

UMER BİNÎ XETTAB, YEZDÎCERD Û NEMEYÊN WAN



Wergera ji Tirkî; Seyfedînê Welekorî

"*Ev nameya hanê ya Împaratorê Sasanî yê sêyemîn Yezdî Cerd (Yezdî Kurd) e. Bersiva nameya Umer Binî Xettab e."*

Min xwest ku ez vê nameyê li vir biweşînim ku her kes bi hin heqîqetan agahdar bin…

Şahînşahê Împaratoriya Sasanî Furs(Fars) di hengama dema sêyemîn de ku gihîştibû asta herê jorîn Yezdî Kurd (Yezdî Cerd) ji Xelîfeyê misilmana Umer binî Xettab re nameya ku bi farisî şandîye wiha ye.

Ev name ji farisî wergera bi 'erebî Hawar Kemal, ji 'erebî wergera bi tirkî Mele Necmettin Santalu, ji tirkî jî wergera bi kurdî Seyfedînê Welekorî kirîye.

Wergera bi kurdî:

Yezdî Kurd (Yezdî Cerd) ê sêyemîn; Ji xelîfeyê misilmanan ê duyemîn Umer binî Xettab re.

Ez bi navê wî Xaliqê ku xwedî hêz û hikmet û Ahûra Mazda ye dibêjim ku te di nameya xwe de nivîsandîye.

Te em dawetî emr û fermana wî Xaliqê bi tenê, ku ew jî "Xwedê" ye jê re tâ'etê bikin, nivîsandîye.

Tê xuyan ku tu hêj negihîştî wê heqîqetê û hê jî tu wê rastîyê jî nizanî ku em kî ne û ji kê re ta'etê û îbadetê dikin.

Çi 'ecêb e ku tu li ser textê xilafeta 'ereban rûniştîyî di demeke wisa da ye ku eqlê te ji eqlê neferekî 'ereban cudatir nîne.

Tu di dîtiniya me da, û li cem me bi eql û me'rîfeta xwe, yek ji wan ferdên nîjaperestên serokê 'eşîreka 'ereban î.

Umerê kurê Xettab! Tu hêj nizanî ku gelê Furs(faris) bi hezaran sal berîya niha jî, ji yek "Xweda" yî re 'evdînî û îbadet dikirin.

Tu tê gazî me dikî ji bo îbadeta yek Xwedayî. Ji xwe em 'ibadetê ji yek Xwedayê bi tenê re dikin, em bi yek Rebbî bawerîyê tînin û ji yek Xwedayî re rojê pênc wext kunde (secde) dibin. Ev 'ibadet û ta'eta me bi sala ne bi vî karî berdewam dike.

Gelê me, bi sala ne ku em bi vî hawayî di nava ilm û irfanê de heşir û neşir bûne û zanîn û zanebûn senetkarî parçeyek ji jîyan û karê gelê Furs e.

Wextê em xwedî exlaqên qenc û hem mêvanperwerbûn, wextê me li dinê fikr û ramanên xweş belav dikir, wextê me bi mirovên li hemberê xwe re bi zimanê xweş xeber dida û muameleyên qenc me bi wan re dikir, we hêj ew çax maqîzerên çolê dixarin û we bihok û kêzikên li rûyê 'erdê dixarin, lewra ji xeynê van tiştekî ku we bixwara tunebû.

We zarokên xwe yên mehsûm yên bê guneh saxesax dikirine 'erdê. Ereba ji tu mexlûqî re hurmet nedidan nîşan. Hûn serê mexlûqatên Xwedê jê dikin heta hûn serê mirovên dîlgirtî (êsîran) di destê xwe da jê dikin.

www.arsivakurd.org

We zulum li jinan dikir, heta we ew jin mirov nedihesibandin. We keçên xwe bi saxî bin ‘erd dikirin, we rêya karwan û bazirganan dibirî, we rêbirî dikir, ew kesên ji xwe ra kar û şixul bikira we dikuşt malê wan ji xwe re dikire xenîmet; we dest didanî ser malê xelqê. Hûn dilkevir in dilê we bûye kevîr, lê em, em ji xerabîyên wiha û ji bêexlaqiyên wiha dûr direvin.

Wextê ku hûn ev mirov bin, çawa hûn me dawetê bal ‘îbadet û îrşada Xweda dikin? Hûn ê ku her cureyên xerabîyê dikin, ji min re dibêjin ji agirî serê xwe berjêr neke.

Em heskirina Xwedê di ronahîya tavê de û ronahîya tavê jî di rewneqa agir de dibînin. Tav û agir me dibe ser rêya heqîqetê û heqîqet jî me dibe kefşa gerandina wî Xaliqê Heq ku dilê me bi heqîqet û rî’ayeta emrê Xweda ye, ew jî pê dilê me geş û tije nûr dike. Lewra nûr û nar (Agir) şewqa heq û heqîqetê bi me dide tehmkirin û dilê me ber bi Xaliqê me ve dide rawestandin ku dilê me ronî bibe.

Dê ji bona ku em ji hev re rêzdar bin, û em hevudû hişyar û ronî bikin ku ji bona merhemeta me ji hev re berdewam be…

Ew Xwedayê me yê ku AHÛRA MAZDA’ye; hûn jî taze nû ewî nasdikin, ku we navê wî kirîye “ELLAH û EKBER” lê em ne weke we ne, em ji bona heskirin û muhebbeta navbera mirovan zêde be, ji beşerîyetê re rêz û hurmeteke zêde didine nîşan.

Ev bi sala ne derdê me ew e em heskirina li rû dinê bidine zêdekirin.

Û mexseda me ewe ku em li vê dinê çand û kultura xwe bidine pêşketinê.

Di ‘eynî wextê de jî em ji çand û hunera gelên din re jî rêz hurmetê didine nîşan.

Lê çi ‘ecêb e hûn bi navê Xwedê cî û war û welatan xirab û wêranêç dikin, ji bona ku hûn mirovan bikujin, li rûyê dinê li nêçîra mirovan digerin. Hûn me dikujin, hûn hinekên din jî dikujin. We feqîrî û belengazî û xizanî afirand, bi navê Xwedê we mexlûqatên Xwedê tirsandin û hûn talanîyê û tajanîyê dikin. Mal û milkên wan bi navê Xwedê desteser dikin, ma yê ku we ji bo qetlê kirye memûr ev Xaliqe?

Ma ev Xweda ye ku we kirîye memûr ji bo mirovan bitirsînin û mal û milkên wan desteser bikin?

Bi rastî hûn bi wî xaliqê ku navê wî "Ellah” he?

Bi navê wî ku hûn van tiştên rûreşîyê dikin gelo ew bi şana wî Xwedayî dikeve?


Hûn bi navê wî ji wê çola hişk û zuwa revîn hatin vira?

Hûn bi navê wî şer dikin, bi devê şûrê xwe hûn dersa heskirin û muhabeta Xwedê bi xelqê didine girtin?

Ji hezar salî berîya niha û vir de çand û hunera me hebû. Ka bêjine min; Ku hûn bi van şerên xwe va bi vê wehşete xwe va, bi van qetl û qetlîamên xwe va, bi navê “Ellah û Ekber” hûnê çi fêrî me bikin?

www.rojavakurd.org

Ka we çi fêrî misilmana kirîye ku hûnê çi fêrî me jî bikin?
Heta ku em jî ji wan hin tiştan fêr bibin,
dê li hemberê vê yekê, ka em ê ji wana çi tiştî fêr bibin? Ka hûnê çi bidine fêrkirin?
Niha jî hûn ji bo talanîyê û tajanîyê hatine van deran û bi hinekên din jî bidine hînkirin? Mixabin û sed mixabin ku niha hêzên me ji pêşîya hêzên we revîyane. Tişta ku ji gelê min re mayî îro di bin zordarîya şûrên ‘Ereban de ji wî Rebî re ji bil stuxwarkirinê tu çara wan tune.
Tişta ku ji te ra rewa dibînim, leşkerên xwe tovbike û vegerin li wê çola xwe. Yanê vegerin ew dera ku hûn lê dijîn. Ew axa we ya ku li wê derê tenê bi agirê dojehê ditirsînin. Ew cih û warê we yên ku hûn li wan deran tenê maqîzeran û kêzikan dikarin bidin belavkirin.
Ez li ser vê axa xwe ya bi xêr û bêr mafê jîyanê nadime we. Hûn ew kesên ku navê wan bi qatl û qutûlê, bi talanî û tajanîyê, bi barbarîyê û bi tirsandinê derketîye, Ev gelê ku navê Rebê wan ê pak û paqij bi talankerîya we qirêj nakim.
Ji wî halê xwe yê terorîstîyê vegerin, lewra heta niha ev gel dikarin qebhetên we qebûl kin, û ji bo we dikarin wek kirinên mêvantîyê tevbigerin. Wek me, hûn jî biçine kêderê tovê heskirinê û aramîyê bireşînin.
Xwesteka min ji te ev e di çola xwe de bimînin, nêzîkê mirovên şareza(medenî) nebin, lewra bawerîya te li ser tirsê û hovîtîyê ye.?
Yezdîxor ê Sêyemîn(Yezdîkurd) Yezdîcerd.
Ji farisî wergera ‘erebî, Hewar Kemal
Ji 'erebî wergera bi tirkî, Mele Nejbedîn Santalu,188-157
Ji Tirkî wergera bi kurdî Seyfedînê Welekorî:
Têbinî:
Her çiqas hin peyvên ku nelayîq bin jî, lê dîsa jî em ji bo wergerê re sadiq bimînin me tîp bi tîp wergera wî kirîye. Tu peyvekî wî di sera derbas nebûne. Em xwedî wî mafê ku dîrokê xirab bikin an bihaşivînin nîn in.
Her du belge jî di Mûzexana Londrayê de têne parastinê..



MERVAN SERHILDAN



SÛDWER İM EZ

Şero geh ji xwe re û di ber xwe de, geh ji derdora xwe re û bi tewkelî dipeyivî; geşedanên demê vedigotin, qewimînên ku bi baldarî dişopand geh bideng û geh bêdeng radigihandin. Carinan xwe bi xwe, carinan ji kes û kûsên hawirê re; lê bi piranî jî bi hişê xwe re diket nav şêwr û şîroveyan. Jê hebû ku kes pê nizane, jê hebû ku tu hestyar û gazinbarên wekî xwendevanên vê çîrokê, ne li ser şopê ne û ne dilzar in; jê hebû ku dê hemû kiryarên wî jê re bimînin...

Digot “Sûdwer im, lewra ardê bextê xwe bi destê xwe di bêjingê werdidim, çîroka dijberiyên xwe ez dinivîsim. Di naveroka serpêhatinên min de pirsnîşan nîn in gidîno; ma ez ê ji ber kîjan têkçûnên xwe kirasê sûcbariyê lixwekim, ma ez ê çawa kumê bêkêriyê di serê xwe kim; ma qey dibe ku ez ji xwe guman bikim? Lewma nahêlim ku destên benderuhên li hawirê bi sir û razên min bibin. Nahêlim, lewra xwezok û hesûd û dexesokên vî warî nig danaynin, çongan naşikînin, qûnçûçkî nabin, hişbûn û bêdengbûnê nizanin; sîran di serê devjihevan de diçînin û di nav şênî û nişтecihên herêmê de berbelav dikin, diricimînin. Ger xwe bi wan ve berdin, dikarin Şeroyên qedirbilind, li ser tilî û pêçiyan bizîzikînin û dikarin wekî pêkenînên civakê pênase bikin. Ma dibe ku ez navê têkçûnê li ser eniya xwe binivîsim û qad û meydanan ji neyaran re bihêlim; ma dibe ku di bin loda sosretên xwe de bigerim; ma ez ê çawa di nav dev û diranên fitne û fesadan de xwe bitemirînim, ma qey dibe?.. Na ezbenî, na; navê çîroka xwe jî ez ê bi lepên xwe deynim: Sûdwer im ez, sûdwer im ez, sûdwer im!..”

Ezgorî, çîrokin hene ku ji serî û heta binî deng û hesên girînê, hest û hevokên qêrînê radigihînin; serobin, temî û şîret in; tenê kesayetên ku ji hevrûbûnê natirsin dikarin lehiya hêstrên lehengan bivînin. Lewra êşên vî qewmî bêjimar in; xençerên ku di bedenê de çikiyane bi zengar in; şînên hezarsale li dera han in; rûreşî û bextreşiyên modernîteyê jî bi ser de hatin... Lê Xwedê şahid e, ev axa ku navê wê Kurdistan e, welatê kurdan e. Heta îro axînên vî warî ji tu kes, kom, qewm, êl û ezbetên dilreş re nemane: Xwe bistirînin! Ger hûn bi ber rê û dirbên şaş û qelaş ve dageriyane; vegerin. Ger hûn bi ser omîkên dagirkeran ve keliyane; tobeyê bînin. Ger hûn bi nav refên paralel ve pekiyane, bizanin û teqez ji bîr nekin; car heye ku hinek dildarên vê kêşeyê radibin eynika qamê didin ber kes û kûsên şeqitî û şeliqî, pozê wan difirkînin!..

www.arsivakurd.org

Li ser dikên heqîqetê hertim sêwî û guriyên gel jî dijîn dostino; ma qey ew jî şêwr û şîroveyan nizanin; ma qey ew ê terkîdinya bibin? Di cîhana herî bêdeng de jî hîsin hene, hestin hene, dengin hene; sir û razên nekifşbûyî hene: Xwediyên ew qarîn û zarînan berê xwe didin dîrokê û dipeyivin. Sewta awazên wan ji kana êşan dertê. Her kê li newayên sêwiyan guhdarî kiriye, heman têbinî anîne zimên: Digotin “Mirovin hene ku rastiya xelk û alemê berovacî dikin ne bes e, lê heqîqeta xwe jî serobin dikin. Hûn dibînin, Şeroyê mala Şado radibe û rûdine dibêje 'sûdwer im ez, sûdwer im'. Li ser axa welêt, tu dek û dolav namînin ku nagerîne; tu sêkaxid nîn in ku ne di bêrîka wî de ne, lê li me dêran e ku xwe jî ji qewmê xezalan dihesibîne. Nigekî wî bi payeya herî bilind li ser dîwana gel e, nigê din di potîna dagirker de ye. Devekî wî bi şoreşa azadî û serxwebûnê re ye, devekî wî jî bi baregehên dagirkeriyê re ye. Lê serê kêliyê û binê kêliyê dibêje 'sûdwer im ez, sûdwer im'... Di grevên birçîbûnê de qelew û stûr dibû, digot qey kes bi guman neketiye; di pêvajoya krîzan de asta meqam û mevkiyên bilindtir ji navenda partiya xwe werdigirt, digot qey tu kes û tu kurd bi dû vê sosretê nakevin. Îro jî, tu kîjan kevirên xwîner radikî, bi teşkên gumanbar ji binî dipengize, lê dibêje qey çavdêriya kurd bi heqîqeta hanê nahese... Gundîno malîno ev qewm, qewmê hewariyên mirovahiyê ye; tu kes nikare ji ber lome û nifirên vî qewmî bifilite. Vayê li hizûra yezdanê dilovan em bi hestên herî beloq qewl dikin; têkildarî sernavên çarenûsa vî gelî, em wek gurî û bêmiradên welêt nahêlin ku hew deqeke reş jî di tariyê de bimîne. Em li meqam û mewkiyên tu kesî jî nanihêrin; kê li ku û bi çi dirûvê bextreşî li vî qewmî kiribe, em ê kifş bikin.

Roj heye ku neviyên vî gelî naletê li hestiyên wan bibarîne. Bila soza me li ser kevirê dîrokê nivîsandîbe; em ê tevgerîna wan a paralel jî, jêrajor kifş bikin; bi kîjan navendên dagirkeriyê re xebitîbin û bi nixumandineke çawa rûreşî, sîxurî, çetekarî û kontrakarî kiribin, em ê yek bi yek veçirînin û ji qewmê pîroz re ragihînin; em ê bikin ku Rayber û Zeynelên vî welatî di gorê de jî nestirin... Navê vî welatî Kurdistan e! Ma dibe, hinek weqf û navendên ku di bin venêrîna dewleta dagirker de ne, rabin pî bidin piyên Şeroyan, hinek derhiş û bêhişên gêjok li dû xwe kaşkin û ziman, çand û hunera ev gelê mazlûm bihejînin, birişînin û riya destwerdana li hîmên qewmê kurd ji qirkeran re vekin? Ma dibe ku hinek bidik û çixzikên paralel rabin çapemeniya kurdî, neteweyî, Kurdistanî di çahl û hezazên bêbinî werkin?.. Ma dibe hogirno, ma dibe; hinek tîlik û tîşikên paralel ku di nîrê xençerkirina rêgezan de sersûc hatine zeftkirin, dîsa ji aliyê hinek tîlik û tîşikên din ên paralelên navendî ve bên şuştin û helalkirin û xelatkirin? Ey kurd, wergirtina asta bilindtir a paye û rayeyan, li hemû welatên cîhanê girêdayî serkeftinan e. Di çand û dîroka ev qewmê pîroz de jî, heman nirx heye, bel e, beloq e, diyar e.

Lê çawa dibe ku hinek kurdên paralel piştî şaşî, nebesî, têkçûn û bextreşiyên xwe jî bi awayekî bêperwa hildikişin ser kolana vî gelî?.. Kê, çima, çawa û bi kîjan hişmendiyê dest û nigên vî qewmî girêdane û îcar kê, çima, çawa û bi kîjan hişmendiyê kesayetên ku xisar û zirar dane vî gelî xelat kirine? Guhdarî bike ka ev newa û nalîn ji ku dertên, ey xwendevan û guhdarên dilbirîn: Hinek paralelan hin qadên berxwedana qewmê kurd têk birine, lê ji aliyê hinek paralelên payebilindtir ve hatine xelatkirin; hinek paralelên nav tevgerên kurd, bajarê pêşeng û Dewrêşên doh û îro Ruha, diyariyî partiyên pergalê kirine; lê ji aliyê hinek paralelên payebilindtir ve bi peywirên navendî û girîngtir, bi şabaşî û tilîlî hatine bertîlkirin?..

Ey dilzar û gazinbarên welêt, rabin û bibêjin, 'rûreşno, bextreşno, ji bîr nekin; sûda we, bêdengiya me ye! Bêdengî jî êdî nadebire, hêmin nabe, aş nabe; pirsan li ser pirsan dike. Ma dibe ku heqîqet di bin simên bêdengiyê de bipelixe, ma dibe; ma dibe ku Şeroyên vî welatî li stûyê me û we siwar bibin, di nav mij û moranê de? Divê heqîqet kifş bibe, divê ava vê golê zelal bibe, divê bext li şûna text rûne!..”

Got “Heheeyy, ez Şero me Şero; êla Ardo, hemû Çiyayê Mazîçol û Kevana Mastêrkê li pişta min e; ji xeynî ev dewleta dijwar ku Şero wekî çavê xwe diparêze... Min ji kurdên vê serdemê bi baran, bi lodan heskiriye. Şênber in, tavilê bawer dikin; çawaniyê bi çendaniyê rave dikin. Şeroyê ku di zarokatiya xwe de ji hemû hevalan kêmtir, kintir û hûriktir bû; Şeroyê ku her rojên Xwedê lêxistin dixwar, bêxêr û bêkêr dihat pênasekirin; Şeroyê ku bi dehsalan di bin kompleksa binikiyê de pelixîbû, ger ewqasî ne sûdwer bûya di partiya kurd a bi navê 'Ked û Palûte'yê (PARKEP) de ma wê çawa bibûya rêveberekî navendî, rayedarekî giştî, wekîlekî derasayî, plangerekî nixumî, aktorekî netewî...

Hema li ku derê dibêjim ez Şero me; kurd tavilê ditewin û dibêjin 'Ji navê te jî xuyaye ku tu çi egît û pêlewan î, li vê hizûrê tu çi dibêjî bibêje, nabe dudu, ew ê bi cih bê her tu çi bixwazî; lewra tu îradeya me yî!..' Kurdino, ger Şero dibêje ez sûdwer im, hûn zanibin ku bi dehan sedem di kefa destên wî de ne. Hewce nîn e ku em ji herkesî re hertiştî bibêjin lê ev dewlet qewîn e, dijwar e, bibiryar e, pî û baskên wê bêjimar e; biryara vê dewletê teqez e, derniqaş e û bêveger e: Ji qewmê kurd û dostên wî re eman nîn e, aramî nîn e, dahatû nîn e!.. Her çiqasî herkes bi vê ajandaya dewletê nizanibe jî, rastiya dagirkeriya Kurdistanê ewqasî beloq e! Ma dibe ku Şeroyê ji rovî û wawîkên Bagokê zexeltir, ji vê pahnavê bi hêsanî derbas nebe? Ma li ser vê dikê ji bilî hevkariya dewleta kûr, tu rê û dirbên cuda ji Şeroyan re dimîne? Madem serokatî bi rayedarên dewletê re hevdîtinên çareseriyê pêk tîne, ma ne pêngaveke asayî ye, Şeroyê ku kûpê aqil e navê xwe bi tîpên gir, stûr û dirêj li ser baregehên dewletê binivîsîne? Madem dagirkerî ewqasî dijwar e, diyar e ku elemanên bi kar tîne jî dê heta dawiyê biparêze; lewma dibêjim li ser vê erdnîgariyê tirsa Şeroyê Şado ji evdê beşer nîn e; lewra reel polîtîkê baş dizane, her ji hêzê re bejna xwe ditewîne, ji dewlet û dagirkeriyê re qametê tîne; serwerî li kîjan warî be, berê eniya wî jî li wir dinihêre... Em belasebeb nabêjin, heta ku ev dewlet weha li pişta Şeroyan bisekine, tu gurî û keçelên Kurdistanê nikarin xwe di paralelên nav Partiya Ked û Palûteyê deynin. Heqîqet ewqasî zelal e; her kî Şero nasnake, hay ji diyalektîka Rojhilata Navîn nîn e, hay ji dagirkeriya navneteweyî nîn e, hay ji dirûva mêtingehbûna Kurdistanê nîn e! Vayê ji bo mirovên aqilmend pir fesîh vedibêjim, bila herkes li gorî vê çendê bilebite. Heta ku ev dewlet li pişta Şero be, ji bo kesayetekî wekî min hêja û girîng; ma wekîltiya meclisa Tirkiyeyê qey pir e; ma li navenda Partiya Ked û Palûte'yê (PARKEP) rayedariya çandî, zimanî û ya rêxistinî, qey pir e? Ez li bende peywirên girîngtir im ezîzno; ji dewleta ku di navenda PARKEP'ê de bi awayekî paralel bi rêxistin bûye, çend hêvî û bendewariyên min hene. Ji kerema xwe re bila çend rojname, kovar û televîzyonên tevgera azadiya Kurdistanê, hew ji bo serdemeke weşanê bi min ve girêde û piştre bila li bavê felekê binihêre: Ez ê berbejna têkçûnên dîrokî bi kurdan ve bikim, ez ê çend weqf û elemanên din ên tarî zilomat, bi ser ziman û çanda kurdî ve seferber bikim!

Ez ê platformên nû yên paralel ava bikim û di derizînên nav tevgera kurd re, elemanên dewletê yên taybet dawerivînim; ez ê ji hemû peyayên paralel re deriyên derbasbûna nav mejiyê kurdan vekim... Ma çavsoriya ku ji dibistana seretayî û heta lîseyê li Şeroyan hatiye kirin, qey ewqasî hêsan e ku wê bêbersiv bimîne? Lêxistina li Şeroyan çi ye û ne çi ye, divê hemû kurd fahm bikin. Wateya peyva ku 'Bi danheviya xwe, bi çawaniya xwe û bi zanîna xwe Şero nikare gelê kurd temsîl bike' jî li ber dilê min berdewama heman çavsoriyê ye; her kê gotibe û her çiqasî xwediyê payeyeke girîng be jî, li ser vê axê ji dewletê qewîntir kes nîn e; lewma, divê ev êrîş vala derkeve û divê herkes jî bi vê pêvajoyê bihese, hemû welat agahiyên aqûbeta vê pêvajoyê bajar bi bajar û navçe bi navçe wergire... Hertişt berbiçav e, hemû çavdêr hunera Şero bi çavên seriyan dibînin ku dikare çend teqleyan li ser hev bide, lê kurdên ku vê rastiyê nabînin jî, bila di curmên xwe de birizin, kom bi kom û qefle bi qefle. Her kîjan kurd ji rastiya hanê digazine; bila ji zindan û goristanan yekê bineqîne!.. Haaa, her kî vêya naxwaze; êêê ji Xwedê ve xuyaye: Şero dibêje krîzên dil hene, jehrîbûna bi xwarinan hene, qezeyên trafîkê hene; ji bilî guleyên ku di belegoştkan re difirin; ma çi hene û çi tune ne... Sûdwer im ez, sûdwer im ez, sûdwer im!..”

Gotin, “Heta vê rojê jî em tê negihîştibûn ku birîn ewqasî xedar e, lê vayê êdî xwediyê kêşeyê bi rastiyê dizane; gundî û malî bi dizan hesiyane. Ev çim û çengên pirsnîşanan di cihê xwe de ranawestin, hêminiyê nizanin, di kêliyeke jiyanê de wê rojekê rûpoşên tarî û nixumî biçirînin. Em wek sêwî û belengazên vî welatî, ji dîroka xwe ya qedîm binê çend têbiniyan dixêzînin: Divê em sî, sîluet û azametê li wiyalî deynin û tenê bi stûna heqîqetê bigirin, tenê li ser xeta rêgezan bimeşin. Divê em dev ji sirûd û sloganên ajîtatîf berdin, geşedanên rasteqîn bikin parametreyên rêwîtiya xwe. Divê em dilsoziya bi feraseta gelê xwe re di ser hemû berjewendiyan re bigirin. Divê em kes û komikên ku ji Şeroyan pêk tên di nav çirava wan de bihêlin, lê em pêşiyê li xerabûn û kurmîbûna civaka kurd bigirin. Divê em berî her tiştî feraseta pêşeng û rêberên gel bikin finda têkoşîna xwe...”

Ezgorî, çîrokin hene ku ji serî û heta binî deng û hesên girînê, hest û hevokên qêrînê radigihînin; serobin, temî û şîret in; tenê kesayetên ku ji hevrûbûnê natirsin dikarin lehiya hêstrên lehengan bivînin. Lewra êşên vî qewmî bêjimar in; xençerên ku di bedenê de çikiyane bi zengar in; şînên hezarsale li dera han in; rûreşî û bextreşiyên modernîteyê jî bi ser de hatin... Lê Xwedê şahid e, ev axa ku navê wê Kurdistan e, welatê kurdan e. Heta îro axînên vî warî ji tu kes, kom, qewm, êl û ezbetên dilreş re nemane: Xwe bistirînin! Ger hûn bi ber rê û dirbên şaş û qelaş ve dageriyane; vegerin. Ger hûn bi ser omîkên dagirkeran ve keliyane; tobeyê bînin. Ger hûn bi nav refên paralel ve pekiyane, bizanin û teqez ji bîr nekin; car heye ku hinek dildarên vê kêşeyê radibin eynika qamê didin ber kes û kûsên şeqitî û şeliqî, pozê wan difirkînin!..

KEYHAN MİHEMEDÎNİJAD



NEWROZ

Newroz Kevintirîn Hilkefta Mirovahî di Zagirosê De Ye.

Min di vê gotarê de hewil daye bi awayek berfireh li ser gelek mijaran lêkolînê bikim û bi çendîn lêkoleran re hevpeyvînê bikim û di vir de bi rohnî behs bikim. Lê divê em destpêkê li ser vê yekê behs bikin ku Newroz çî ye û li kuderê ve hatiye?

Newroz kevintirîn, mezintirîn û girîngtirîn cejna tev mirovayetiyê di Rojhilata Navîn de e û ev cejne jî, her ji destpêkê ve li Kurdistanê serî hildaye û belavê cîhanê bûye.

Hilkeftek ku bo gelê Kurd gelek girîng e ku her sal li demsala Buharê, dema ku befr dihele û gul derdikevin û hêvî di dilê mirovan de geş dibe tê cejinkirin û yek ji girîngtirîn hilkeftên dîrokî tê hesibandin.

Ev hilkefta jî cejna Newrozê ye. Newroz hevwateya vejîn û roja nû ye û gelê Kurd hemû salê li 1`ê meha Kurdî wate yekem roja Buharê wek nûbûna surûştê cejna Newrozê bi rê ve dibe.

Tê zanîn ku di demên berê de Newrozê kultûrek mezin hebûye ku ev jî hemû hilkeftek girîng li xwe girtiye û her hilkeftek girîng hebaya di roja Newrozê de dihate birêvebirin.

Lê ev hilkefte bo gelê Kurd gelek girîng e çimkî dîrokek dûrûdirêj heye û gelek dîroknivîs dibêjin desthilatdariya “Mad” a gelê Kurd gelek pêş dîroka Zayînî de û di yekem roja meha yekem a Buharê de axa Kurdistanê di bin desthilata Asûriyan de rizgar kiriye û cejin girtine û jê re gotine nûroj an jî rojek nû. Hin dîroknivîs û lêkoler dîroka vê hilkeftê vedigerînine li ser 4 hezar sal berî niha.

Min di hevpeyvînekê de ji Lêkoler û Nivîser “Zeynelabidîn Zinar” û Lêkoler û Şarezayê warê Dîrokê “Hadî Ezîzî” pirsî dîroka Newrozê vedigere bo çi serdemekî?

Di bersivê de “Ziynelabidîn Zinar” daye zanîn: “Dema ku em behsa 21`ê Adarê dikin, xelk dibêje cejna Newrozê ye, ev ne cejna Newrozê ye û ev cejna rizgarkirina netewa Kurd e; Dema ku împaratoriya Madan axa xwe di bin destê împaratoriya Asûriyan de rizgar kiriye, vê demê gotine me rojek nû bi dest xist, yanî roja azadiyê. Îcar li her derê agir pêxistine û bi xelkê xwe dane zanîn ku em di bin destê împaratoriya Asûriya de rizgar bûn. Dîroka vê yekê vedigere li ser sedala 6an a pêş Zayînê.”

Her li ser vê mijarê “Hadî Ezîzî” jî got: “Mirov dikare bi du beşan de behsa dîroka Newrozê

www.arsivakurd.org

bike ku ya yekem, Newroz zêde bi nûbûna surûştê tê nasîn û rîşeya wê vedigere li ser olên wek Mîtra, Êzidî û Yarisan, û mirov dikare di beşa duyem de wiha behsa vê bike ku ev jî, li sal 612`ê a pêş Zayînê de Kurd bo cara yekê desthilatek bihêz ava dike û Asûriyan rastî şikesê tîne ku rêkevta serkevtina Madan rast dikeve yekem roja Buharê de."
Min li ser vê mijara girîng û dîroka vê hilkefta kevnar a gelê Kurd digel mamoste "Mewlûd Îbrahîm" Mamosteyê Zanîngeha Selahedîn a Hewlêrê hevpeyvînek kir û nerîna navbirî li ser dîroka Newrozê cuda ye û ev dibêje dîroka Newrozê vedigere li ser 12 hezar sal berî niha û navbirî vê cejnê vedigerîne li ser zîndîbûna "Demozî" yê Xwediyê Someriyan.
Navbirî dibêje: Newrozê dîrokek kevn heye û gelek kesê behsa Newrozê kirine û her yekê rêkevtek bo vê hilkeftê dîyarî kirine, lê çimkî Newroz bixwe kevn e, tevlî hemû ev dîrokên piştî xwe bûye; Di rastî de Newroz li sersala "Somerî" ku dike roja zîndîbûna "Demozî" û pêka ola Someriyanî roja yekem a Buharê ye ku heman ev roja yekem a Buhara Someriyan dike roja yekem a sala Kurdî, û dibe roja yekem a meha Newrozê; Lê dem û rêkevta vê vedigere li ser vê yekê; piştî vê ku Demozî li 1`ê meha 7 diçe bin erdê û li 1`ê meha yekem a sala nû zîndî dibe, û ev zîndîbûne dibe cejnek mezin û ev cejne, cejnek surûştî, olî, felekî, werzêrî û kultûrî bûye û cejna mezin a Someriyan bûye; Ev hilkefta jî li serdemê serhildana çandiniyê de bûye. Hemû lêkor vê hilkeftê wate cejna Newrozê dizavirînine bo ser 10 hezar sal berî Zayîn de ku dike 12 hezar sal berî niha".

Newroz û ola Mîtra

Gelek dîrokzan jî, li ser vê bawerê ne ku Newroz ji ola mîtra ve bo gelê Kurd maye. Lê her wek lêkoler Zeynelabidîn Zinar û Hadî Ezîzî dibêjin, ev hilkefte ti pêwendiyek bi ola Mîtra ve nîne û tenê ji nûbûna surûştê ve hatiye û pêwendî bi ti olekê ve nîne, lê tev olan jî di Kurdistanê de ev hilkefta kevnar ya Kurdewarî parastine.
Di vê derheqê de min ji "Hadî Ezîzî" pirsî gelo Newroz ji ola Mîtra ve hatiye ku oleke kevnar a Kurdî ye? Navbirî wiha dibêje: "Her wek piraniya hilkeftên wek Çileya Havîn, Çileya Zivistan, cejna Xerman, cejna çandin û dirûnê ku kevntirîn hilkeftên Kurdî ne, Newroz jî wek wan hilkeftan gelek kevnar e û mirov dikare bêje ku ev hilkefte jî wek hilkeftên kevnar ên Kurdewarî di serdema Mîtra de girîngî pê hatibe dan, lê di rastî de ji surûştê ve hatiye û ji ola Mîtra ve nehatiye".
Lêkoler û Nivîser "Zeynelabidîn Zinar" jî dibêje: "Têkiliya Newrozê bi ti ola ve tineye, ol tiştek cuda ye û pîrozkirina Newrozê jî tiştekî cuda ye, û ti têkliya vê hilkeftê û ola Mîtrayê bi hevdu re tineye".

Zuhak û Kaweyê Hesinkut

Dîroka gelê Kurd bi sedema nebûna desthilatek serbixwe yan jî şewitandina tev belgên dîrokî yên kevnar ên Kurdan ji aliyê dagîrgerên Kurdistanê ve gelek bi çewtî ji aliyê dagîrkerên Kurdistanê ve hatiye nivîsandin û yek ji wan jî, çîrok an jî biserhatiya Zuhak û Kaweyê Hesinkut e. Ev çîroka ji aliyê dujminên Kurdan ve bi şaşî hatiye nivîsîn û şibhandine bi cejina Newrozê, lê nivîser û dîroknivîsên Kurd dibêjin ti pêwendiyek wan herdukan bi Newrozê ve nîne û Newroz bixwe kevn e û digel dîrokê hatiye û tevlî hemû bûyerên dîrokê jî bûye.

Min dîsan ev pirsiyare axo çîrok an jî biserhatiya "Zuhak û Kaweyê Hesinkut" pêwendiya wan digel Newrozê heye? li lêkoleran kir û di berdewamiyê de Zeynelabidîn Zinar wiha bersiv da:
“Zenyenabidîn Zinra”: “Di dîroka Kurdan de gelek tişên şaş hatine nivîsandin û bi Kurdan dane qebûlkirin, yek ji wan jî, çîroka Zuhak û Kaweyê Hesinger e. Dibêjin Zuhak qiraleke Ereban bûye; Bila di destpêkê de ez wiha bêjim, di rastî de Ereb bixwe koçer in û ji Afrîqayê ve hatine vê axa ku em jê re dibêjin Erebistan û li gund û bajaran de belav bûne û ti desthilatiyek wan ku qiralek wan çê bibe tine bûye. Lê dibe ku şexsek bi navê Zuhak li deverê derkevtibe û kesek zilmker bibe û kesek jî bi navê Kawe derkevtibe û ev kuştibe û ev yeka tişek gelek normal e. Lê ti elaqeya Newrozê ne bi Zuhak ne jî bi Kawe re tine ye. Meseleya Zuhak wiha hatiye û dibêjin ew kesek zalim bûye û du mar li ser milê wî hebûne û xwarina wan maran jî mêjiyê xortên Kurdan bûye û piştre ev xortên ku serê wan jê nekirine şandine aliyê çiya û piştire ew zêde bûne û wek Kurd û wek milet derkevtine holê! Ev yeka neheqiyek pir mezin e li Kurdan hatiye kirin û ev yeka çewtiyek gelek mezin e li dijî Kurdan tê gotin û ji bona ku Kurdan biçûk bikin û wan miletek bê bingeh û bê esas bidine nîşandanê û çîrokên wiha li hevdu anîne û çîrokên wiha gelek hene ku li dijî Kurdan hatine nivîsandin. Di rastî de li nav împaratoriya Medan de ji “valî” yan parêzgar re digotin “Kawe”. Ti elaqeya Kawe û Zuhak û Newoz bi hev re tine ye”.
Mamoste Mewlûd Îbrahîm jî wiha dibêje: “Rêkevta çîroka Zuhak û Kawe dizavire 600 yan 700`ê berî Zayînê, lê Newroz dîroka vê vedigere li ser 12 hezar sal berî niha, lê Newrozê ev şiyane hebûye ku xwe digel hemû bûyerên mezin têkel bike û di demên berê de her bûyerek biqewima rêk dixistin digel roja Newrozê û di vê rojê de cejna hilkeftên xwe digirtin û ti pêwendiyek Zuhak û Kaweyê Hesinkut bi Newrozê re nîne.
Nerîna “Hadî Ezîzî” jî, her wek lêkolerên din e û ev dibêje: “Di dîroka kevn a Kurdewarî de Kawe pêk hatiye ji hêzeke xelk ku şerê desthilata Asûriya kiriye li hember “Aza dihak” ku ev nave ji çendîn navên din yên wek “Dihak, Dehyû, Dehyako, Duhok” tê û hem bi wateya fermanrewayî û hem jî wateya desthilatdarî tên. ku wisa ye Kurd li dijî desthilata Asûriyan derkevtin û serkevtin bi set xistin û ev yeka ji aliyê Farsan ve bi çewt hatiye nivîsîn û ti pêwendiyek wan û Newrozê jî bi hev re nîne.”

Ferdosî û Şahname

Ferdosî helbestvanê Fars ku di sala 994`ê ya Zayînî de şahname dawî pê aniye, li vir de behsa çîroka Zuhak û Kaweyê Hesinkut kiriye û Zuhak bi kesek har û dirinde daye nasîn ku du mar li ser milê wî bûne û xwardimeniya wan maran jî mêjiyê ciwanan bûye û Kaweyê Hesinkut jî Zuhak kuştiye û ew serkevtine di yekem roja Buharê de bûye û bi sedema serkevtin bi ser desthilata Zuhak de cejna Newrozê lidar xistine. Hin dîroknivîsên din jî dibêjin Kawe hilkefta Newrozê bi derfet zaniye û di Newrozê de Zuhak kuştiye. Li ser vê çewtiya dîrokê min ji lêkoler û nivîseran pirsî, pêka şahname, em çiqas şahidê vê yekê ne ku Farsan hewl daye vê hilkefta Kurdî bikin ya xwe?

Zeynelabidîn Zinar dibêje: “Ne tenê Ferdosî nivîsiye çewtî ye, mesela tê bîra min hikûmeta Tirkiyê di salên 70 û 80`î de, bi hezaran xortên Kurdan ku agirê Newrozê bi şev pê xistine, ceza dane wan û heta tê bîra min li bajarê Mîdiyadê lawikek 14 salî bi 14 salan ceza da, temenê wî 14 salî bû ku 14 sal ceza da, îcar a niha Tirkiye behsa Newrozê dike û dibêje ev hilkefte ya me ye; Gelek netewên din jî di Rojhilata Navîn de hene ku dibêjin Newroz ya me ye, îcar eger tiştek bê xwedî be her kes jê xwedî derdikeve. Gotinek Kurdan heye ku dibêje pezek li çolê bimîne Guraxwarî ye, yanî bê xwedî be û şivanê vê tinebin, dibe xwarina gurran. Îcar dema ku Kurd li Newrozê xwdî dernekevin, helbet dê xelkê din jê xwedî derkeve, û meseleya Ferdosî û Farsan jî ev e. Carekê ez vê yekê jî bêjim, jixwe Fars miletek bîhanî ye hatiye vê axa ku îro bi navê Îran tê naskirin, Fars ji Hundistanê hatine û girûpek hejar û belengaz û şeperze bûne û hatine nav Kurdan û pars kirine û Kurdan ji wan re gotine parsek parsek û piştire navê wan bû Pars (Fars) û împeratorî çê kirin û îro di holê de wek dewleta kevnare têne naskirin”.

Mamoste “Mewlûd Îbrahîm” jî wiha dipeyve: “Ger mirov tê Meseleya Zuhak û Kawe ya ku şahnameya Ferdosî behs dike hûr bike, ji dîtingeheke Farsiyan ve Newrozê dibînî û paşayê Kurd dike bi paşayek zalim û naşîrîn û Kawe jî tîne û bi Fars dinasîne, ev yeka rast nîne. Lê her neteweyek mafê wê ye ku bûyereke girîng a dîrokî ku rehendek çîrokî û hemasî hebe, bo xwe bi şêweyê xwe bikar bîne, eva destkariyek dîrokî ye. Hîrodot behsa desthilatdariya “Mad” dike û dibêje, dema ku Koroş hatiye desthilata Madan rastî şikestê aniye, paşayê Madan yek ji kesên baş bûye. Ku wisa ye, ya ku şahname behsa vê yekê dike ku şahê Kurdan bi mêrek zalim û du mar li ser milê wî dide nasandin, direw e û dûr ji rastiyê ye. Di dîrokê de tiştek heye, dema ku di serhildanan de kesek aliyekê bi dijî xwe nas bike, wêneyek naşîrîn lê dirust dike. Bi vî awayî Ferdosî jî wêneyek naşîrîn ji paşayê Kurdan dirust kiriye û behsa zalimya wî dike, mixabin beşek ji Kurdan jî, vê çavkaniyê bikar tînin. Lê ti pêwendiyek wan bi Newrozê ve nebûye”.

“Hadî Ezîzî” jî dibêje: “Ger em bixwazin li destpêkê vê yekê rohn bikin, hizir û dîtingeha hemû takek Kurd li ser Newroz û Kawe, vedigere li ser şahnameya Ferdosî, lê divê em bizanin ku axo şahname û deqên wê ku paşê wek helbest tê de hatine, bingeha wan deqan axo bi mîrat hatine wergirtin yan jî diziyane? Carê wisa heye mirov di dîrokê de mijarek, çarçêveyek an jî hevşêweyek di dîrokê de bi mîrat werdigire, lê wergirtina komek çîrok yan biserhatî li deverek cuda ku cugrafiyaya wê ya Fars nebûye û hatiye wergirtin û paşê kirine Farsî, eva rêk di çarçêveya şahnameyê de tê xuyakirin. Bo dîroka pêş şahname û ev çîrokên ku di şahnameyê de hatine, divê me çend dîtingehek taybet hebe; Herçiqas em bêjin Ferdosî şareza yan neşareza ye, çend şaşiyek kiriye ku ev şaşiyane xwediyê bingeha rastiya dîroka vê yekê ye ku cugrafiyayekê diyarî dike. Bo mînak; Li vir behsa dîcleyê dike. Dicîle axa Kurdistanê ye. Yan jî ev li vir de behsa Zuhak dike, ku dibêje 800 sal temen kiriye! Direw e û tiştek wisa nîne. Bi nerîna min 800 sal behsa jinavçûna fermanrewaya Asûriyan e li ser Rojhilata Navîn de ku zêdetir ji 1000 salê temen kiriye. Ya ku bo me derdikeve ev e ku pêş Ferdosî de jî ev çîrokane di nav axa Kurdistanê de bi şêweya xwe ya rast hatibûne behskirin û ne wek ya Ferdosî. Ku wisa ye çîrok an biserhatiya Kurdan ji Kurdistanê bo devera Ariya yan Hariya ku niha bi Xurasanê tê nasîn hatiye veguhastin.

Meseleyek din li ser Zuhak: Peyva mar di nav Kurdan de peyvek pîroz e, wek Xişûk, çîroka Şamaran, mar di ola kevn a Kurdewerî de, li metolojiya keştiya “H. Nûh” de ku li ola Êzidî de maye ku keştiya “H. Nûh” li ser çiyayê Şengalê kun dibe û marek reş xwe dike wê kunê de ku keştî nuqim nebe û heta digihe çiyayê Codî, û eva beşek e ji wan efsaneyan di çîrokên Kurdî de, û ya hemûyan girîngtir peyva mar di zimanê Kurdî û li êtomolojiya zimanê Kurdî û pêka dîrokê ku behsa vê hatiye kirin, û ji mohrên borî yên serdemê Somera kevn heta derbasê serdemê Mîloloyî û Mîtanî û dewleta Manayî û Madî dibe û bo me derdikeve ku mar nîşaneya hêz û desthilat e, û kesekê ku mar nîne û bê mar e nexweş e û desthilat nîne wek “demar, tîmar” û heta mar bo nav beşa pizîşkî jî hatiye veguhastin, wek logoya zanista pizîşkî di îro de bikar tê, çimkî pêk hatiye ji tîmarkirinê. Rîşe û bingeha yên ku hatinî behskirin di nav dîroka Kurd de heye. Îcar ev bo vê ku bên rûmeta mar naşîrîn bikin, tên dibêjin Zuhakek hebû ser milê wî du mar hebûn û mêjiyê wan xwarina ciwanan bû û…hwd. Ev yekane hemû xeyal in û xwestine dîroka neteweyekê ku bixwe desthilat nîne binivîse çewt dikin. Meseleyek din jî eva ye ku tu were çav ji bêkesiya netewa Kurd bike, divê “Ehmedê Şamlû” helbestvanek Fars rabe, bibe dîroknivîs bo neteweya Kurd, û bêje Kaweyê Hesinkut caş e. Her lewma bûyerek navxweyî ya netewa Kurd ti pêwendiyek bi Fars û Rojhilata Navîn re nîne. Di heqîqet de şahname guherinkariyek dîrokî ye piştî kevtina hikûmeta Sasaniyan. Her lewma şahname bi çarçêveya darêtina vê û çîrok, tev helbest û xwedê naverok, heqîqet û matriyala naveroka vê ti pêwendiyek bi dîroka Fars re nîne, çimkî 130 sal berî wî “Ebû Henîfeyê Dînewerî” di “Exbar û Tewal” de li ser Kurdistanê behs kiriye. Ku wisa ye şahnameya Ferdosî bi tevahî çewtiya dîrokê ye.”

Girîngiya Newrozê di nav folklora Kurdî de

Tevî vê ku Kurdistan ji aliyê welatên koloniyalîstî ve hatiye dagîrkirin û tevahiya hewla wan welatên dagîrker asmîle û helandina gelê Kurd e, lê bi kêfxweşî ve wêjeya devkî ya gelê Kurd nehatiye helandin û her wêjeya devkî ya gelê Kurd e ku gelek girîngî bi hemû hilkeftên girîng ên wê netewê daye û di nav wêjeya devkî ya Kurdan de gelek behsa Newrozê hatiye kirin û gelek helbestvanan ev hilkefte anîne ser ziman, tevî wêjeya devkî di nav wêjeya nivîskî de jî hatiye û mînaka vê yekê çîroka mem û zîn a Ehmedê Xanî ye.

Li ser vê mijarê jî, min ji hin Lêkoleran pirsî, di wêjeya devkî û folklorî ya Kurdî de çiqas girîngî bi Newrozê hatiye dan û bas kirine?

“Ziyenelabidîn Zinar” bersiva pirsa min wiha anî ziman: “Îro em dirênin di gelek helbestên Kurdiya Kurmancî de behsa Newrozê hatiye kirin, û piranî li ser meselên eşqê hatine, mesela evîndar ji keçika ku jê hez dike û bang dike û dibêje, “îro cejn û sersala Newrozê ye, were em kêf bikin wiha û Newroza te pîroz e”. Lê belê di wêjeya devkî de Kurdan zêde zêde girîngî dane Newrozê û cejna vê hilkeftê. Di helbestê Ehmedê Xanî de jî behsa Newrozê hatiye kirin.”

“Mewlûd Îbrahîm” jî wiha dibêje: “Baba Tahîr Ûriyan di helbestên xwe de behsa Newrozê kiriye û wî di helbestek xwe de gotiye, rojî geyştinî min bi yar, wek şevî newroz xoş û pîroz e.

www.dersnakurd.org

Piştî navbirî eger mirov tê mêze dike Melayê Cizîrî jî behsa Newrozê kiriye, lê yê ku di nav helbestên xwe de gelek girîngî bi Newrozê daye, Ehmedê Xanî ye, ku navbirî di Mem û Zîn de dibêje ku hemû xelk di roja Newrozê de diçine derê û Mem û Zîn yektir dibînin û gelek mijarên din aniye ziman. Mixabin me heta niha bi vî awayê ku Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de behsa Newrozê kiriye, girîngî pê nedaye û me tenê evîna vê behs kiriye. Divê em bên Newrozê ji dîtingeha Ehmedê Xanî ve mêze bikin û girîngiyê pê bidin."

Bandora Newrozê li ser piroseya netewesazî

Ev hilkefte nasnameya gelê Kurd e, Newroz yek ji hilkeftên bingehîn a xebat û şoreş û nasnameya gelê Kurd e. Di nav birêveçûna cejna Newrozê de gelek nîşaneyên netewa Kurd têne parastin û gelê Kurd bi awayek folklorî vê hilkeftê lidar dixe. Her lewma yek ji hilkeftên kevnar ku wek şaristaniyetekê hate nav gelan de Newroz e û eva jî pênaseya gelê Kurd û yekemîn neteweya xwedan şaristaniyet dide nîşan.
Ez li ser pirsiyarên xwe berdewam bûm û min di derfetek din de ev pirsiyare ji lêkoleran kir. Birêvebirina Newrozê û parastina vê hilkefta netewî, çiqas li ser nasnameya Kurdî bi bandor e?
Lêkoler û Nivîser "Ziynelabidîn Zinar" li ser vê yekê wiha dibêje: "Eger ez û tu û yên din li vê hilkeftê xwedî derkevin bi bandora vê eva ye, bo mînak bandorê li ser zarokan û ciwanan û dadinê, û ger em jê xwedî dernekevin ev jî vê yekê nizanin. Mesela Kurdên me îro rojê li welatên Ewropayê nêzî du milyon zêdetir in, û piraniya wan jî kesên zana û xwendevan in, lê dema ku ev Newrozê pîroz dikin, diçine salonan û vê yekê pîroz dikin, ez daxwazê ji siyaset, komele û xelkê me dikim ku çûna salonan li nav xwe de derxînin û li derveyê salonan û bi hev re û bi nîşaneyên me yên Kurdî vê hilkeftê cejin bigirin."
Mamosteyê Zanîngeha Selahedîn a Hewlêrê, "Mewlûd Îbrahîm" jî, wiha li ser vê pirsiyarê diçe: "Madem bi dîrokê re hatiye selmandin ku Newroz kevn e û ya Kurdewarî ye û di Kurdistanê de serî hilda ye, û ev cihê ku Demozî 6 mehan diçe bin erdê û paşê tê de zîndî dibe, ev bajarê kevnar ê "Derînkuyê" yê Bakurê Kurdistanê ye ku bajarek bin erdî ye ku 8 qat di bin erdê de ye ku eva rêk digel çîroka çûna bin erdê ya Demoz û Eştar digunce, ku wisa ye em dikarin ev cihê kevnar ku bi tevahî digel çîroka Demoz tê guncandin, bikin bi cihek girîng a Newrozî û ji Şareder ve dest pê bikin heta ku digihîje bajarê Hewlêrê û li vir heta Bêstansor. Çimkî ev cihwarane bi tevahî rehendeke dîrokî hene û em dikarin bikin bi xalek girînk a cihwarî û cihê birêveçûna Newrozê ku xelk ber bi wan deran ve bên û eva hem di warê netewî û hem jî aboriya Kurdistanê bi bandor e."
"Hadî Ezîzî" jî li ser vê mijarê wiha dibêje: "Nasnameya Kurdî bo vê ku bixwaze bi başî xwe şirove bike, bo vê ku bixwaze xwe li astê dirindeyan û dagîrkeran û yên ku Kurdistan dagîr kirine xwe wek hebûna rastiya Kurdbûn îsbat bike, tev ev pîroziyên ku şiroveya vê nasnamê dikin, divê hemû bi şêwazek gelek ciwan û karlêkerî û berfireh şirove bo bê kirin û kar li ser bê kirin û di dema xwe pîroz bê ragirtin, û Newroz yek ji wan nasnameyan e."

Newroza kevn û ya serdema nû

Newroza kevn û ya serdema nû heta astekê guherinkarî bi ser de nehatiye û mirov dikare bêje ku bi xweşî ve gelê Kurd ev hilkefta kevnar û dêrîn parastiye û nehêlaye guherinkariyek wisa bi ser de bê û herçiqas pêşkevtina teknolojiya jî, nekariye bandorek wisa li ser wê hilkeftê hebe û berevajî bo nasandina wê hilkefta Kurdî bi raya giştî re gelek bi bandor bûye.
Min hewl da ez li ser vê guherinkariyê jî, digel lêkoler û nivîsern bipeyvim û min ji wan pirsî; Newroza niha û ya kevn a Kurdewarî çi cudahiyek van bi hev re heye? Axo guherinkariyek wisa li ser xwedî navê vê an jî hilkefta vê de hatiye?

Mewlûd Îbrahîm: “Teb`en Newroz bi vê dîroka dûr û dirêj hin guherinkarî bi ser de hatine, lê çend tiştek vê nehatiye guherîn. Yekem: Rêkevta vê ye an ku roja birêveçûna Newrozê nehatiye guherîn, û her ev roje ye ku 12 hezar sal berî niha hebûye. Duyem: Agir ku di Newerozê de hebûye, her heye û heta niha jî berdewam e. Sêyem: Meşa şahiya Newrozê heye û her wek xwe maye. Lê hin tişt diguherin, bo mînak navê Newrozê li dema Someriyan “Zegmek” bû, lê gelek navê din danîne ser. Bo mînak Zegmek bûye û di dema Sasaniyan de jê re gotine “Nûkroj” yanî roja nû û bi sedema vê ku berfireh bûye û ji sînorê Kurdistanê çûye derê bo welatên wek Çîn, Misir, Hind û gelek cihên din ên diniyayê de belav bûye, her yek ji wan welatan navekê bixwe li ser dadinê. Lê di niha de Newroz bo Kurd bûye remzeke netewî, eva Kurd e li tev cîhan de bo agirê Newrozê qurbanbî daye, ku ti miletek din ev yeka nekiriye. Eva Kurd e ku bi xwîn Newroz parastiye û heta îro rojê aniye. Lewma ev Newroza ku naha tê lidarxistin, bingehên vê yên sereke nehatine guherîn, lê ev aliyê netewî û şoreşgerî ku Newroz wek hemaseyek nû dide bi me, çimkî ya ku Kurdan dora hev kom dike Newroz e.”

Nerîna “**Ziynelabidîn Zinar**” jî wiha ye: “Cudatiyek pir mezin di navbera Newroza kevn û ya niha de heye. Di newroza kevn de netewa Kurd li 21`ê Adarê hemû derdikevtine derve û çolê, nav mêrgan, li ser çiyayan û baniyan û kêf û şahî dikirin û Kurd bi cilên Kurdî derdikevtin û kêf û seyran dikirn. Lê mixabin niha Newroz kevtiye rewşek wisa ku êdî li salonan pîroz dikin û eva jî, neheqiyek pir mezin e ku li Newrozê tê kirin.”

Pêwendiya di navbera Newroz û Çarşemesor

P: Gelo ti pêwendiyek di navbera Newroz û Çarşemsor de heye?
B: Hadî Ezîzî: Çerşemesor di nav ola Êzidî de di meha Gulanê de tê birêvebirin. Ev meha li cem wan pîroz e û jin û jinxwazî nakin, surûştê têk nadin û dibêjin ciwantirîn boka salê ev e û surûşt cardin hemû ser ji nû ve tê derê. Her lewema di navbera Çarşemesora Êzdiyan û Çarşemesoriya ku di dawiya Zivistanê li cem Kurdên Rojhilatê tê girtin cudahiyek gelek zêde heye. Çima min ya ola Êzidiyan pê baştir e, çimkî ola Êzidî wek beşek ji dîroka Kurd, olek e şiroveyê ji surûş û matriyala Kurdistanê dike, wek Yarisan, wek rîşeya ola Mîtrayî, ev bilî vê ku ola van neyê

helandin, li hember vê yekê gardek berevanî bo xwe çê kirine. Di nav xwedê naveroka ola van de jî, komek xal û rêbaz parastine ku tev pêwendîdar in bi axa kevnar a Kurdistanê re. Bi vî awayî hekî demjimêrek jî, di navbera wan du hilkeftan de hebe, eva rêkevtek dîrokî ye û ti pêwendiyek wan herukan bi hev re nîne."

Ziyenelabidîn Zinar jî wiha dibêje: "Wan her du hilkeftan ti têkiliyan van bi evdu re tineye, Çarşemasor li gor tarîxa Kurdî, li çarşema pêşîn a 2`ê Nîsana 2634`an e û ev rêkevte hin carnan tê guhertin. Cejna Çarşemasor jî di nav Kurdan de bi şaşî hatiye naskirin, îro rojê hekî tu li ser vê mijar li her Kurdekî bipirsî, dibêje cejna Çarşemasor ya Kurdên Êzidî ye. Na ev yeka wusa nîne. Ev ya netewî ye, ya netewa Kurd e. Lê belê jiber ku bi piranî Kurdên Êzidî li ser koka xwe li ser kevneşopiyên xwe mane û berdewam dikin û Kurdên neÊzidî xwe nêzî cejna Çarşemesor nakin û dibêjin ev ya Êzdiyan e. Ya rastî Newroz û Çarşemasor ti pêwendiyek van bi hev re tineye."

Di dawiyê de min ji Mamoste "Mewlûd Îbrahîm" pirsî, di niha de Kurd hewce ye çawa digel Newrozê reftar bike?
B: "Divê em Newroza Kurdewarî girê bidin bi cîhanê re û em li hemû aliyekê mifahê jê wergirin. Çimkî Newroz cejnek çend rehendî ye, ku wisa ye em dikarin ji çend aliyan ve kar pê bikin. Bo mînak hekî me navendek Newrozî hebe û em salane daxwazê bikin ku hemû aliyek bo cejna Newrozê bêne Kurdistanê û em li vir de dikarin deriyek bihêz a aborî bo Kurdistanê vebikin û em dikarin bi vî şêweyî Kurdistanê bikin cihek kevnar a geşta cihwarî û geştiyarî û heta em dikarin di Newrozê de çalakiyên edebî, hunerî, kultûrî, werzişî û sînemayî bikin û me şiyana vê yekê hebe ku xelata yekemîn a van hilkeftên navbirî bi navê Newrozê wek diyarî bidine xelkê. Eger em bên kar bo vê yekê bikin, Newroza Kurdewarî zêde diçe nav welatan û civatgehan. Lê mixabin em kêmtirxem in û tenê di roja Newrozê de tên bi sirûdek, bi liberkirina cilûbergekê girîngiyê didine vê hilkeftê, ev yeka bes nîne, divê me bi xwendineveyeke dîrokî, kultûrî û cihwarî bo Newrozê hebe û bîr ji paşerojê bikin. Hekî me berê qurbanî û xwîn bo Newrozê daye, divê niha em bên qerebûya vê yekê qerebû bikin. Ku wisa ye Newroz kevntirîn cejna mirovayetiyê ye û ya gelê Kurd e û eva jî gelek girîng e ku netewa Kurd ji rêya vê cejnê ve here nav civatgeh û neteweyan û berevajî ev jî bêne nav Kurdistanê û cihwarên dîrokê yên Kurdistanê nîşanê wan bêne dan."

www.arsivakurd.org

Hevalno divê hûn bizanibin ku kovara Bernamegeh bi saya destek û bexşên we derdikeve û ji bo ku herkes bikaribe ji çand û hûnera Kurdî feyde bibîne ji ber vê bêpere tê belavkirin.

Hûn jî dikarin bi bexşên xwe dest bidin xebatên me û ji bo pêşxistina çand û hûnera Kurdî xizmeta gelê xwe bikin.

Kovara Bernamegeh ji bo we derdikeve lê xwedî derkevin.

-Hûn dikarin bi rêya bankeyê bexşên xwe bişînin.

PTT Bank
Feride Oğuz
IBAN: TR60 0080 7003 1111 7754 2950 01

